

PEYV Û TABLO DIAXIVIN

XELÎL DUHOKÎ

SWÊD 1997

@Weşanên Jîndanê: 13

Peyv û tablo diaxivin: Xelîl Duhokî

Çapa yekê: 1997

Wêneyê bergî: Salil Reşîd Salih

Navnîşan:

Jîndan Bokförlaget

Bäckv. 169 NB

129 33 Hägersten / SWEDEN

Tel: 08 - 18 98 45

ISBN: 91 - 97 30 88 - 2 - X

هه‌و‌النامه‌ی کتیب

Min dîwana xwe (Gaziyek ji cergê Asya - 1989) bi vî rengî pêşkêş kiribû:

”Ji bo kurê min Rêbazî, yê ku bi tenê li
Kurdistanê mayî û her çende min nasnake jî,
lê hemû rojê li benda vegeîna min e.
Vegerîna bi serferazî.”
pêşkêş e.

Lê mixabin ew di reva mezina sala 1991 ê de, şehîd bû û em bi dîtina hevûdu şad
û bextiyar nebûn. Lewre ez bi dilekî xemgîn û pîrr keser, vê pirtûkê pêşkêşî wî
dikim...

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

PÊŞGOTIN

Xelîl Duhokî bi hunera xwe, bi nivîskarî û bîr û baweriyên xwe, bi doza gelê kurd ve, girêdayî ye. Di jiyana wî de, li başûrê Kurdistanê, gelek caran rojên giran qewimîne, bûye reşebayî, tofan û bobelîsk rabûne, lê wî stûyê xwe li ber dijminî xwar nekiriye, tivenga xwe daye ser milê xwe û derketiye serê çiyê, hertim xweragirtiye, mîna text û kelemên Kurdistanê li dijî dijminan rawestaye.

Duhokî di vê pirtûka xwe de, bi hawayekî zanistî li ser edebiyata kurdî radiweste. Wî gelek pirtûk û kovar li ser vê babetê tevdane.

Ji başûr, ji bakûr, gelek caran dijminan li ser kurd û Kurdistanê re girtine, gelek xwînrejên wekî Saddam û Kemal Atatürk welatê me talan û wêran kirine, lê nikaribûn reha kurdane ji binê ve biderxistana.

Duhokî diçe nava kûratiya stiranên folklorî, di nav rûpelên roman, kurteçîrok û tabloyên hunermendên kurd de, digere û aliyên wan yên tarî û geş şirove dike û xwendevanî radikêşe cîhana berhemên kurdî yên jêhatî. Belê; ew diçe nav babet û rûdanên pirtûkên kurdî û boblat, karesat û bûyerên diltezîn dihîne zimên. Ew ji her cureyî dijminatîya kurdan dûr e, ji bo çareserkirin û li hevkirina kurdan hertim xwestiye berê hemiyar bide aliyê dijminê kurd û Kurdistanê.

Xelîl Duhokî di sala 1951 ê de, li bajarê Duhokê, li başûrê Kurdistanê ji dayik bûye, bûye helbestanê derd û kulên neteweyê xwe. Di nav vê beşa biçûk de, di demeke kurt de, mirovên zane, nivîskar û wêjenas û hwd. Derketin. Gava qala edebiyata kurdî dihête kirin, em navê Duhokî rex navê Refîq Sabir, Rojen Barnas, Şêrko Bêkes û yên mayin bîr dihînin.

Çawan keç û pîrejinên Kurd, hertim hirî ristine, tevn çêkirine û xalîçeyên giranbiha pêkanîne, şaîr û nivîskarên mîna Xelîl Duhokî, wêjeya kurdî pêşxistine û xebatên hêja kirine. çawan beçevanek şîtlên nûdatîne, gulên mezin dike, wan av dide, ew jî wisan çand û wêjeya me mezin dike. Weşanxaneya me Jîndan bi nivîskarên mîna Xelîl Duhokî û yên din şa dibe.

Her ji sala 1970 î û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Endamê komeleya Nivîskarên Kurd e û endamê yekîtiya Nivîskarên Swêde ye jî. Mişe, gotar, çîrok û lêkolînên edebî û rewşenbîrî di rojname û kovarên kurdî de, li Kurdistanê û li derveyî welatî jî, belav kirine.

Di sala 1974 ê de, beşdarî şoreşê bûye û di sala 1982 ê de, dîsan ji ber terora faşiyên Îraqê reviyê û xwe gihandiye nav rêzên şoreşa kurdî.

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

Di redaksiyona gelek kovaran de kar kiriye û ji bo demekê jî sernivîskarê kovaraî ”Berbangê” bûye. Di radyo, televîzyon û fêstîvalan de, helbest, çîrok ûsemînerên xwe pêşkêş kirine û ta niha 12 pirtûk, dîwanên helbestan, lêkolîn û antolojî çap kirine. Niha jî li welatê Swêdê dimîne.

Berhemên wî yê çapkirî jî ev in:

1. Te çi viya û min neanî. Dîwana helbestan, başûrê Kurdistanê, 1982.
2. Leheng. Lêkolîn û wergerandina çîrokên kurdên bakûr. Başûrê Kurdistanê, 1983.
3. Osman Sebrî, helbestvan û şoreşgêr, 1983.
4. Gaziyek ji cergê Asya. Dîwana helbestan, Swêd, 1989.
5. Min digot û te vedgêra. Dîwana helbestan, Swêd, 1990.
6. Ragirtin. Dîwana helbestan, bi Swêdî û Kurdî, Swêd, 1990.
7. Helbesta hevçarx ya Kurdî. Bergê 1, antolojî, Swêd, 1992.
8. Helbesta hevçerx ya Kurdî. Bergê 2, antolojî, Swêd, 1994.
9. Helbesta hevçerx ya Kurdî. Bergê 3, antolojî, Swêd, 1995
10. Antolojiya çîroka nû ya kurmancên başûr, Swêd, 1995
11. Mirov û welat di helbestên Refîq Sabirî de, lêkolîn, 1996.
12. Peyv û tablo diaxivin, lêkolîn û gotar, Swêd, 1997.

Weşanxaneya JÎNDAN

10 - 01 - 97

Xemê m evîndaran di stiranên folkloriyên kurdî de

Di dîroka torey a kilasîka kurdî de, gelek berperên zêrîn hene, ku ne cihê serbilindî û serfiraziya gelê me yê hêja ne û bes, belku pişkeka biha û girîng e ji bizava hemî mirovatîyê. Ev çenda he, ne her ji wan berperên şox û şeng xuya dibe. Belku gelek dîroknas û edeb dostên biyanî jî, ev rastiye ya eşkerakirî û tora kilasîka kurdî li rêza bilindtirîn û berfirehtirîn edeb û kultura cihanê yê danay, nemaze folklor a kurdî ya pîr binirx.(1)

Dîsa zimanê kurdî di vê meydanê de gelek dewlemend, mezin û payedar e. Her nifş ji hebest, lawik, heyran, serpêhatî, çîrok û lîztikan dagirtî ye. Kurd ji biçûkayî ve zarokên xwe hinî van tiştan dîkin. Hêj di dema pêçekê de, dê ji wan re dilorînî û dîrok, stiran û çîroka dibêjin. Ji lewra zarokên Kurd xudriste hozan û hişyar in, dengbêj û çîrokvan in. (2)

Folklor a kurdî deryayeka mezin e, em dê bi rûbarekê de cîne xwarê û cokeka bicûk helbijêrin. Ew jî stiranên folklorî ne. Helbet em li ser gişt renga, ciq û takên stiran napeyivin. Lê belê; em dê li ser tayekî zirav axivîn.

Berî ku em biçîne di nav cergê babetê xwe de, em bi fer dizanîn ku tişekî li ser stiranê û destpêka wê bidin xuyakirin. Evca stirana folklorî çi ye?

Elikzander Kirab dibêje: “Stirana folklorî hozaneka awazkiriye, lê bineciha wê berze ye. Di serdema berê de, di nav mirovên nexwendewar de ya belavbû, niha jî sax e û berdewam diête vegêran.” (3)

Riştart Vayis dibêje: “Ne ew e ya ku gelî çêkirî, belku ew e ya ku gel distire, vedigêre û hindek armancên ew pêdivê bi cî diîne.” (4)

Corc Hirtisoc dibêje: “Ew e ya ku di nav komelê millî de belavbûyî û hozan û awazên xelkê gunda digire, bi rêka zardevî û veguhaztinê diête gotin, bê ku bête nivîsîn û çapkirin.” (5)

Dîktor Ehmed Mirsî dibêje: “Ew e ya ku ji binaxekê millî derketibe, di nav xelkê de bête vegêran û biçe nav kûratiya dilên wan.” (6)

Hindek zana li ser wê hizrê ne, ku stiranên şivantiyê kevintirîn rengê stirana ne. Çinku bi hizra wan, şivantî ji çandiniyê kevintir e. Her wesa di zanista folklor nasyê de, du hizrên cuda li ser destpêkirina stiranê hene, ku her yek xwedanê xwe digehîne baweriyeka felsefî. Bi hizra hindekan stiranên şuxl û kar kevintir in, bi ya hindekên din yê ayînî...” (7)

Welê Elikzander Kirab hizreke din eşkera dike û dibêje: “Piştî pêşketina jiyana komelatiyê, çendîn ta û çiq ji stiranê çûn û peyda bûn. Her wesa stiranên şuxl û kar, di dema destpêkirina karê pêkhatî de peyda bûn. Lewra stiranên evîniyê, kevintirîn reng e.”

Heta niha çî zana û folklorî negehiştîne baweriyeka zanistî û çî belge neanîne, ka çî rengê stiranê kevintir e ji yê din. Lê belê; her yekî li gor bîr û baweriyaya xwe, destnîşana serdema peydabûna stiranê kiriye. Li vêre ji bo me xuya dibe ku stiranên şuxl û kar diçin dema destpêkirina karê pêkhatî. Yên çandiniyê, dema ku mirovan dest bi çandiniyê kirî. Yên ayînî, dema ku mirovan tiştêk diperrist. Yên şivantiyê, dema ku mirovan ji bo pêdiviyên xwe pez û mer xwedî dikirin. Yên evîntiyê, dema ku du dilan xwe didan êk. Lê belê ev çende jî hêşta pêdivê vekolîn û li difçûnê ye.

Stirana folklorî gelek hêsan e, ku pirraniya xelkê tê digehin. Dibe awaz dimukim bin, lê kêş û pîvan di gelek de ne diristin. Her wesa pirranî bi selîqe û awazekê nayên gotin. (8) Weheye stiranek li devera Botan bi peyv û awazekê bête gotin, lê her ew stiran li devera Badînan guhartin bi ser da bêt. Sedema sereke ku ji berê û taku niha kar li ser mana stiranê kiribe û ji berzebûnê parastibe, ew e ku stiran ya berdewam e di gotin û vegêranê de û dema borî bi ya niha ve girê dide. Li vêre rûbarê stiranê diçe û çî rawestin jê re nîne. Ne ku bi rêka nivîsandin û çapkirinê, belku bi rêka vegêranê, ji mirovekê bo yê din û ji deverekê bo ya din. (9) Lê eger me bivê, em bizanin ka çira stiran mîna xwe namîne û guhartin dikevî? Ji bo vê cendê gelek sedem peyda dibin û vê meselê xuya û eşkera dikin:

(a. Dema ku stiran diête vegêran û nayête nivîsandin, hingê guhartin dikevî û weke xwe namîne. Çinku ji mirovekê bo yê din toşê çendîn destkariyan dibe.

B. Gava millet hest dike, çend peyv yan çend rêz xizmeta cih û serdemê wî nake. Hingê bifer dizane ku guhartina bêxe tê de ku hindê giriftariyên din destnîşan bike, da ku digel dest û darê wî biguncin û bijîn.

C. Pirê caran pişkeka stiranê jê vedibe û diçe nav rêzên yeka din, ew jî ji çend pişkan pêkhatiyê, ku ji stiranên din hatibin wergirtin. Lewra em nikarin bêjin ku, divê stirana folklorî yek babetê êkgirtî hebe, her weku di helbesteka nû de heye. Çinku ferq û cudatiyeka mezin di navbera herdukan de heye, çî ji layê naverokê ve û çî ji layê encam û formê ve be.

D. Sedemekê din heye: Ew jî ew e ku danerên helbest û awazên nas û xwedînav çend guherînekên tê de dikin. Çinku ew wisa hizir dikin ku destkarî û guhartin dê stiranê bilind kin û pêtir xizmeta wan ête kirin.

Ev hemî nabin sedem, ku stirana folklorî bi pêş bixin, ku digel rêveçûna vî serdemî biçe û ji nan çarçova navxweyî derkeve û bigehe pile û piyeseke bilindtir. Lê belê çend guherînekên biçûk in, li dif destûdarê civakê û pêdiviyên wê dikevin tê de, wek guhertina peyvekê yan ristekê ji stiranê. (10) Stiran bi bûna mirovî ve girêdayî ye, her helkeftineka çêbibe dê ahengek ête gêran û stiran êne gotin. (11) Her weku zarok ji dayik dibe û dikeve nav dargoşê û fêrî rêveçûnê, yarî, henek û axiftinê dibe. (12) Evca stiran peyda dibin. Her ji yê laylay, cencerê, şeveroka, destarhêranê, cuhnîqutanê, bêrê, maziçînîne, dirûnê, şîn û serxweşî, dawet û govend, şer û hinerên mêrantiyê, tirsonekî, şuxl û karê çandiniyê û heta digehe stranên evîndariyê, cihê mebesta me. Lê stiranên evîniyê jî, çend ta û çiq jê diçin. Em dê çiqekê wergirîn û vekolîn. Ew jî ev e: “Xemên evîndaran di stiranên folklorî yê kurdî de.

“ Eşkera ye ku di serdema berê de, cihê jinê ji yê mêrî nizimtir bû. Her çî heyî û neyî di destên mêrî de bûn. Her çî fermanek daba, kesê nedîkarî li dij raweste. (13) Lewra ev rengên stiranê, jiyana evîndarên wî serdemî dide xuyakirin, ka çewa di rewşek nexweş de dijiyan! Ka çewa edet, rewîşt û toreyên kevn, fermanên bab û bira, peywendiyên mirovaniyê, kiryarên bekrok, fesad û malê dinê, kosp, asteng û stirî dikirin di rêka xweşî û bextiyariya wan de. (14) Dîsa di ayînê musulmanan de ku pirraniya Kurdan ew in, jin nagehe pileya zalamî. Di dabeşkirina deramet û malî de, du pişk yê zalamî ne û pişkek ya jinê ye. Di gewahiyê (şahidî)yê de, zilamek bi du jinan ne. Her wisa mirovên ayînê berdewam dibêjin û vedigêrin: “Ew jina ku zilamê xwe dilxweş dike, ew Xudê jî razî dike. Hingê cihê wê, bihişt e!” Ev çende, dibe sedem ku jin bi hemî

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

fermanan razî be û çî berevaniyê ji xwe neke. Her wisa gelek gotinên mezinan jî dibine palvedan, ku keçeka xwedan xalê çak û xweşmirov bînin: “Xalî biceribine û paşî keçikê bîne!” (15) Yan wê keçe bîne ku xwedan kes û karên jêhatî be:”Berê xwe nede jinikê, berê xwe bide mirovên wê!” (16) Lê digel gişt kosp û astengan jî, evîndaran hest û bîrên xwe derdibirîn û bi baweriyeka mukum, bi dilekî fireh, azar û kovanên xwe divehandin, awaz ji bo dadinan û dikirin stiran. Di govendan de, li bêderan, di rê ya kaniyan de, di şeverokan de digotin û şax û daxên welatî vedigêran. Em dikarin bibêjin, ku heta niha, çendî asteng nehatine ji navbirin û derd û azarên evîndaran nehatine çareserkirin. Lewra daxwaza nehêlana wan dikîn. Em jî dê bi vê rûdanê dest bi babetên xwe kîn.

Keçeka şeng û şîrîn di biharan de yarî û henek digel kar, berx û şivanan dikir, li deşt û zozanan digeriya û seyran dikir. Digel qolên bêriyê nêçîra dilên xort û lawan dikir, şax û dax, zevî, bîstan, rûbar û kanî bo digirnişin. Şerpeze û posîde bû. Kete ber hing û dingên derd û xeman. Ji welatê xwe dûr bû û hêviyên wê mirin. Paşeroja wê têkçû û pirojên jiyana wê serûbin bûn. Kaniya jînê lê hişk bû û av tê neza. Dinyaya xweş li ber çavan reş bû û tam tê nema. Dilê geş çirmisî, rihên pîriyê xwe di serûçavan werkir, kul û kovanên sewdaser kir û jîn lê kir dogeh. Daxwaza karekê mezin nekir, tenha diviya ku neête firotin. Diviya ku bibe kevaniya xortekê di dem û penga xwe de. Çi li lawê mîrê ecemokan bike. Lê xuya ye pêwendiyên eşîrtiyê û berjewendiyên derebegayetiye hemî rê li ber keçe girtibûn. Kovan û xem didaîran û wê çî rê nedîtin ku xwe pê rizgar bike. Keçik daxwaza mirinê ji bo babê xwe nake, lê bi tenê nifiran dike, çinku keçe diviya ku babê wê jî mîna wê, rojê sed carî bimire. Ev e jî mafê wê bû, çinku çî ji neviyanê nexweştir nîne, çî ji hindê bi jantir nîne, eger zulm û zor li mirovî bête kirin û tiştê ji mirovî neyê û mirov nikare berevaniyê ji xwe bike. Fermon van çend malikên stirana ku, keçikê bi babê xwe gotin, bixwînin:

“ Babê mino, tu xêrê bikî, xêrê nebînî.
Sed tixarên genimî bavêjî, li şûnê zîwanê bi helînî.
Kodekê feqîriyê hilgirî, li hezar û sed û yek mala bigerînî
Hebeka zadî bi çavê serê xwe nebînî.
Te çewa ez nedame kurek di hîn û penga min da
Te ez dame kurê mîrê ecemoka.
Dilê min rebena Xwedê dixwaze koçeriyê...” (17)

Keçikê diviya ku bi keyfa dilê xwe xortek helbijartiba û diviya ku ji jiyana koçeriyê dûr nebûba. Çinku qesr û malê dinê, bo wê xweşî peyda nedikirin. Lê belê ev e fermana babê wê bû. Lewra barê wê giran bû bû û çêj û xweşî di jiyana wê de nemabûn. Erê; ma çî ye eger mirovî serbestiya xwe hebe û biryarê li ser meselên wisa bide û paşeroja xwe hilbijêre!

Keçik hez ji kurkî dike û bi şev û rojan di hizir û texmînên wî de dijîtin. Divê xwe bigehîne wî û destên wî bigire û herdu biçin kenarê tenahiyê. Lê mixabin nikare?! Çinku hêzeka din li beramberî evîna wê rawesta ye û jiyana wê têkdaye. Ew jî fermana babê biraye. Rewiştên kevin û nejêhatî, mejiyekê zuha ye. Keçik ne dikare li dîf gaziya dilê xwe biçê û ne jî dikare evîna xwe binax bike. Keçik dibêje:

“Lawikê min yê çûye dawetê li xerîbiyê
Tirsim werîsê xwe bavête baqê tembelyê
Heke tirsî babê birayê min neba
Ez a dakevime pêşiyê.” (18)

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Hewe xwend, van herdu hêzan çewa, jan û derd bo keçikê anîne û hêviyên wê hinda kirine. Me divêt bab û hira nebin kosp û kelem di rêya xweşî û serbestiya keçên xwe de. Her çende di mişe ne, ew kesên daxwaza serbestiya jinê dikin, lê hindêk ji wan bixwe jî, wê di nav çar dîwarên malê de girê didin û nahêlin ronahiyê bibînin û di civat û bajarvaniyê bigehin.

Em biçin di deryayeka pirr xem û kovan de. Ew dilê ku evîn neçûbê, bila biçirmise. Belê pa me evîna rast û dirust divê, ya bê fêl û teşqe, bê diserdabirin û xapandin. Evîn, karekê hindî bêjî mirovatî ye. Evîn xweş e, eger li ser armancên mukum bête avakirin. Bi hizra min evîn keştiyek e li ser deryaya êş, jan û xweşiyê diçe. Mirovê evîndar li ser wê keştiyê ye. Yan dê keve ber pêlên derd û xeman û nexweşî û giriftarî êne serî, yan jî dê derbazbe û gehe kenarê xweşî û tenahiyê. Evîn rêyeke pirr hov û dirinde ye, nemaze li nav gelên paşketî. Erê evîn ho ye, mirov di nav de yan şêr e yan pepo jî ye. Evca vê perça stiranê bixwînin:

“Heyran jaro!

Sed cara min gote te: Min birevîne! Te kir yarî.
Şevê dî xazgînî hatin li mala babê min rebenê
Hindek bi peyayî û hindek bi siwarî.
Min xwe hêdî hêdî kêşa ber taqîkê dîwarî.
Min ê li babikê xwe kirî guhdarî.
Babê min digot: Keça min ne bi sedanî
Ne bi du sedanî, keça min bi hezarî!
Min go: Babê mino tu guh nede malê dinê çî nîne.
Tu nebêje Heyran feqîr e û kesê xwe nîne.
Tu pîremêrekê jar î
Ixtiyarekê gunehkar î
Belku tu min ji axreta xwe re
Ji Heyranê qurban re bikeye diyarî.” (19)

Erê ev jane ji egera nezanî û têngihîştina babê keçê bû. Hêvî û armanca babê wê, pere bûn. Her çend keçik amade bû ku kurik wê birevîne, lê kurikî ew yek nekir. Çinku wî dizanî dê çendîn giriftarî kevîne di rêya bextiyariya wan de û keçik nerevand. Lawikî evîna xwe gorî kir, da ku xwîn neête rijandin. Temaşayî vê berêxwedana mirovatîyê bikin, çewa xwe di mejiyê evîndarên Kurd de xuyadike: Kurik evîndar e, yarî û henekan nake, nevê serê keçikê bikeve ser balgehê kesekê din. Erê; wî divê, jiyana xwe dozex bike, da ku jiyana çendîn kesên din têknede. Ji aliyê din ve, keçikê dizanî ku babê wê dê wê havêje mezada kirîn û firotinê. Lê çî jê nayê û hêviyên wê tene serjêkirin. Çinku peran çavên babê wê tarî kirine. Her çend bab pîremêr e û jiyana wî ber bi dawiyê diçe, lê dema serê peran tê xuyakirin, hemî rengên mirovatîyê berze dibin. Me nevê pere bibin egerek ji bo nehêlana evîne, belku pêdiviye em hemî bibin aliyekê alîkariyê ji bo peydakirina bextiyariyê.

“Beko” peyveke hindî bêjî, kirêt e. Ew dijî karên mirovane diraweste û li bin nigên xelkê bêguneh mirinê diçîne. Ew xwe dike dirrik û stirî di rêya serfirazî û bextiyariya xelkê de, kaniyên zelal şêlî dike û her çî karê xirab jê bê dike. Lewra stiranên folklorî ji kiryarên mirovên çepel gelek in. Guh bidin vê perça stiranê, ku kurik dibêje:

“Fenera minê, sibe ye rabe serî bişo, avê merêj.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Bejna bilind bi tenika kirasê melesî
Kezî û bisk berdan, kurt û dirêj.
Işella kula Helebê bikevit nava fesadê gundê me
Bo çi di mabeyna me da fesadî kirin?
Eşiq û evîna min û Fenerê
Hey jaro dilo hêşta ji mêj.”(20)

Di gelek stiranên folklorî de azar û kovanên evîndaran veşartî ne û di kûratiya dilên wan de dikelin. Çinku ew newêrin evîna xwe eşkera bikin. (21) Lê evîndar delîvê peyda dikin û dergehan dişikênin. Kes nikare kolan û cihên gund çavdêr bike. Lewra dema ku xortekê şeyda di ber mala babê narîna xwe re dibûre, dibîne ku narîna wî li eywanê nanî dipêje. Lê dema çavên keçikê bi kurikî dikevin, nanê xwe jibîr dike û rondik li ser sîreta diene xwarê, digel girkên hevîrî tîkel dibin. Dilê kurikî disoje û dibêje:

“Keçê dînê, bejin bilindê, bisk bi tîlê.
Tu bizivire û berê xwe bidê,
Nanê te sot li ser sîlê.
Tu bes rondika bibarîne bi hêceta dîkêlê.” (22)

Erê keçik ji keyfa dîtina ezîzê xwe disoje, lê dîsa nikare rabe xwe tê werke û wî himbêz bike. Çinku evîna lê qedexeyê ye! Keçikê didin mîr, bê ku hizir û bîrên wê li ser hebin, bê ku bizane ka zava kî ye! Çewa di jiyana digehe, ha dibîne ew mar kirine û veguhaztin. Çinku bab û bira ew biryar dane. Lewra evîndarê şeyda û yê dilşewitî, dikeve ber hing û dingên evîneke dijwar û ronahî lê dibe tarî, gulên wî yên jînê hişk dibin û qêrîna wî nalîna wî dever pîrîr dikirin, dibêje:

“Bi serê min da hatiye pîrepayîzek çenda bi lez û beza.
Taviyeke baranê davête deşta jêrî,
Xirab kirin keprokên tevanî reza.
Sing û berê vê kulmalbabê,
Koz û pawanê destên min bûn
Evca dilo rebeno, berê xwe bidê
Yên ketîne ber mal û mîra
Ber leqan û geza.” (23)

Li vir diyar bû ku keçikê mîrê xwe nevê, çinku wê ne bi dilê xwe mîr hilbijartîye. Jiyanê keçikê digel mîrî suxre ye û çî tam tê de nîne. Her wesa mîrê wê jî çî xweşiyê nabîne. Çinku keçik pîtey pê nake û dil û mejiyê xwe jê re venake. Ji aliyê din ve jî evîndarê rebenê şewitî, çî bextiyariyê nabîne. Çiku ji torîna xwe dûr ketiye. Lewre ev hersê kes bûne qurbana xeletiya bab û birayê keçikê. Her çend gelê me ji gelek edet û toreyên xwe yên kevin û kirêt qurtal bûye, lê mixabin ev renga giriftariyê hêşta li welatê me peyda dibin. Me bawerî heye, ku ew jî dê rojekê binax bin. Lê xebat û bizaveke germ divê.

Xortek di agirê evîneka bêhêvî de disoje, çinku şengezeriya ku wî hilbijartî, çî pîtey bi wî nake û dilê xwe bo venake. Ev reng evîna, ji aliyê keçikê bi tenê ye. Lewra xem û kovan behra kurikî ne û her ew bi tenê şewitî û kuzirî maye. Me evîna hosan nevê. Çinku evîna ji aliyê keçikê, bêhêvî û bêomîd e. Kurikî divê ku jiyaneke bextiyar bijî, lê bê keçikê bi cî nayê û kêra evîneke gehîştîye

hestî, birîn di laşê wî de pîr bûne û gêsîne kovanan dil lê kelaştîye û ew kiriye pîremêrekê heftê salî. Belê; kovanên kurikî di vê stiranê de rind eşkera dibin:

“Sewdaliyê, sed cara min got eman.
Te got neman.
Goştê laşê min heliya, bes hestî man.
Te ez kirim pîremêrekî heftê salî,
Pidî û didan di devê min da neman.
Te ez kirim masiyekî dermandayî
Havêtim binê behran.
Te ez kirim porekî perqusandî
Berdayime bestan û çeman.
Hêlî yeman.
Babo yeman.
Dayê yeman.” (24)

Bo çî lawikî xwe avêt di derya evîna keçê de? Ew dizane ku dê xeniqe. Bi hizra min, bila bisoje. Me nevê evîn ji aliyekê be, divê ew ji mejiyên herdukan derkeve û ji kaniya dilê wan bizê. Dema dilê mirovî tiştêkê dixwaze, divê di gavê de ew bête amadekirin. Lê dem rawesta ye, digel guherînê bi rê ve naçe û serbestiya mirovî jî tuneye, di dest û piyên mirovî de zincîr hene. (25) Li vêre ev çende mirovî didanite ber du çareserkirinan, yan mirov dest ji daxwaza dil berde û xwe jê dûr bike, ku ew jî dawiyeka pirjan e, yan jî dijî hemî stirî û durkan raweste, giriftariya bi singekê fireh wergire. Eve jî ji hemî kesî nayê. (26) Kurik feqîr e û keçîk ji binemaleka mezin e. Lê êdî kurik nikare dûrî delala xwe bijî. Ew astenga dişikêne û rojeka pîr serma, bi baran û barove radibe û qesta mala keçîkê dike:

“Ay lê nezanê!
Şeveke sîr û sar bû
Şevên kanîna bû
Min kir û nekir, min debar nekir.
Kifîla dergehê mala babê nezanê
Ji pola û mifreq bû
Min bi tiliya xwe ya şehdê vekir
Min destê xwe li ser gerdana sor û sipî kir.
Min devê xwe di neqeba cotê memikan kir.”(27)

Diyar e ku tirs, lertz û mirin cihên xwe di dilê mirovên evîndar de nabînin. Asteng û kelem neşên rêya li ber yê xweragir bigirin. Dê xwe ji bo gaveka xweş digel şîrînê, dete gorîkirin. Kurik di kêf û xweşiyê de sewdaser bû û دنیا jibîr kiribû. Kurik dibêje:

“Xwedê mala dîkilê şevê xira bike
Hisaba xwe berze kir.
Çend şivan, gavan û xizmetkarên babê nezanê
Li min û bejnîka bilind kar kir.” (28)

Şivan û xizmetkarên babê keçîkê bi kurikî hesiyar, ku ew digel xanimê ye. Evca dê kurik çî ke? Lê keçîkê lihêfa xwe di kuleka dergehî rakir û ji evîndarê xwe re got:

هه‌و‌ال‌نام‌ه‌ی‌ ک‌ت‌ی‌ب

“Hilo bireve û xwe ji destên wan qurtal bike. Nexwe wê min û te bikujin!”

“Belê pa leîb û lîtên nezanê gelek bûn.
Destê xwe havêt lihêfê û di kuleka dergehî rakir.
Kuro dîno rabe xwe xelas ke,
Ez ê bêjim, hawar e diza lihêfa min bir.” (29)

Lawikê evîndar ew hinêre kir û daxwaza dilê xwe bi cih anî û zivirî gundî. Lê her kes nikare vê çendê bike. Ew jî ne rêyeka rast û dirust e, belku hewildana evîndarekê ye. Lê wî hizra mirinê jî kiribû û dîtina Nezanê, ji xwe re kiribû armanc. Mirov ji bo armanca xwe, diête helawîstin. Lewra mirina di rê ya armanca de serfirazî û serbilindî ye.
(Di civaka me de, mirov bi van renga ne:

a) Yek, bêaqil, bê taqet û şîyan e, her rûdaneka di civatê de çêbe, pê razî dibe. Mirovê hosan jiyana xwe berze dike û dibe kevirê bê hiş, civat jî çî sod û mifayî jê wernagire. Heke mirovê hosan mişe bin, civat dibe kelekeka ji beran û çî guherîn û pêşveçûn çênabin. Yê din, nerazîbûna xwe beramberî hemî rûdanên civatê diyar dike û diçe nava kundirekê, xwe ji xelkê dûr dike û dibê: “Ne çî civat e û min ev navê.” Ew ji xewnan, cîhaneka taybetî bo xwe çêdike. Yê dîtir, aqile di civatê digehe û bi hemî fermanên wê razî dibe. Piştî li pey zanîna xwe dixwe teraziyê. Mirovê hosan rexnegir e û sêdekê digehîne civatê. Çinku dixwîne, dinivîse, dipeyive û şuxl dike. Piştî ku xirabî û başiya ji hev cuda dike, diçe nav cergê civakê û derdikeve. Me jî mirovê hosa divên, da ku civata me bête guhartin û bi pêş ve biçê.) (30)

Dema ku mirov dikeve deryaya evînê, mirov dizane ku dibe evîn mirov bibe mirinê jî. Wesan hizir tê kirin, ku jîyan bê hevdu mirin e. Lewre pêdiviyê ku dijî hemî kotek û zorê raweste. Nemana bi hev re xweştir e, mirin jî ji bo bicîkirina armanca serfirazi ye. (31) Evca ji ber vê çendê, evîndar beşdarê hemî xweşî û nexweşiyên dibin. Çinku evîna wan, ya paqij e. Her êk hemî gavan pêdivî yê din e. Hemî demê amade ne, ku xwe di rêya evîna xwe de gorî bikin.(32)Kurik dibêje:

“Sebr û mala minê, sibeha îdê
Bejn û bala te ya zirav ji avê tê.
Bêhna gul û çîçeka, sihara sibê ji bejnê tê.
Xelkê digo: Karwanê Hacî Bedran Axa ye
Ji xopana mîrata zozanê Şerefdînê, ji pira Batê tê.
Wele xelkê digo: Karwanê Rişmilî û Qubala ye
Ji xopana Diyarbêkrê, wa ye jor tê.
De were da te birevînim
Em xwe bavên mirata Qurtelan,
Lingê xwe deynin Sêrtê.
Wele bila car dî
Mirina malxerab li bira kê tê?” (33)

Kurik amade ye, ku keçikê birevîne. Çinku birîn kevn e û derdekî giran vêketî ye. Çîroka evîna wan jî dirêj e. Bi hizra wî çare, revandin e. Lê kurik feqîr e û ji binemaleka bêxwedan e. Yan jî pîrr sedemên din jî hene. Ew axîna radihêle û dibêje:

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

“Eman gulê
Baran barî, çirke çirk e.
De tu rabe mehîne bîne û canîkê li dî ke.
Xwezî ji xêra Xwedê ra
Evroke bejna bilind, bo min ba mal û milk e.”(34)

Rast e ku derdê feqîrtî û hejariyê giran e. Hezretî Elî gotiye: “Eger feqîrî mirovek biya, dê min bikuştta.” Niha ne kurik dikare xwe bigehîne dosta xwe ya nazenîn û ne jî kes cabeka xêrê jê ra dişîne. Lewra serê wî diêşe û dilê wî bi jan e. Kurik dibêje:

“Serê min diêşe dilê min pê ra.
Kesek xwedanê xêra tune
Cabekê bibe taxa jorî ji dostê ra.
Xwezî yekê mîzginêke xêrê ji min ra baniya bigota:
Dosta te hat û hekîm pê ra.(35)

Birastî hindî em li dîf stiranê biçîn û vekolîn, dawî li kovan, xem û azarên evîndaran nayê. Çinku pîrrianiya stiranên evîniyê, ji vî rengî ne. Lewra tev bi axîn û kul in, qêrî û nalîn in, hewar û gazî ne, xwezî û hêvî ne. Lê me hêvî heye ku em karibin beşek xemên evîndaran pêşçav bikî. Armanca me, nehêlana wan e û xizmeta gelê me ye.

ÇAVKANÎ

1. Rojnama Hawkarî, jimare 372.
2. Folklorî Kurdî, Cegerxwîn, weşanên Roja Nû, Stockholm, 1988, rûp 6.
- 3, 4, 5 û 6. Dr. Ehmed Mirsî. Stirana Millî, pirtûkxana Rewşenbîrî, desteka giştî ya nivîsîn û çapkirinê, rûp 43.
7. Dr. Izedîn Mistefa Resûl, Edebî Folklorî Kurdî, Bexda, 1970, rûp 59.
8. Elikzander Kirab, Zanista Folklorî, Dezgeha Nivîskarê Erebi ji bo çapkirin û belavkirinê, Qahîre, wergêra Ruşdî Salih, rûp 259.
9. Dr. Ehmed Mirsî, rûp 19.
10. Her ew çavkanî, rûp 19- 21.
11. Her ew çavkanî, rûp 43.
12. Her ew çavkanî, rûp 50.
13. Tilmastiyan Akreyî, jin û cihê wê di şaristaniyeta Dola Rafîdeyn de ,Wezaretî Rewşenbîrî û Hunerî, Îraq, rûp 5.
14. kovara Kora Zanyariya Kurdî, bergê du yê, beşa yekê, 1974, rûp 745- 746.
15. Toma Buwa, Digel Kurda, rûp 54, dezgeha giştî ya rewşenbîrî ya kurdî, wergêrana Awaz Zengene, Bexda, 1975.
16. Her ew çavkanî, rûp 53.
17. Vegêrana Arif Reşîd, ji bajarê Amêdiyê ye.
18. Ji kasêteka stiranbêjê kurd Xidir Umerî.
19. Ji kasêteka stiranbêjê kurd Mecîd Zaxoyî.
20. Ji kasêteka stiranbêjê kurd Xelîl Bakazî.
21. Gotineka mezinan e.

22. Vegêrana Mihsin Qosan. Helbestvanekê Kurdistana başûre.
23. Her ew çavkanî.
24. Ji kasêteka stiranbêjê kurd Bişar Zaxoyî.
25. Mistefa Mehmud. Îblîs, Dezgeha Zivirînê, Bêrût, rûp 100.
26. Her ew çavkanî, rûp 100 -101.
27. Ji kasêteka stiranbêjê kurd Hesên Umerî.
28. Her ew çavkanî.
29. Her ew çavkanî.
30. Mistefa Mehmud, rûp 100.
31. Her ew çavkanî, rûp 10.
32. Her ew çavkanî, rûp 32.
32. Ji kasêteka stiranbêjê kurd Xidir Umerî.
33. Her ew çavkanî.
- 34 . Xelîl Bakozi.
35. Ordîxanê Celîlê û Celîlê Celîl. Zargotîna Kurdan, Mosko, 1978, rûp 324.

* Ev lêkolîne di kovara Wan, hejmar 1, sala 1992 ê de, belav bûye.

Edeb, siyaset û dîrok di romana Siya Evînê de

Sedan sale, Kurdistan di bin zulim û sitema dijminan de dinale. Çi dergehên xweşî û pêşdaçûnê li ber venedibûn; belku berdewam ji aliyê dijminan ve dihatine girtin. Lewra bizava edebî û rewşenbîrî jî, mîna ya siyasî û civatî, lawaz û paş de mayî bû û çî rengên şaristanîyetê ne digehane deverên kurdî. Lê dîsan” Hemî tariya cîhanê, neşya ronahîya fenerekê biveşêre.”

“ Folklorê kurdî giringtirîn û kevintirîn serekaniya çîrok û stiranên kurdî bû. Her wesa jîyana koçeriyê, binaxê serhildan û peydabûna wan bû.”(1) Lê çîroka nivîsî(Hunerî) ya kurdî, ne ji mêjde ronahî dîtiye. Lewra pîrniya nivîskarên bi kurmanciya jêrî(soranî) dinivîsin, li wê baweryê ne ku, yekem çîroka hunerî ya kurdî, di sala 1925 an de, ji layê Cemîl Saibî ve hatiye nivîsîn. Lê ya rast eve ku, yekem çîrok di sala 1913 an de, ji layê Foadê Temo ve, di kovara Roja Kurda de, hatiye belav kirin. Her wesa Ebdulreqîb Yosif dibêje: “ Destnivîsa Bersîsê Abid, wesa

هه‌و‌النام‌ه‌ی کت‌ی‌ب

xuya dike ku, Feqiyê Teyran, yekem çîroknivîs bûye, çinku ew di salên 1307-1376 an de jiyaye.”(2)

Her çend roman nivîsên kurd, wek tilîyên destan jî ne bûn, mîna Erebe Şemo û Ibrahîm Ehmed î, lê di van deh salên dawiyê de, çendîn roman nivîsên kurd peyda bûn û qonaxên girin derbaz kirin.

Ji wana: Babê Nazê, Husên Arif, Mehmud Baksî, Mehmed Mokrî, Birîndar, Nacî Kutlan, Ebdulla Serrac, Şahîne Soreklî û Mehmed Uzun cihê mebesta me di vê nivîsînê de.

“Roman rengêkî pexşanê yê giring e, helbijartina vî cûrê edebî, hişyar bûn û bisporîya nivîskarî nîşan dide. Ji aliyekî din ve jî, qulaçeka mezina dîroka çîroka kurdî ya me pirr dike.”(3) Lê vekolîn jî karekî pirr zehmet e, taqet, şîyan û bêhnêka fireh divê, her wesa pêdivî dehan serekanîyên giring e ku ew jî li vî welatî, bi hêsanê bi dest nakevin. Her çend heta niha çendîn romanên kurdî peyda bûne, lê dîsa mirov dikare bêje ku, hêştan dest pêk e, nemaze dema bizaveka rexneyî ya lawaz hebe, û eger mirov temaşay xebata gelên din bike, hîngê mirov dikare bêje ku, rexne li cem me tune. “Dîsan çî bizaveka edebî û hunerî ber bi pêş de naçe û nagehe pileya edebê nemirê cîhanê, eger xebateka rexneyî ya pêgehiştî û bi hêz, mil bi mil digel neçe û nihênîyên wê xuyua û aşkera neke. Lê erkê rexnegirî ne ew e ku bibe rêber ji bo nivîskarî, yan kotekîyê li ser bike, belku; divê hêlengandîneka zanistî û babetî be ku di encamê de, ew jî bibe karekê hunerî yê din û têkelî yê wî bibe.” (4)

Her çend ta niha çendîn romanên kurdî belav bûne û nivîskarê xort Mehmed Uzun î jî, çar nivîsînê, lê romana wî ya bi navê “Siya Evînê” gelek kar li ser min kiriye û min pirr jê jê wergirtiye. Ew jî bo sedemê hindê ku vê vekolînê li ser binvîsim. “Armanca mezina vekolîna edebî jî, dîtina nihênî, ciwanî û bihayên berhemê edebî ye.” (5) Ez hêvîdar im biha û rola wê danim ber destên xwendevanan.

Bi hizra min” Karê edebî çareserkirina doz û giriftariyên mirovî dike. Çareserîya her tiştî bi mirovî ve girêdaye. Lewra li vî edebî rola xwe ya mezin radibe û dibe pirtûka jîyana mirovî. Dibe dîrok ku qonaxek ji qonaxên jîyanê tomar dike.” (6)

“Her wesa edeb, bazeber e (wesîleyek e) ji bo xizmeta civatê, nemaze dema ew civat ber bi ava kirinê diçe, ku dehan salên paşdamayîne ji bajarvaniyê berveket(Teivîz).” (7)

Bi kurtî, roman behsî hindêk aliyên jîyana gelê kurd dike. Memduh Selîm Beg, ronakbîrêkî kurd e. Her ji destpêka çerxê bîstê, digel şoreşgerên din, dijî Osmanî û Kemalîyên kevneperist, xebata xwe ya siyasî dike. Komela Hêvî, Partîya Xoybûn, şoreşa Agirî. Her wesa di derya çavên keçekê çerkes de(Ferîhayê) di xeniqê. Lê di herduyan de sernakeve û li dawiyê jî, li xerîbîyê, bi dilê şkestî û bi tenê, li sala 1976 ê, li Şamê, koça xwe ya dawîyê dike.

Romana Mehmed Uzun î,” Her çend edeb e, hind jî siyasî û dîrok e. Wek edeb, bi rengêkê taybetî giring û bayexdar e, lê her wesa wek siyasî û dîrok jî, di vekolînê de, serinca mirovî radikêşe û rexnegirî di êxe hember behis û karekî dîrokî yê nazik û aloza gelê kurd.” (8)

Wek edeb, ji layê form û naverokê ve serketiye. Zimanê xweş, Peyvên ciwan, darriştina hevoka û wênên şîirî, parrastina zincîra rûdanan, cih û dem, pesna bajar û deveran, serinc rakêşana xwendevanî, girêyên romanê, xeyaleka berfireh, riyalîte, şerrenîx, babetên giring û ramanên di cîde (hizir û bîr) û bi rengêkî siruştî ber bi dawiyê.

Qaremanê serekî, rola xwe ya giring lîztiye.

Layê derve : Cil û berg, rabûn û rûniştin.

Layê navxwe: Rewşa saykolojî, hizir û bîr.

Layê komelayetî: Rola wî di civatê de, rewşa civata wî demî.

Her wesa zîrekane niqteşanî: Bêhnok, niqtebêhnok ; niqtepirs ? niqtebang ! û yên din bikar anîne. Ew dergeha li ber xwendevanî vedike û radikêşe çendîn pisyaran.

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

Wî zaniye kengî romana xwe bi dawî bîne û gehaye armancê. Ez bawer im ku wî, bi hêsanî dikarî romanê bi têkçûna şoreşa Agirî, yan jî bi mêrkirina Ferîhayê, bi dawî bîne. Lê belê wî bi pîlaneke serketî roman bi mirina-pirr dil şewat û tiracîdî- Memduh Selîm Beg ê, bi dawî anî. Ne Memduh Beg - wek şoreşger û evîndar - geha armancên xwe û ne jî gelê wî ji bin perdên tarî û bindestiyê derket!!! Dema Mesîh bi xaçê ve kirîn. Peyva wî ya dawiyê ev e bû:

Xudêwo! Çira te ez bi tenê hêlam!?

Mehmed Uzun î jî divê, pirr bi dengê bilind hawar bike û bêje:

Xudêwo! Çira te gelê me bi tenê hişt!?

Wek siyaset, rewşa kurda, rêxistinên demokrat û partiyên kurdî, xeletî û neşarezabûn, rola kêma ronakbîran, jîyana pîrraniya serkirdên kurd li dervey Kurdistanê, helwêsta çewta welatên dût û ber, pîlan û nexşên dijminan, xapandin û derxistina efuyan.

Wek dîrok, biratiya kurd, ermen û çerkesan û ji navbirina ermenan, kovar û rojname, komele, partî û rêxistin, kel û cihên kevin û hwd.

Dema mirov dest bi xwendina romanê dike, dixwaze bi lez rûdanên din bizane. Roman mirovî radikêşe kûratîya salên 1900 ê. Mirov xwe di nav rêzên komela Hêvî 1912 ê de dibîne. Diçe nav civînên Xoybûn ê de. Car dibe evîndarê dil şewitî û carna diçe çiyayên bilind û asê. Diçe Agirî. Dikeve bose, nexşe û pîlanên dijminî. Diçe... Diçe û di nav rûdanan de wunda dibe. Belê; romana serketî wisan mirovî radikêşe.

Memduh Selîm Beg, evîndarek mezin e. Evîna şox û şengê ji layekî ve û ya welatê bindest ji layê din ve.” Du tayên giran.” Ew li benda wê rojêye ku destê Ferîhayê bigire û ber bi gola Wanê biçê. Erê; çavên wê kanîn e. Keziyên wê rûbar û hîvîn e. Bejna wê spîndar e rinde, lê dûriya wê kovan e, wêrane gunde. Ew cîhana xweşiyê naînte ber dest. Buharê li ber dilê xwe xweşnake. Lê ew jî mirov e û vîne dike. Hej areq û dengê kemaçê jî dike. Belê; ew li ma beyna du hêzên mezin, helawîstî dimîne. Lê li dawiyê welat û xelkê jêrdest, wî radikêşin. “ Ew mirovek şoreşger e û neşet reşbîn be, çinku reşbînî, hêz û taqetên mirovî dişikêne û na hêle li ser xebatê berdeham be.” (9)Ew pirr bawere ku dê welatê wî rizgar be û gehe armancê. Kengî? Nêzik e.Lewra ew evîna welatî dibijêre û paşî ya Ferîhayê. Eve berêxwedaneka mirovaneya mezine û ji ber vê çendê jî, bi hezaran li ser axa pîroz şehîd dibin.

Memduh Beg dimire. Lê Mehmed Uzun î divê bide xuya kirin ku, ew namire. Belê; mirovên wisan tim sax in û di dilên xelkê de dijîn. Navên wan di nexşeya welatî de, diêne çandin û wê rojek bê ku, helametên serbilindiyê ji wan ra bêne çêkirin. Zana, ronakbîr û şoreşger, yê rê ji bo gelî rohin dikin, namirin.

“Memduh selîm Beg, hem li nik wane, hem jî na; hem li vê dinê ye, hem jî na.”(10)(Sîya Evîne, rûp 9).

Uzun î gele pîte bi xewnên Memduh Beg ê kiriye. Lê wî mebestên giring hebûne û kariye bigehe armancê. “ Lewra rûdanên çîrokê di çarçûva xewnan de, ji layê hunerî ve, gelek alîkariya nivîskarî kirîne, ku eger li hindêk ciha zêde çûbe, bê gilî be, çinku ev çend di xewnan de karekî asayî û normal e.”(11) Belê wî xwastiye rewşa welatî bide xuya kirin. Welatê şêrîn. Bajêrên xweş. Birc, kel û cihên dîrokî, berî hezaran sala hatîne ava kirin. Lê dagîrkeran talan û wêran kirin. Bircên bilind, lê herriftî. Dîwarên pan û xemlandî, lê helweşyayî. Hemî cihek xopan kiriye. Ji bilî şûnewaran, çi tiştek nemaye. Ew cihên bi zend û baskên xort û lawên me hatîne ava kirin. Bi xwîna şehîdan hatîne xemlandin. Bûne kavi, çi ruh, bizav û deng jê dernakeve. Pirr caran xelkê me bi çavên xwe dîtiye ku, çewan dijminan nivîsîn û nexşên li ser dîwarên şkeft û kelên welatî me, bi tevir û çekoça xira kirîne, jêbirîne. Bi vê çendê dijminan viyaye, bajarvaniyê (Medeniyet) me têk bide û dîroka me bin ax ke.

Uzun î divê hizra me û cîhanê jî, bo vê mesela giring rabikêşe.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

“ Hin alîyên sûran hilweşyayîne. Hin qulên mezin jî di bedenên wan de vebûne... Li dora sûran jî hêşnahî û av dixuyin. Lê, tu tiştêk jîndar naxuye. Ne meriv, ne teyr, ne masî, ne heywan û ne jî mehlûqatên din.” (Siya Evînê, rûp 9.) Belê; dema dijmin bi sedan hezara xelkê me ji gund û bajêrên welatî derdike, mişextî deverên biyanî û dûr dike. Kaniyan têk dide. Rez û baxçan dişewitîne. Hîngê “ Çi tiştêk jîndar naxuye.”

Dema mirov diçe nav rûdanên romana “ Siya Evînê”, nemaze mesela evîndariyê, hîngê romana Garisya Markîz î “Evîn di dema kulareş(taonê)” de diête bîra mirovî. Qaremanên herdu romana hej hevdu dikin, lê her yek ji keça bi egerekê mêr dikin. Xort jî bi dilê şkestî, bi dirêjiya emrên xwe, li benda berdilkên xwe dimînin û her yek ji xorta jî bi dehan naman dinêrin, lê herdu keçik dest ji mêrên xwe bernadin. Li dawiyê Memduh Beg bi pîrî jinê diîne, lê qaremanê Markîzî dimîne û dema mêrê jinkê dimire-Hîngê emrê wê ji heftê sala pitire-ji nû şû bi mêrkî dike û bi hev re dijîn. Bi kurtî kartêkirina Markîzî (Tem û mijî, wênên şîirî, bêhneka dirêj ûberfireh, xeyaleka bi hêza têkel bi riyalîte) û di mesela evînê de, li ser Uzun î heye.” Lê yê şarezatiyeka baş di teora edebî de nebe, wesana hizir dike ku eger cihên tiliyên nivîskarekî biyanî li ser berhemên nivîskarekî welatê wî de hebûn, êdî ew nivîskar dikeve cihê gumanê, yan jî bi xaleka lawaz didin xuya kirin. Lê belê; ewên di elfabeya edebî de di bispor û şareza, vê kartêkirinê di havêna xana edebî hevberkirî(Muqarin) û bi pêngaveka serketî dizanin. Sedem jî di vegeştê xwe westandin, têgehiştin û roşenbîriya wî nivîskarî, ne ku xaleka lawaz û kêmasîyek, lê bi mercê hindê ku, tiştên nivîskarê biyanî gotîn, ne vecît, ne vegêrte ve û ne bite wênê wî yê duyê.” (12)

Dema Uzun behsî şoreşa Agirî dike, nezanîn û kalfamiya serkirdê şoreşê berçav dike, dema ew xwe bi rengê xulama diguhere û ji bo anîna jina xwe, digel Silo diçe bajêrê Xoyê, li Kurdistana îranê -Hîngê dikarî du hevala bişîne- û dema dijmin digirin, dibê:” Ez xulamê Yosif axa me, saeta zîvîya axa kar nake, min anî da saetsaz ku çêke.” Ew jî piştî giftûgoyê jê re dibêjin:”Here zû saetê bigire û bizivire.”(Siya Evînê, rûp 144)Lê Eger girtiban, weheye biba sedemên piroblimên mezin bo şoreşê. Lewra karên wesana û xeletiyên din, dibûne sedemên têkçûna serhildan ûşoreşan.

Uzun î divê bide xuya kirin ku, her çend ji destpêka çerxê bîstê, Memduh Beg ê destnîşana armancên xwe kiriye û ketiye nav qada xebatê, lê heta niha jî-dawiya çerxê bîstê- hêsta gelê me ne gehaye mafên xwe. Anku jiyana û xebata Memduh Beg ê, bi ya xwe ve girê dide. Çinku Mehmed Uzunî jî, mîna wî, di bizava siyasî û ronakbîrî de kar kirîye. Di kovar û rojnaman de nivîsiye, ketiye ber hing û dingên dijminî, jorên zîndana pîvane û sirgûnî welatê xerîbiye bûye. Lê Uzun î zîrekane kariye xwe di jiyana wî de bihelîne, çinku armancên wan mîna hev in. Xuyaye ku” Nivîskarek

nîne, her ji Eristo bigire û heta niha jî, ku berhemên xwe nekiribin egerek ji bo rêxweşkirina bîr û bawerên xwe. Sarterî di rêka edebî de bîr û bawerên xwe belav kirîne û her wesa yê din jî.” (13)

Ew bawer dike ku, kesên ji neçarî welatên xwe hêlane û li derve dijîn, dikarin karên baş encam bidin, lê dîsa xebata rast û dirust ew e ya di nav cergê welatî de diête kirin. Pirraniya serkirdên Xoybûnê li Şam, Antakya, Bêrût, Qahire, Parîs û London ê di jiyana. Lê welat pêdivî wan bû. Dema Memduh Selîm Beg diçe Agirî û rewşa şoreşgera ji nêzîk dibîne, hîngê dizane ku mesela şoreşê, ne wilo hêsane. Belku; mirovên xweragir, qareman, bêhinfirêh û şareza divê. Belê; yê li ber serma, tirs, têhin, birçîbûn û bomban dijî, ne mîna wîye yê ku li dervey welatî, li cihên bilind û tena dijî. Uzun bi navê Memduh beg ê dibêje:” Ma mirov dikare xebatên wan û xebatên van canfîdayiyan bide ber hev? Memduh selîm Beg, têdigihê; ev cîhana şer û xwînê û cîhana derve, wek rengên reş û spî, ji hevûdu cihê ne.”(Siya Evînê, rûp 135)

Di mesela Efuya rijemê û vegera Memduh begê de, dergeha li ber xwendevanî vedike û wî radikêşe tiştên girîng. Wî şiyaye rojên bûrî bi yêni niha ve girê bide û paşerojê jî bide munaqêşe

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

kirinê. Erê; niha bi hezaran kurd, ji neçarî welatê xwe hêlane û li yên biyanî dijîn, dijmin jî bihayê wan dizane, lewra her çend meheka, efuyekê derdixîne. Lê di wan efuya de, çi destkeft ji bo gelê kurd nînin. Anku dijminan mebestên çepel hene. Evca mirovê, bi dehan sala xebat ûbizav ji bo hindêk armanca kirî, dê çewa bi efuyên vala razîbe! Wî divê bêje, eger hindêk bi efuyên dijminî bêne xapandin, bila xwe hişyarkin çinku vegera welatî jî “Divê li gor hin qayidan be. Gava me her celeb qayide û bawerî dan bin lingên xwe, hingê mana jiyane çi ye? (Siya Evînê, rûp 180) Erê; bi dirêjîya dîroka gelê me û xebata wî ya xwînawî, her dijminî ji neçarî efu bo xelkê me yê şoreşger derxistiye. Dijmin rola giring ya ronakbîr û welatparêzên kurd li dervey welatî dizane. Ew têdigehe ku, xwepêşandanek, pirotestûyek, nivîsîn û pirtûkek çî dikin. Lewra ew ne bes bi efuya, belku; bi dehan rêyên din jî, hewil dide ku, ronakbîr û şoreşgeran ji dervey welatî rakêşe bin sîbera xwe û paşî bêrûmet û serşûr bike, yan jî bi pîlanekê bikuje û berze bike. Erê hêşt “zor û zulim li welatî her berdewam e. Ma ev çend xebat, ev çend zehmetî kêşan, derd û keder, ne ji bo azadî û serbestiya kurdan bû? Gelo ew niha vegere, ew dê li xwe mikur neyê? Ew dê îxanet li xwe, li jiyana xwe, li doza xwe neke û li gelê xwe neke? Ew dê bi vî awayî siyaseta rejîma turkiye nepejirîne?” (Siya Evînê, rûp 179) Belê; Mehmed Uzun î divê bide xuya kirin ku, ronakbîr û welatparêzên kurd li dervey welatî, pîlan û nexşên dijminî têk didin û ji bo mafên xwe yên rewa dixebitin. Dema gelê me geha azadî û serbilindiyê, hingê dê efuyên dijminî bi dawî ên, nexo dê her berdewam bin, lê kes guh nadetê.

Dema Xanî yê nemir ev çend rêzên jêrî vehandîn:

“ Ez mame di hîkmeta Xudê da, Kurmanc di dewleta dinê de,
Aya bi çi wecîh mane mehrûm? Bîlcumle ji bo çi bûne mehkûm”
(Siya Evînê, rûp 218)

Hîngê wî baş dizanî ji bo çi bûne mehkûm. Her wesa Memduh Begê jî dizanî ji bo çi? Niha Mehmed Uzun jî dizane ji bo çi? Lê ya giring ew e ku, bi dirêjîya 300 sê sed salên pirr kuştin û wêran kirin, hêştan me nekariye-Yan me neviyaye- bersiva wê çendê bidîn!! Her wesa xelkê meyan rêberên me-çi wuc û mifa ji serbûrên berê wernegirtiye. Ta niha bi dehan serhildan û şoreşên kurdî yên hatîne kirin, lê ji ber sedemên xuya û ne xuya, hemî ji nav çûne. Uzun î, divê bi navê Xanî, Memduh û xwe jî, dîsan vê pirsê bike û li benda bersivê ye..

Ew xwendevanî radikêşe nav dîroka pirr rûdan, şewat û derdeserî. “ Niha payiza 1926 an e.” (Siya Evînê, rûp 32) Dema hevalê wî yê çerkes, pisyara dest û darê welatî dike. Memduh Selîm Beg dibêje:

“ Par li Kurdistanê, qetlîamek mezin çêbû. Turkan gelek bîrewer, rênas û pêşewayên me bi dar ve kirin.” (Siya Evînê, rûp 32-33)

Hîngê xwendevan hizir dike. Par, anku sala 1925 ê. Çi bûye? Ew çi qetlîam bû? Bi germî dipirse. Erê; di wê salê de, şoreşa Şêx Seîdê Pîran, bi destên kevneperistên turk, hatibû ji nav birin. Li qada bajarê Diyarbekrê, ji pêncî rêberên kurd pêtir bi qinarê ve kiribûn. Welat wêran kiribûn û bi sedan karên hov dijî gelê me yê bêguneh encam dabûn. Her wesa, helwêsta Sovyetê jî destnîşan dike ku, dema şoreş ber bi têkçûnê diçû, çewan dergehên xwe digire û çî alîkariyê nake, çinku berjewendîyên wê digel hukumeta Tirkiyeyê hebûn. Hîngê her çî bîr û baweryên mirovatî û pirinsîbên Markîsîzîm-Lînîzîmê hebûn di ber piyave dan.

“ Turkiyê hukumeta Sowyetê ber bi xwe kişandiye. Hikumeta sowyetê alîkarî li serhildanê nake û derîyên xwe ji şervanan regirtiye.” (Siya Evînê, rûp 147) Lewra dema xwendevan diçe nav dîroka

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

xwe, ew agehdarî rûdanan dibe, egerên têkçûna şoreşa dizane, dost û dijminan dinase û li rêyên rizgarbûnê jî digere. Çinku yê dîroka xwe nenase, ew neşet bi dirustî berevanîyê ji gelê xwe bike.

Dema Memduh Beg, ji ber sitem û tadaya rijêma Tirkiyeyê dirreve û digehe Antakyayê. Ji layekê ve, ew dibe mamosteyê zimanê ferensî-Pirranîya ronakbîrên kurd, Bedîrxanî û yê din-bi alîkariya Ferensîya dijîn û kar û barên xwe bi rê ve dibin. Lê ji layê din ve, pirrnîya çavkaniyên dîrokî, xuya dikin ku” Feransizîya destê here dirêj, di alîkarîya Kemalîya de, ji bo şikandina şoreşên kurdî, hebû.”(14) Lewra mirov wan ronakbîran, mîna bexê Îsê Dela dibîne (15), ev kare jî tevaya dijminên gelê kurd encam dane û heta niha jî berdewame û nimone jî mişene!!! Uzun î vîyaye xuya bike ku, divê gelê kurd, sitrafîca xwe ruhîn bike û piştî xwe bi dijminan gerim neke. Eger dijminek, alîkariyê jî bike, wî pîlan û nexşên xwe hene. Lê, divê kurd, şareza û bispor bin û xwe ji wan pîlanan bidine alekî.

Ew mesela behîşt û dozexê, berovajî pirtûkên ayînî xuya dike. Ayîn dibêjin:” Agirê dozexê pîr germ e û yê ku, gunehê wî pîrbin, wê bikeve nav agirî û bişewite!” lê dema Memduh Selîm Beg, dikeve nav agirî.” Heyret, tu germî tune. Na carina heye, carina tune.(Siya Evînê, rûp 215)Her wesa pesin dide.” Ev agirê xopan ku, her kes jê di tirse, ev e?”(Siya Evînê, rûp 215) Ne agir, ne jî sotin heye. Nexo çewan “ Ew di nav gulîkên êgir de, hêdî hêdî, digere. Agir. Agirî?”(Siya Evînê, rûp 215) her çend vê meselê ne ji Mehmed Uzun î destpêkiriye, belku; bi dehan zana û fêlesofa ev çende destnîşan kiriye, lê giringî ew e ku, hêştan di nav gelê me de heye, cihê rêz û tirsêye jî. Lewra li ser peyvîn û vekolîn, karekî pêwîst e.

Şoreşa Agirî têk diçe û Memduh Selîm Beg, bi dilekê şkestî ji wexera xwe vedigere, lê Ferîhayê mêr kiriye. Di pîrse. Lê ew neşê dest ji mêrê xwe berde! Eve jî wê çendê xuya dike ku, nivîskar xem û kovanên wan, dihavêje ser milên, adet,rewîşt û torên kirêt û ne jêhatî. Uzun bi zimanê wan dibêje:” Mirin ji bo adetên kirêt. Bila asteng di rêka evîndaran de nemînin. Da ku, jiyana xelkê delal serûbin nebe.” Raste ku ev babete, mişe di stiran û çîrokên folklorî de, hatîne destnîşan kririn û xelkê baş jî li dij rawestayê, lê Uzun î birengê ciwan ev çende pêşçav kiriye. Dîsan ji şarezatiya xwe, keçeka çerkes dike berdilka Memduh ê kurd. Yê derbeder û sirgûnê welatê xerîbiyê. Da ku, bi wê çendê aşkera ke ku, her çend Kemalîyên kevneperist, hewil didan ku, mabeyna gelên di nav Tirkiyeyê de dijiyan têk bide û pîlanên çepel bigêrrin, lê dîsa nekarî vî sinorî dane û biratiya, kurd, çerkes û ermeniya jî ku-ji ayînekî din bûn- têk bide. Lewra “ bingehê edebê jêhatî û nemir ew e ku, biratiyê mabeyna xelkê bindest peyda bike. Xelkê ku, di nav civatekê de, digel hev dijîn û ji bo hev xebatê dikin.” (16)

Bi giştî xelk wesana hizir dikin ku, nabe û karekî kirêt e, mirovê şoreşger, carina bi xweşiya bedenî, areq û keyfê ve mijûl be!! Belku; divê her tim paqij û bêguneh be, çî karên ne di rê de neke. Lê Uzun naxwaze qaremanê xwe, mîna Mesîhî xuya bike. Çinku ew jî mirov e, hej areq û bedenên nazik dike, rastiya dengê dil û mejiyê wî di dane ber çav. “ şevên bêxew, carina ji bo xebatê, carina ji bo qesta felekê. Dengê kemaçe û keçên xama yê Yewnanî.(Siya Evînê, rûp 61) “ Gava daxaza bedenê li Memduh begê tê xezebê, ew xwe davêje otêlên Şam, Heleb û beyrûdê.”(Siya Evînê, rûp 195).

Folkilora kurdî, deryayeka mezin û pîr e ji çîrok, stiran û dehan babetên giringên din. Nivîskarê şareza, dikare gele mifay ji wan wergire û berhemên xwe pê dewlemend û bi hêz bike. Lewra Mehmed Uzun î kariye sodê ji çendîn çîrok û stirana wergire, mîna: Binefşa Narîn, Xec û Siyabend, Mem û Zîn ê. Her wesa şiyaye dergehên helbestvanên mezin, wek: Xanî û Cizîrî jî

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

biquite û romana xwe, bi dirr û mirariyên wan bixemlîne. Ev e siruda nîştimanî ya Agirî jî, bi dengê bilind dilorîne.

Agirî, Agirî tu agir bûyî

Li nav ketî, serbilind bûyî

Li ser Kurdistanê çira bûyî

Hilbe Agirî, hilbe agirî”(Siya Evînê, rûp 130)

Her wesa jîyana Ferîhayê bi ya Binefşa Narîn ve girê dide û vê stirana pîrr mana, miştî wênên şîirî û daxazên dilê şewitî, bi zimanê Ferîhayê dibêje:

Bila mêrê meriya bi dilê meriya bî

Bila nan hebî û dew tune bî

Bila xwarina meriya garisê bi gilgil bî

Bila lihêfa meriya ezmanê bilind bî

.....

Bila cihê meriya ne li vir bî

Li sinorê Ecem û Gêwir bî

.....

Bila mêrê meriya ne bi dilê meriya bî

Bila sibê heya êvarê ne kar bî, Ne şixol bî

Xwarin û libas pîrr bî

Dilê meriya tim bi kul bî....(Siya Evînê, rûp 185)

Di Hunerê nivîsînê de, Uzun î hindek xeletên teknîkî di avahiyê romana de kirîne, bo nimone:

Ew dibêje: Mêrê têrbejin dirêj(Siya Evînê, rûp 14)

Lê dema jinên Antaqiyayê, pesnê wî didin, dibêjin: Merivekî bejin navîn, zirav...(Siya Evînê, rûp 26)

Ew dibêje: Di bajêrê biçûk de, taxa biçûk. Di taxa biçûk de, xaniyê biçûk.(Siya Evînê., rûp 81)

Lê dema Memduh Beg diçe jor, dibêje: Derin odeya rûniştinê. Deriyên girtî yên odeyên din.(Siya Evînê, rûp 82)

Odeka mezin, li gor adetên çerkezan raxistî(Siya evînê, rûp 32)

Ew xanî wesan xuya dike ku mezin e, çend odeyên wî hene û ya rûniştinê jî fireh û raxistiye, ne ku biçûk e!

Zimanê kurdî li kurdistanê jorî, her ji sala 1923 ê hatiye qedexa kirin. Lewra çî dergehên zanîn û fêrbûnê nebûn ku xelk pêş ve biçê û layên tarî rohin bike. Ne xandîgeh û pirtûkxanên kurdî, ne kovar û ne rojname, ne radyo û ne jî televizyon. Di rewşek weha de, li jêr perdeka reş de, dê çewan gel pêşkeve, edebiyat û çanda xwe pêş de bibe!! Ev e hemî sedemên paşda mayîna gelê me bûn, lê digel hindê jî, ronakbîr û nivîskarên me, asteng têkdane û xizmeta ziman, edebiyat û rewşenbîriyê kirîne, mixabin ew mîna tilîyên desta bûn. Lê belê; di van salên dawiyê de, bi dehan nivîskar û ronakbîrên kurd peydabûn û rewş ber bi pêş de birin. Mehmed Uzun bi xwe dibêje: “ Ez sala 1972 ê, di zîndanê de fêrî xwendin û nivîsîna kurdî bûm.(17) Lewra eger kêmasî jî di zimanê wî de hebin, tiştek normal e, çinku “ her çend pêngavên me kurtin, lê girin ewe ku em ber bi pêş de diçîn.” (18) Her çend ta ku niha gelek meselên ziman û rênivîsê, nehatîne çareser kirin û zimanê vê romanê(Siya Evînê) jî, ji romanên wî yê din bi hêztir e, lê dîsan ew ji kêmasiyan rizgar nebûye. Peyvên biyanî, darriştina hevokan, bi karanîna hindek peyvên ne di cihê xwe yê dirust de, bo nimone:

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Muqedes : Dibe Pîroz
 Sirr û esrar: Nihênî û nepenî
 Şerq: Rojhelat
 Esas: Binaxe, şengiste
 Lewhe: Keval, tablo
 Wezinandin: Kêşan, pêvan
 Letîf: Nazik, rind, ciwan, narîn
 Tecrube: Serbûr, bûyer, serpêhatî
 Zikam: Persîv, helamet, serma
 Hereke: Bizav, bizotnewe
 Xof: Tirs, sehim
 Xerbe: Kavil, wêran,
 û gelekên din...

- Bêyî ku ew hay ji taya evînê hebin(rûp 76)
 Ya rast ev e: Bêyî ku wan hay ji taya evînê hebe.(yek taye)

- Dapîra min ew fêrî min kiribû.(Rûp 106)
 Ya rast ev e: Dapîra min ez fêrî wan kiribûm.

- Giyanê min ezîztir ji hevalên min, ji ev qaremanan nîne.(Rûp 159)
 Ya rast ev e: Giyanê min, ji hevalên min û van qaremanan ezîztir nîne.

- Tu divê bizewicî.(Rûp 200)
 - Jinek divê li mala te be.(Rûp 200)
 Ya rast ev e: Divê tu bizewicî?
 Divê jinek li mala te be? Çinku firmane(Emre)

- Mistek ronahî direşîne ser kaxezê.(Rûp 119)
 Dema çiray sînahî ya xwe direşande jora tarî, ji nû wî Misteka nîska berda binê tîrkî.
 - Ez ji were qewekê bipêjim (Rûp 64)
 Nanî bipêje, lê qehwekê ji me ra çêke.
 - Di odeke stûr ya Hotel central de.(Rûp 116)
 Darekê stûr bîne, lê di odeke mezin de razê.
 - Hebûna wê germiyek dide odê û tiştên odê.(Rûp 40)
 Hebûna wê germiyek dide odê û tiştên wê.

Di nav rûpelên vê romanê de, gelek rûdanên girin hene: şoreşa Şêx Seîdê Pîran, Agirî, Kurd tealî Cemîyetî, komela Hêvî, Partîya Xoybûn, Helwêstên welatên Sovyet û Îranê, Hovîtiya hukumeta Tirkîyeyê, qaremaniya xelkê me, Xiyaneta hindekan(Mehmed Şukrî Segban). Her wesa pîrr e ji babetên siyasî, civakî, evîndarî û edebî. Xuyaye ku Mehmed Uzun î xwe pîrr zehmet daye, ta ku kariye bigehe van rûdan, cih û binkan.” Qehwexana Abdullah Çawîşê erxenîyê, cihê Hêvî li Serkeciyê, li hember postxana nû, di xanîyê Erzurimiyên de.” Her wesa di nav rûpelên rojname û kovaran de jî gerhaye, xwe gehandîye gelek qulaçên jîna gelê kurd. Bi vê çendê jî, romana xwe xemlandîye.

Her çend gelê me, di vî demê nazik de, pêdivî edebê riyalîte û xweragirtiye û ev romane dikeve xana edebê romansî(Xerîbî, tenhayî, derdeserî, bêxwedanî, xem û kovanên giran, bêçareyî û bê

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

rêdîtin bi dawî hatiye) lê Siya Evînê ji layekî ve, baştirîn romana Mehmed Uzun î ye û ji layê din ve jî, ji romanên here serketiyên me ye û qulaçeka vala ya pirtûkxana kurdî pîr kiriye. Em hêvîdar in li ser nivîsînê berdeyam be, lê giringî ne ew e ku mişe binivîse, belku; ew e ku berhemên jêhatî yên hosan pêşkêş bike.

CAVKANÎ

1. Hesên caf, çîroka nû ya kurdî. Çapxana Elai. Îraq 1979, rûp 19.
2. Her ew çavkanî, rûp 24.
3. Kovara Beyan, hejmar 126, befirbar. Îraq.
4. Husên arif, çîroka hunerîya kurdî 1925-1960, dezgeha roşenbîrî û belav kirina kurdî. Bexda, Îraq 1977, rûp 112.
5. Sebah xalib, jin di çîroka kurdî de, dezgeha roşenbîrî û belav kirina kurdî. Bexda, Îraq 1979, rûp 10.
6. Nizar Mehemed Seîd, kes di kurteçîrokê de. Kovara Dengê me, hejmar 4, Duhok, Îraq 1989, rûp 65.
7. Husên qebanî, hunerê nivîsîna çîrokê, dezgeha Çîyay, Bêrût 1979, rûp 8.
8. Husên Arif, çîroka hunerîya kurdî, rûp 10.
9. Reza Al-neqaş, helbestvanên xweragirtinê. Dezgeha erebî ji bo vekolîn û belav kirinê, çapa sêyan, Bêrût 1972, , rûp 91.
10. Mehmed Uzun, Siya Evînê, Orfeos, Stockholm, Swêd 1989, rûp 9.
11. Hesên Caf, çîroka nû ya kurdî, rûp 24.
12. Hemesêd Hesên, pêşgotineka dirêj ji bo komeleka kurte çîrokan, Stockholm 1990, rûp 12-13.
13. Hemesêd Hesên, erê form ji naverokê giringtîre? Yeketiya nivîskarên Kurdistanê, rûp 4.
14. Kovara Çanda Kurdî, hejmar 1, binkê çanda kurdî, London, çirya pêşîn 1988, rûp 90.
15. Ji bo ku Paşayê Amêdiyê, bawerî bi aqilê Îsê Dela bîne, jêre dibêje:” Vî berxî bibe û piştî meheka din bîne ve, lê ne qelew û ne jî lawaz bibe, min her wek niha ji te divê!! Piştî hizirkirinê ew pîlana xwe dadinê. Her roj bermilekê giyay di dete berxî, lê êvarî serê Gurgî nîşa dide. Lewra ji tîrsa Gurgî, her çi xwarî dihêlîne. Piştî mehekê, her wek berê, berxî ji paşay re vedigerîne. Ew jî pîr bi aqilê wî dilxweş dibe.
16. Corc Lokaş, vekolîn di rîyalîzmê de. Dezgeha universîtê ji bo vekolîn û belav kirinê, çapa sêyan 1985. Wergandina Dr. Nayif Biloz, rûp 38.
17. Kovara Wan, hejmar 1, Stockholm, Swêd 1992, rûp 37.
18. Ji peyvên Lenîn î ne.

* Ev lêkolîne di kovara Nûdem, hejmar 3, sala 1992 ê de, belv bûye.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

Helbestvanê hevçerx Ebdulrehman Mizûrî

Ebdulrehman Mizûrî, di sala 1946'an de li gundê Êtotê, nêzîkî bajarê Duhokê, li Kurdistana başûr ji dayik bûye. Di sala 1969'an de, li zankoya Bexdayê beşê cografyayê bi dawî aniye. Wî helbesta xwe ya pêşîn di sala 1967'an de, di rojnameya Birayetî de belav kiriye.

Mizûrî li devera Behdînan yek ji helbestvanên nivîşê yekê ye û di qada edebiyatê de, cihê wî yê taybetî heye. Helbestên wî ji aliyê form û naverokê ve biserketî ne. Wî heta niha du dîwan çapkirine.

1 - Ji Evîna Çirayên Kevin, 1980.

2 - Li Xelkê Tehlê, Li Min Şîrînê, 1987.

Mizûrî bi dehan vekolîn û gotarên edebî di rojname û kovarên kurdî de, belavkirine, di festîvalan de helbest xwendine.

Me li Kurdistanê Ebdulrehman Mizûrî dît û ji bo xwendevanên Nûdemê ev hevpeyvîn li gel kir.

Xelîl Duhokî: Te kengî û ji bo çi dest bi nivîsandinê kiriye?

Ebdulrehman Mizûrî: Min di sala 1967'an de helbestên xwe belav kirine. Bindestî û tepeseriya mîletê kurd, jarî û zîvariya mirovên kurd, bazirganiya beg û axan, bi rêncber û hejarên kurd, dikir û dikin, xwariya teraziyê, hişkiya ewrên rastiyê, hef hefa gur gura ji bo pirkirina gîrfan û kursî

ka... Gelek hokerên din, ez ber bi agirê helbestê ve paldam û bi çekê wê heta ez mame, dê li dijî van tuxman rawestim.

X. Duhokî: Barê edebiyata kurdî îro çawa ye? Helbest, çîrok û rexne...

E. Mizûrî: Li Kurdistana başûr îro qada helbestê germ e. Hozanên me pêkolê dikin ku bi çekeke nû bêne meydanê Çekê musîkê, çekê çîvanokê, çekê zimanê çizaviziyê, çekê mînakgirtinê... Çawa be pêkol ji cihda zîvirînê baştir e... Çîrokê jî kevlê xwe rahiştiye, hêdî hêdî xwe dixemilîne. Bi hizra min rexne gelekî kiz e, an jî hema hema tune ye. Rxnevan hêceta digirin. Em nizanin çi binivîsînin? Lê ne weye keko! Me girtî ji bo berhemên îro rast dibêjin. Me got, me girtî. Baş e, wan bo kilomtekê mîna Xanî, çi kirine! Ji derya mezina Cizîrî, çi deraniye! Ji rûbarê hingivê Nalî çi vexwarine! Bersiveke eşkere tune ye!

X. Duhokî: Nêrîna te li ser edebiyatvanên li derveyî welat çi ye? Wezîfa wan çi ye û ew çi bikin baş e?

E. Mizûrî: Ferkarê nivîskarên kurd yên li derveyî welat ew e ku doza mîletê xwe bi xelkê biyanî bidin naskirin, çan û rewşenbîriya mîletê xwe wergerîne zimanê biyanî, berovajî jî rast e, ya xelkê jî wergerînin zimanê kurdî û belav bikin. Bira ferkarî li ser wan gelek e. Li derve serbestî ye, dikarin destnivîsên edîban çap bikin. Destnivîsên kevin li muzexaneyan biparêzin. Tiştên ku

هه‌و‌الن‌امه‌ی کتیب

rojhilatvanan li ser dîroka kurdan nivîsandine kom bikin, wergerînin. Ma ne fedî û fihêtî ye, heta niha, destnivîsên kurdî yên li Berlîn û Lenîngradê, wan sax nekirine.

X. Duhokî: Tu niha bi çi mijûl î û projeyên te çi ne?

E. Mizûrî: Bibûre, ez nikarim projeyên xwe bibêjim. Keko, şert kirin e, ne gotin e. Mezinan gotiye: “Sed gotin, gorî kiryarekê bin”.

X. Duhokî: Di vî kawdanê xerab de rola edebiyata kurdî çi ye?

E. Mizûrî: Îro, piştî serhildana Kurdistanê başûr, dê rola edebiyata kurdî çi be! Şerrenîxa partiyên kurdî ye. Sîxur, guhbel û lêboka, li xwe xirr dikan! Tirkên axa û began pir dikan! Vizzîna super û tirimpêlên berpirsan e! Piraniya xelkê jî, ne nan e û ne ar e! Kes Ehmedê Xanî bi şûşeyeke Wiskî nakire! Cegerxwîn nakin şofêrê superên xwe jî!...

Kes nakete meyerê xwe (Camî)

Ranagirtin kesek (Nîzami)

Xanî

* Ev hevpeyvîne di kovara Nûdem, hejmar 8, sala 1993 an de, belav bûye.

Hevpeyvîn bi

FAZIL UMER SALIH re...

Piştî sala 1980'ê, carna çîrokên wî di kovar û rojnameyên kurdî de, li Kurdistanê Iraqê dihatin belavkirin. Ew jî kariye bi çîrokên xwe bête qada edebiyata kurdî. Mixabin wî çî li ser jiyana xwe ji me re neşandiye, lê bi tenê em dizanîn ku ew li nexweşxanên deverê doktor e. Çî pirtûkên wî nehatine çapkirin, lê wî çîrok mişe hene. Me ev hevpeyvîna digel kiriye û me çîrokek wî jî ji tîpên erebî wergerandiye tîpên latînî. Em hêvîdar in qulaçeha edebiyata kurdî pirkin.

Xelîl Duhokî: Kengî û ji bo çî te dest bi nivîsînê kiriye ?

Fazil Umer Salih: Di salên heftêyî de min dest bi nivîsînê kiriye, lê ez destpêka xwe ya dirust di salên heştêyan da dibînim. Bi hizra min kême hene wek ku destpêk bizanin kanê ji bo çî dinivîsin, lê hêvî ew e niha bizanin ji ber ci dinivîsin.

X.D: Barê edebê kurdî evro çawa ye? Helbest, çîrok, rexne...

F.U: Nivîserê li derveyî Kurdistanê, bi hizra min du cor in. Yek ji Kurdistanê reviyê ye ji bo xoşiyê û ev kesana bawer nakim, ne ji xwe razî bin, ne jî rojekê qencîyek ji wan çê be. Desteka dîn, ku ji kawdanên berteng û aloz cihê xwe guhastiye û deron û canên wan hêj li Kurdistan e. Evana cihê rêz û qedirgirtinê ne û çavên me li xamên wan e. Pêdiviya nivîserên derveyî Kurdistanê evan karan bikin. Li ser kurd û Kurdistanê bi wan zimanên biyanî binivîsin. Li ser dîroka Kurdistanê binivîsin, ji ber ku jêder û azadî berfirehtir e. Bo me awa û terzên nû yên torê biyanî wergerînin. Binkarê ferhenga kurdiya danin.

X.D: Tu bi çî mijûl î û projên te çî ne?

F.U: Ez niha piçekî bi zimanî ve mijûl im û meha çûyî min semînerek li jêr navê (Vavartin û gogirandina zimanê nivîsînê) li binkê Yekîtiya Nivîskaran pêşkêş kir. Heke delîve kete min, dê li gel hinek nivîsînên xwe yên destxet çap kem.

X.D: Di vî kawdanî xerab de , dewrê edebê kurd çî ye?

F.U: Pêdiviyê torevan çirayê gelan be, lê mixabin pîrrianiya me barê li ser milê xwe nizanin!

X.D: Edebê biyanî çî kartêkirin li edebê kurdî kiriye?

F.U: Wek Nîlata dibêje: Mirov yan çav li siroştê dike yan jî çav li çavlêkerê duwê dike, lew afirandin û çavlêkirin herdu bi hev re dijîn.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

DUBARE MIRAR BÛNE

Fazil Umer SALIH

Li cîhanek vala, mêzeyek avedan bû, teqîn û şeqîn diçû ber asmanî.

- Bi dehîn e.

- Bi pazzîn e û me ji xelkî bibûrîne.

- Bi dehîn e û brê nêrî, serê wî hind giran bû, hizir kir demjimêr xelet e. Viya paldet ve, lê dergeh vebû û dayka wî hate jor, kirasê tebîsî û fîstanê şîn ode li ber çava şîn kir. Berê xwe da lewendiyên dayka xwe û bawîşkî îna xwe. - Dê çi key? - Ma xelk çi diken? - Têştê xwe dixon, hizra îş û karên xwe diken, berê xwe diden dinyayê, çi heye, çi nîne. - Tu nabêjî dê çi hebit? Erd; girover e û her dê mînit girover. Her sal carekê li dû rojê dizîvirit û rojê carekê li dû xwe. Her ro roj ji rojhilatî derdikevit û rê nêrî, serê wî hind giran bû, hizir kir demjimêr xelet e. Viya paldet ve, lê dergeh vebû û dayka wî hate jor, kirasê tebîsî û fîstanê şîn ode li ber çava şîn kir. Berê xwe da lewendiyên dayka xwe û bawîşkî îna xwe.

- Dê çi key?

- Ma xelk çi diken?

- Têştê xwe dixon, hizra îş û karên xwe diken, berê xwe diden dinyayê, çi heye, çi nîne.

- Tu nabêjî dê çi hebit? Erd; girover e û her dê mînit girover. Her sal carekê li dû rojê dizîvirit û rojê carekê li dû xwe. Her ro roj ji rojhilatî derdikevit û li rojava wînda dibit.

- Bes dawo jiyê me pê dibûrit!

Gotina dayka wî, tirarek tezî bû û dirust ji xewê rakir. Di dilê xwe de got: Çi qewimî ye? Çi caran hizrê dayka min ji dergehê aşxanê ne dikeftin, îro her tiştê qewimî ye.

- Rast bêje, te vê spêdê çi bihîstiye?

Dayka wî bişkurî û bi dilgeşî bersiva wî da.

- Radyoyê got: Emerîkey balafirek çêkiriye, dê pê çine asmanî û vegezin... Min jî hizra te û wan fikir.

- Vêca daykê vegezin, venegerin, bizivirin, stu lê bişkên... Tu nabêjî me çi jê ye? Bapîrê min bi kerdîkilkî dibezî û bi sîmerxê difirî. Ez bi du lingan dibezim û bi du çingilan difirim... (Herdu destên xwe wekî qurtê li ser kelexî) min got ka çi qewimî ye.

Piştî hingê qewîna taştê lêdan û dema ji dayka xwe pirsî, kanê Siyapoş hatiye yan ne, dayka wî axînek rahêla û dergeft. Rabû ser xwe, çavên xwe şuştin û ji serşûkê derkeft, lêvek xewliyê li ser milê çepê bû û bi lêva dî rûyê xwe ziwa dikir. zengilê lê da û xoşka wî dergeh vekir, dengê Siyapoş hatê.

- Rostem ji xew rabûye yan na?

- Fermo, yê çavêt xwe dişût.

Rostem gazî kirê: Ha eha ez hatim. Xîret nekir sentor û pentora li ber xwe biket, ne dûre da porçika xwe şe neket. Şelwalek ji dîwarî vekir û qemîsê reş kirine ber xwe, tilên xwe kirine şe û bi rê ket.

- Min îro bo wan sond xwariye, bifire ber perê asmanî ji me neben!

- Ez nizamî çawanê ew herdu xişîm ji me diben! Şeşê ji pêncê cuda nakin! Ez hizir dikem dorandina me ji zanîna me ye.

- Ji bîr neke domîne bext e. Ma heker hercar çar civît bo te hatin dê çi key? Ji bîr neke heger ew ê di gel te biket xişîm bit, te jî xişîm diket!

Vê dan û standinê herdu gihandin ber pêpelîskên gazînoyê, Rostem gava xwe havête ser peyiska yekê û li Siyapoş zîvirî û got:

هه و النامه ی کتیب

- Îro ez dê li ser destê Serdar bim
 Siyapoş bi çavên gomanî lê nêrî û herdu bi sîlal keftin. Dema gehîştine jor, ji qulancekê du dest
 ji nav dûkelê bilind bûn û herdiwa rûkirê.

- Çiye hûn şevê dî li vir nivistibûn?
 - Dê were! Em xewa spêdê ji xwe dipeyin da cihekî bo axey bigirîn, hêj ew neraziye!
 - Dirêj neke û me ber minet neke... Gazî çar şîşkên cergî bike û pankaya destê xwe bialîse!
 Ser mêze bo qada şer û cengan. Dubare mir, dubare deh xwarin. Duşêş bo aznîf, duşêş mir. Du
 şêş ma destê wî da, duciharê deh xwarin. Hepîyek hate kuştin...

Ëvar bû dema gehîştîye mal, ji Hilwazê pirsî kanê firavîn çiyê? Dema gotiyê: Te çi divêt ? Got:
 Çayek wek ya mirova!

Xwe palda ser textî û herdu destên xwe têkdan û danîn ber serê xwe. Ewî jî nezanî çewanê
 kulîç û heval hatin bîrê û xewna Serdarî dîtî, bişkurînek êxiste rûyê wî; min û Rostem dumîne
 dîkir, hindî me dîkir min jê dibir, Rostem ji qehrên xwe da pîlek havêt li stûna xanî da û heraft...
 Avahî bi ser êk da hilweşya. Ez mame li ser kursîka xwe û bi kenî ve min digot: Tu çi dikey dê ji
 te bim! Tu çi dikey dê ji te bim!

Dema xoşka wî dergeh vekirî û çay bo înay, Rostem di xew çûbû û ew bişkurî hêj li ser lêvan
 bû.

Destek mezin ew dîmen ji mêjyê wî malî û dîmenek dî nîşa da. Pîl ji asmanî dibarîn, hemî
 dubare bûn, Ehrîmen li ser heyvê rûniştibû, pên wî li ser erdî bûn. Pêyek li ava deryayê dida û ê
 dî li çiyayê dida. Pîl li stêran didan û Ehrîmenî diqîjand: Dubare, dubare...

Paşê Rostem xwe di odayê de dît, dîwar dubare bûn, erd zendorek bêbin bû, banî dubareyek
 dihat xwarê, Ehrîmen lê siwar bû û dihat... Jor da wekî birûskê dihat, hindî Rostem hate xwe
 ku birevit, berhingarbit yan xwe ve det neşiya... Dubare vî mejiyê wî yê şîşe keft û pirtikand. Û
 taristanek bê domahîk lê pê xwe hişt.

Nînewa, 1984.

Xem û azarên mirovî di tabloyên Fehmî Balayî de

Piştî bi sedan salên zilm û stema dijminan, Kurdistanê başûr gihîşt azadî û rizgariyê. Berî hingê hemû riyên pêşketinê girtî bûn, lê niha rê vebûne, pispor, nivîskar û hunermendên kurd dikarin xizmeteke mezin ji bo milletê xwe bikin. Ev yeka han bûye sedemê vebûna çendîn yekîtî û komeleyên hunerî û edebî. Bi giştî niha hunermendên kurd dikarin pêşangeha vekişandinê û tabloyên xwe bigehînin pîrriya xelkê. Bizava hunerî li Kurdistanê başûr ber bi pêş de çûye û bi dehan hunermendên jêhatî peyda bûne.

Min di seredana xwe ya Kurdistanê başûr de, çendîn hunermendên kurd dît ku yek ji wan Fehmî Balayî bû. Ew di sala 1963'an de, li devera Berwarîbala ji dayik bûye. Li sala 1985'an Peymangeha hunerê ciwan li Musilê bi dawî aniye. Ew beşdarî çendîn pêşangehên hunerî bûye. Tabloyên wî xem û derdên mirovî hembêz dîkin. Di nav wêne û rengên tabloyên wî de, mirov karesatên mezin dibîne. Azarên zîndaniya dikişîne û rondikên germ ji bo şehîdan dibarîne. Bi rastî huner li cem wî, zimanê millet e. Di rîya hunerê de gel bi pêş dikevin û di bajarvaniyê de digihên pileyên bilind.

Min bi fer zanî hevpeyvînekê digel bikim. Werin em bi hev re xwe berdin nava cîhana tabloyên wî.

Xelî Duhokî: Kengî û ji bo çi te dest bi hunerê şewekarî (teşkîlî) kiriye?

Fehmî Balayî: Min di destpêka xwendina xwe de dest bi xemilandinê rûpelan kir. Ji ber rindiya siroştê Kurdistanê, şax û daxên bilind, daristan û geliyên kûr, rûbar û çemên mezin, kanî û bexçên xweş. Belê; ji ber vê bihiştê şîrîn, min xwe berda nav cîhana hunerî.

- Tu bi çi rêbaz û kîjan hunermendî daxbar bûyî?

- Her rêbazeke hunerî, bûçûnên xwe yê taybetî hene. Lê ji ber ku rêbaza realîte bêtir nêzîkî milletê min e, ez li pey wî rêbazê xebata xwe didomînim û tabloyên xwe dixemilînim. Hunermend Rênwar ji layê reng ve, Van Gogh ji layê derbirînê ve, Salvador Dalî ji layê surealî ve û Pîcasso ji layê hunerê hevçerx û modern ve kar li ser min kirine.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

- Tu hunera kurdî ya îro çawan dibînî?

- Hunerê Iraqê bi giştî û ya kurdan bi taybetî, dengê wan li cîhana hunerî heye. Cewad Selîm, Fayiq Hesên û Hafîz El dûrî, hunerê iraqî dane naskirin û Mehemed Arif, Îsmâîl Xeyat û Dara Mehemed Seîd jî hunerê kurdî gihandine pileyên bilind.

- Hunera kurdî niha di çi pileyê de ye?

- Bi hêza hunermendên genc û xwedan şîyan, çendîn Peymangehên Hunerên Ciwan peyda bûne, hunerê kurdî li Kurdistanê başûr ber bi pêş ve çûye.

- Çi girîftarî di riya hunermendiyê de hene?

- Girîftarî bi tenê, mijûlbûna hunermendî bi layên siyasî ve. Îro ew dibe dîl û hîsîrê siyasî. Bi baweriya min ev kêmasiyeke mezin e. Divê hunermend rastgo be û helwêsta wî beramberî tevayîya rûdana hebe. Ew jî bo cîhanê û mirovatiyê xebatê bike.

- Li ba te helwêst çi ye ?

- Helwêst jî bo hunermendiyê pîroztirîn peyv e. Picasso dibêje: “ Hunermendê ku jî dorhêla mîletê xwe bi dûr bikeve, ez wî mîna hunermend nabînim.” Çinku çiyawazî di navbera hunermendî û mirovekî din de heye. Divê bûcûn û rastgotin, bersîngirtin û berevanî beramber her kiryarekê hebe. Lewra çend kesên wek: Mazlûm Doğan, Wedat Aydın, Zekiya, Musa Anter, Şakir Fetah û Dilşad Merîwanî, gorî helwêsta xwe bûn. Niha dîrokê rûpelên zêrîn jî bo wan xemilandine û ew di dilê mîlet de dijîn.

- Pîrsa dawî; tu niha çi karî dikî û tu dixwazî çi ji xwendevanan re bibêjî?

- Ez niha li Peymangeha Duhokê mamoste me û ez endamê desteka bilind ya hunermendên Yekgirtî yê Kurdistanê me. Hêviya min ew e, hunermendên kurd, bi zîmanê xwe yê hunerî, doza mîletê xwe ber bi pêş ve bibin.

* Ev hevpeyvîne di kovara Nûdem, hejmar 9, sala 1994 an de, belav bûye.

Gerhanek di nav çîrokên Hesenê Metê de

Dema yekem kurteçîroka Hesenê Metê ketiye ber çavên min, hîngê yekser, baweriyêke mukum ji bo min çêbû ku ev heval, xwedî behreke (mewhîbe) bilind e. Lê dema pirtûka wî (smîrnoff) ronahî dît û gihîşte min, piştî xwendina çîrokan, ez gihîştim baweriyekê ku ev berhema hêja ye ku mirov li ser binivîse. Hêviya min ew e, ku bikarim nivîskariya wî bisengînim. Her çend yekem kurteçîroka kurdî, di sala 1913 'an de di kovara Rojî Kurd de, ji aliyê Fuadê Temo ve belav bûye û paşî yê Nûredîn Zaza, Qedrî Can û hindekên din jî, di kovarên Ronahî û Hawarê de belav bûne, lê ya modern ku ji aliyê form û naverokê ve, guherînên bingeîn bi ser de hatîn, li ba me bi kurmanciya jorî, di van bîst salên dawiyê de, bi germî hatiye qada edebiyata kurdî.

Pirtûka Hesenê Metê ji çardeh kurteçîrokan pêkhatiye û hêvênê pîrrianiya wan, rewşa civatî, siyasî û pisîkolojî ya kurdên derveyî welat e. Mirovê kurd yê ku ji kultureke paşketî hatî û pîrri tiştên nû dibîne. Pîrri caran nikare xwe digel biguncênît, yan jî beramber hinek karên ku nizane, xwe bi şareza û pispor nîşan dide û ev jî dibe egera peydabûna giriftarî û serêşiyên. Hesenê Metê şarezayetiyeke baş di civata Ewrûpa de heye û zîrekane kariye biçê nav giriftarî, bîr û bawerî û jiyana rojane ya xelkê. Ew desnîşana çendîn giriftariyên welatî û vêre jî dike û me jî agehdarî çendîn xalên giringên civatê dike.

Di çîroka (Nivîskarî) de, xortekî kurd bi kar û barê nivîsînê ve mijûl e. Jiyan , jin û zarokên wî jî, bi tenê nivîsînê û ne çî dî. bi şev û roj li ser masê dinivîse, bê ku demeke kurt jî bide jin û zarokên xwe ku, wan jî kesê xwe li vê xerîbiyê nîn e. Lê ne wî behre heye û ne jî bihayê nivîskariyê dizane! Mixabin ev karê gelek kesa ye. Bi rastî nivîskarî, ne tiştêkî hêsan e û ne jî tenê dem û serekê tena divê. Lê nivîskariyê, behre, rewşenbîrî, têgehiştin û zanîn, taqet û şiyên bilind, dem û serekê tena divê. Lewre her kes nikare bibe nivîskarekî rasteqîne. Lê ev çende ne tiştêkî taybete bi milletê kurd ve, belku; di nav tevaya milletên cîhanê de rûdaye û heye. Belê; raste ku, bi sadan kes dinivîsin, lê çenda ji wan karîne nav û dengê xwe peyda bikin û berhemên jêhatî biafrînin! Lewre pêwîst e mirov xwe binase û bizane ka heta çî pileyê behre û şiyên wî hene û bi hinek berhemên lawaz û bêserûber, xwe neke lêbok û pêtirrankê xelkê. Belê; li vêre Hesenê Metê divê bigehe sê armancên girîng. Yek ew e bide xuya kirin ku, nivîskarî ne karê her kesekê ye. Ya duyê jî ew e ku, jin û zarok berpisyariyeke mezin in, carna dibe asteng, nemaze eger xêzan(Jin û zarok) erk û bihayê nivîsînê nizanibe. Ya sê jî ew e ku, li vê xerîbiyê xwendevanê kurd nîne û giriftariyên çap û belavkirinê jî gelek in. Rast e nivîskariyê, demekê dirêj û serekê tena divê. Her wisa, dibe jin û zarokên nivîskarî jî, di welatên pêşketî de asteng bin. lê ji aliyê din ve jî, jin û zarokên wî jî pêdivî wî ne. Belê; li vêre giriftarî dest pê dike. Di civata ewrûpî de, hemî mirov, çî jin û çî mêr, xwedî mafên xwe yê taybetî û giştî ne. Anku li vêre, jin nîva civatê ye û ya ji bo mêrî dibe, ew ji bo jinê jî mafêke. Lê di civata kurdî de û her wisa di tevaya civatên paşketî de, jin ji gelek mafên xwe hatiye bêbeş kirin. Ew bi tenê ji bo karên malê, xudankirina zarokan û

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

dilxweşkirina mêrî peyda bûye! Ji ber vê çendê jî, dema jin ji neçarî bi hemî ferman û sitema civata kurdewariyê razî dibû, ew li vêre bi wê çendê razî nabe û civata pêşketî ya ewrûpa jî vî mafî didiyê. Lewre eger mêr baweriyê bi vê rastiyê neîne û her li ser yeka xwe ya welatî be, hîngê, bêgoman ew dê toşî gelek giriftariyên mezin be û nimone jî pirr in. Belê; li welatên paşdamayî, jin nikare beramber mêrî raweste û jê ra bêje, ev dibe û ev nabe. Lê li vir, jin ji aliyê aborî ve ne pêdivî mêrî ye, ne jê ditirse û ne jî ji dor û berên xwe şerim dike. Gişt maf di destê wê de ye û kes nikare rê lê bigire. Lewre ew pirr bi hêsanî dikare ji zelumî re bêje: Pere yên me hema ne û tu nikarî bi keyfa dilê xwe bi mezîxî. Tu nikarî pirraniya şeva li kolanên bajêrî bigerî û me bi tenê di vê zîndana mezin de bihêlî. Tu nikarî hemî gava dar û çîvê xwe li ser serê me bihejî. Ev hemî mafê jinê ye û divê mêr razîbe. Çend ji bo xwe bivê, hind jî, ji bo jinê bivê, çinku herdu mirov in. Lewre jin bi hêsanî dikare ji mêrê xwe re bêje:” Na welle, xwe vedişêre! Sibê heta êvarê di binê qula xênî de mexel dikeve, ji rûniştinê kurmî dibe, kurmî!... nizane bi keçikê re bilîze, peyvîna bi min re jî ji bîra kiriye.”(Rûpel 29-30)Rast e, giriftariyên nivîskarekî serketî, di welatekî pêşketî de, gelek in. Pêdivî demeke dirêj û serekê tenaye. Lê ew dikare pirograma jiyana xwe çêke û bi çavekê bilindtir temaşeyî jin û zarokên xwe jî bike, çunkî di vê xerîbiyê de, ew jî bi tenê ne. Erkên nivîskarî gelek in. Lewre divê ew ala hilgirê pêşketina civata xwe be. Mîna Nazim Hîkmetî gotiye:” Divê mirov, xwe bişewitîne da ku ronahiyê bide xelkê din.” Ev e ji aliyekî ve û ji aliyê din ve jî, xerîbî û derbederîya mirovê kurd bi giştî û ya nivîskarê kurd bi taybetî, karekê xirab li ser psîkolojiya wî dike. Çinku ew ji bo xelkê dinivîse û pêdiviyê xwendevanên wî jî hebe, lê mixabin, li vê dûriyê û vê tenhayiyê, ne xwendevan heye û ne jî bi hêsanî berhem têne çapkirin.” Ez dinivîsim lê..lê nuha bihata çapkirin, xwendevan hebûya û bixwenda...” (Rûpel 32). Hesenê Metê bi germî li ser rewşa Felemerz radiweste û bi gelek riya jê re dide xuyakirin ku, nivîskarî ne karê her kesî ye û li dawiyê bi aşkerayî dibê:” Ez dibê, li mala xwe binêre. Pêwîst nake ku tu bibî nivîskar. Anku ne karê te ye.”(Rûpel 34). Lê mixabin ew serhişk e. Ne guhê xwe dide peyvên Hemreş û ne jî, bi pîlana jinikê dest ji nivîsînê berdide. Li dawiyê “ rûkenî li rûyê xatûnê vemirî” (Rûpel 35) û dilê keçê jî pirr êşiya.. Mirovên nezan û di nav civatên paşketî de jî, nikare zû biryarên rast û dirust bide. Lewre pirr caran toşî giriftarî û serêşiya dibe û ji civatê jî, dûr dikeve.

Gelto, xortekî kurd e û wisa xuya ye ku baweriyêke mukum, bi welatên sosyalîst heye. Her çend wî ew welat ji nêzîk, nedîtîne, lê her çi tiştê guh lêbît, yekser baweriyê pê tîne. Ev e jî rewşek xirab ji bo peyda dike. Lewre pirr caran mirovên wilo, xelet di meselan digihên û ji bingehen rastiyê dûr dikevin. Hesenê Metê, divê vê bide xuya kirin ku, di welatên sosyalîst de jî, kêmasî hene û karên xirab û baş jî rû didin, herwek di welatên sermayedar de jî hene. Herdu cîn mirovin û milletên wan ji, ji çendîn çînen civatê pêkhatîne. Belê; mirovê wisan, roleke baş di civatê de nabîne û wek Bebegayê, çi tiştê jê re bête gotin, yan guh lê bibe, yekser dubare dike. Rast e, ev çende di nav mirovên siyasî de mişebû û heta digehîşte wê pileyê ku, bira û hevalên, bîr û bawer, ji hev cuda, sera ku, Sovyet, sosyalîste yan jî revizyonîst e, ji hevdu bienirrin û dilê hevdu jî bihêlin. Ev ê çendê jî karekê negatîf dikire ser doza kurdî jî.

Çîroka Smîrnoff, çend aliyên jiyana Celto xuya dike ku ew nimûneke di civata kurdî ji aliyekî ve, mijûlkirina wî bi çendîn rengên xwarinê ve û mezaxtina pereyekê zûr ku, ev e di baweriyên mirovekê sosyalîst de, ne gelek pêwîst e, çinku erkên girîngtir hene, ji aliyekî din ve jî, dijayetiya giştî karên heta eger baş jî bin welatên sermayedar. Lê ew bi xwe nizane ku Vodka ew vedixwe, ji Emrîka hatiye û ew bi xwe jî li welatekî sermayedar dijî û dibe bi perên wan jî, jiyana xwe, bi rêve dibe.

Di civata kurdî ya paşketî de, jin ji cîhaneka tarî hatiye yeka tarîtir. Jin ji mêrî kêmtir e û çî bihayê xwe nîne, belku; wek bûkeçûşekê ye tenha ji bo xizmeta mêrî hatiye ser rûyê goka zemîn. Ev çende jî, di gelek çîrokên Hesenê Metê de reng dide. Lût, qaremanê çîroka (Zewac), li derveyî

هه‌و‌الن‌امه‌ی کتیب

welatî dijî. Navsal e û porê serê wî jî weşyaye. Xuyaye piştî bûye sikrab(çi tê nemaye!) dixwaze jinekê ji xwe re bîne. Eger ew li welat ba, dibû keçeka li gor dilê wî bi dest neketiba, lê ez çi li şansê keçên rindên welatê bindestî û hejariyê bikim, ew neçar in bi cenabê Lût razî bin. Di kultura kurdî de, mirov yek keçê ji xwe re dixwaze, lê cenabê Lût, berovajî xelkê, ew pêncan ji xwe re destnîşan dike. Her çend ew li gor pirinsîbên ayînî, dikare çaran, ji xwe re bîne û mercên ayînî jî, bi hêsanî, tîne berhevkerin, lê dîsa, wî niha yek divê!! Lût, pênc wêneyên xwe yên cihê, ji pênc keçên welatî re dişîne. Ne wî keçik dîtîne û ne jî keçik bi bejna wî şa bûne. Ya girîng ji bo wî ew e ku, keçek ji welat bête hinartin, nexo ne xem e, wî nas bikin û di sinc, rewuşt, dîtîne û bûçûnên wî bigehin ji xwe ev mesele nayê bahskirin û ji bo xortên kurd li welatî jî, astengeka mezin e. Her

wisa ew jî wan nas nake, lê dibê ji zaroktiyê hindê ji wan dîtîbin, yan jî saloxdanên wan ji bo wî hatibine vegêran. Bi rastî ev nîşana mirovê lawaz û paşdamayî ye. Mirovê ku çendî sal e li welatekî ewrûpê dijî, di nav wê şarristaniyê de jiyane dibe ser, bi vî rengê kirêt hizir bike û pîlanên genî jî darêje.

Belê; Hesenê Metê, zîrekane ev nimûna mirovê bêaqil û mejîhişk destnîşan dike. Ew naçîte di nav giriftariyê de û wê şirove bike, lê ew hefsarê qaremanê xwe berdide û aza dike. Çewan hizir dike, wesana xuya bike û nimûnên ji vî rengî jî di nav civata me de mişene. Aşkeraye ku vî çendê derdekî giran ji bo jina kurd ya reben, peyda kiriye. Bi rastî pir pêwîst e, bi berdewamî li ser vî rewşa kambax bête nivîsîn, çinku giriftarî û astengên mezin ji bo civata kurdî bi giştî û ji bo jin û mêrên kurd bi taybetî peyda dike. Dema çîroknivîs, behsa qaremanekî dike, mebest ne tenê miroveke di nav civatê de, belku; mebesta girîng ew e ku, ew kes bi çîneka milletî ve girêdayiye û destnîşana kesên nezan û kalfam bike û her wisa jî, li dijî rewuşt û tîtalên kevin, kirêt û ne jêhatî raweste, çinku ew baş dizane ku , çi astengî di riya pêşketina milletî de.

Her çend Xalê Çeto, di mizgeftê de, çi tîr nekiribûn jî, lê dîsa Sofî yê tîrken ew gunehbar kir.

Belê; di civatên pêşketî de, ev girêye bi çendî riya tete çareserkerin û bi hêsanî bersiv peyda dibû, lê di civatên paşketî de, bersiv xencer e. Belê; bi hezaran cara, kiryarên wisana bê biha bûne sedemên giriftarî û tengaviyên mezin, di nav binemal û eşîran de.

Bi vî çîrokê Hesenê Metê, pîr bi dengê xwe hawar dike:” Bila adet û rewuştên kirêt binaxbin. Bila derdê nezanîne ji nav milletê me rabe.

“Di çîroka(Roja Pîrozwer) de, Hesenê Metê, perdê ji ser rûyê jina kurd a paşdamayî radike. Ew jina nezan û gundî a bi sedan sala, di bin desteseryê û zulma civatê de dinale. Divê xebateka gerim ji bo pêşdabirina wê bête kirin. Ev e jî ne tenê karê jinê bi xwe ye, belku; erkê mêrê kurde jî. Lê mixabin, pîrriya mêrên kurd dixwazin ku, jin her di rewşa bindestiyê de bimînin, çinku sûd û mifayê wan tê de ye. Ev jî paşmayên civata fiodalîye ku, hêsta di mejiyê mêrê kurd de maye û naxwaze xwe jê rizgar bike. Hesenê Metê, divê vî bide xuya kirin ku, rewş ne bi tenê di destê mêrî de ye, belku; fere li ser jinê bi xwe jî, xebateka gerim bike û giriftariyên xwe çareser bike. Lewre ew bi navê xwîşka Şîlan dibêje:”Ez dizanim ku anuha dîsa li derekê erzanî çêbûye û hemûyan berê xwe dane wir, an jî li dêra taxa hember xwarineke bêpere tê dayîn loma...Ez bi xaxên jinên me dizanim!.. Mêrê xwe dixapînin, peran jê distînin û pê ji zend û sîngê xwe re zêran dikirin. Ma ne gundî ne! Çi ji wan tê payîn!.. Ji tiştên wisa re çavên xwe çar vedikin, lê...çiqas heyf e ku rojên weha pîrozwer jî tew ne li ser guhên wan e!..”(Rûpel 79 80) Belê pîrriya caran heval hene, gazinda ji hindê dikin ku, jina kurd paşdamayî ye, lê ji bîr dikin ku, ev ne bi tenê gunehê jinê ye, belku; ya kultura kirêt û çepel û astengên din e. Belê; pîrriya kes hene peyvên mezin davêjin û behsa dîmokrasi, sosyalîzîm û mafên jinê dikin, lê ew bi xwe jin û keçên xwe, di nav çar dîwarên xênî de, girê didin û nahêlin ronahiyê bi dirustî bibînin. Lê ez bawer dikim ku, rewşa jina kurd wisana namîne û dîrok jî ne erebe ye bo paş ve biçît, belku; hemî tişt ber bi pêş de diçe.

هه‌و‌الن‌امه‌ی کتیب

Pirr caran dema mirov çîrokeke Hesenê Metê dixwîne, yekser mebest û armanca wî dizane. Ev jî ne ku xaleke lawaz e, belku, rewşa naveroka çîrokê, ji wê çendê zêdetir hilnagire. Lê di gelek çîrokan de jî, mebestên veşartî hene û vekirina dergehên girtî û ladana tem û mijiyê li ser berhemî, erkê rexnegirê şareza ye ku, xwendevanî bigihîne mebestên nivîskarî.

Di çîroka (Râbiff) de, du xortên kurd digel du hevalên xwe yên, ewrûpî diçine xwaringehê. Ew baş bi zimên jî nizanin û dema lîsta xwarinê tê, da ku xwe bi nezan nîşan nedin, ew li gor şansê, destê xwe li ser yekê datînin, lê dema xwarinê, xuyaye ku, goştê xav e ew ji bo mirovekî kurd, tiştê entîkeye, çinku goştê xav li cem me nayê xwarin. Lê ji ber ku xortên me naxwazin xwe bi nezan û bêageh nîşan bidin, lewre bi neçarî dixun û paşê vedireşin û hetka xwe jî dibin. Belê; pirr caran biyanî toşî giriftariyên wisan dibin, lê mixabin ji ber nezanî û nefamiya xwe, qûretî û rihbilindiya xwe, rastiya xwe vedişêrin. Gelek caran hinek mirovên me, dema digel ewrûpiya gêngeşê dikin, wisan xwe didine nasîn ku, em milletekî xwedî rewuşt û adetên jêhatî ne û teknolojiya li hemî deverên welatê me heye. Em pêşketî ne û xwedî medeniyet in. Rast e, dijminan rê li pêşdeçûna me girtine, lê bila em ji bîr nekînin ku, hêşt feodalîzim di nav me de maye û sera giriftariyeka biçûk, bi sedan kes hevdu dukuji. Çira em ji kêmasiyên xwe bitirsîn. Heta em destnîşana hele û kêmasiyên xwe nekin, em pêşnakevin. Ya girîng ew e ku em ji bo pêşketina xwe xebat û bizaveke gerim bikin. Tevaya milletekî cihanê di qonaxên em tê de, derbaz bûne û gihane şarristanîyeta nuha. Me di destpêkê de xuya kiribû ku, hêvênê pîrniya çîrokên Hesenê Metê, li ser rewşa kurdên derveyî welat in û babetên hinek çîrokan nêzîkî hev in, pê nevê em li ser hemûyan bipeyvîn, lê tiştê girîng ew e ku, Hesenê Metê çîroknivîsekî xwedî behreke bilind e û taqet û şiyane wî cihê rêzên e. Berhemên wî ji aliyê form û naverokê ve biserketî ne û pirtûka wî, qulaçêke vala ya pirtûkxana kurdî kurmanciya jorî pir dike.

Her çend hinek kêmasiyên biçûk di nava çîrokên wî de hene, wek bi karanîna pironavan, kom û peyvên zêde mîna: Ez û wî, em bi hev re...(Rûpel 11) Ya rast ev e: Ez û ew, em bi hev re... Bi kurtî her tiştên wan xweştir e.(Rûpel 15) Ya rast ev e: Bi kurtî her tiştên wan xweştir in. Lê bi rastî jî tu êdî pîr bûye.(Rûpel 62) Ya rast ev e: Lê bi rastî tu êdî pîr bûyî.

Lê dîsan zimanê wî, sivik û xweş e, niqteşanî bi ciwanî bikar anîne, hevokên xwe rêk û pêk darêjtîne, hewil daye bi kurmanciyeke paqij û petî binivîse. Ew hinde caran bi teknîka kevin ve girêdaye û rengê vegêranê bi kar anîye, lê pîrniya çîrokên wî, bi teknîka modêrin, monolog û dialog, paş û pêşxistina demî û zincîra rûdanan, heta dawiyê bi hev re girêdayî ye. Her wisa pirr zîrekane kariye qaremanên xwe bide peyvîn, ne ku gundiyeke bi zimanê mamostayekî û ne jî, jineke zana wek yeka nexwendevan. Ew bi zanabûn giriftariyan pêşçav dike û serketî bûye tê de, çinku Çexof dibêje:” Ne fere li ser nivîskarî ku, giriftariya çareserke, belku; erkê wî yê bingeşin ew e ku, wan berçavke.”

Li dawiyê ez hêvîdar im, Hesenê Metê, berhemên jêhatîtir biafrîne û min bawerî bi behre û şiyane wî heye.

* Ev lêkolîne di kovara Nûdem, hejmar 10, sala 1994 ê de, belav bûye.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Mirov û hevrikî di tabloyên Ednan Şîno de

Her çend dijminên netewê kurd, bi hemî taqet û planên xwe ve, hewil dane ku wî ji nav biben, lê dîsan nekarîne bigehine wê armanca genî û rê li pêşveçûna wî bigirin. Xelkê me di riyên siyasî, çekdarî, civakî, aştî, rewşenbîrî, hunerî û edebî de, hewil daye xwe biparêze û xebata xwe ber bi pêş de bibe û bigehê armancên xwe yê pîroz. Lê mixabin negehayê. Niha li Kurdistana başûr azadiyek peyda bûye û şûrê Sedamê xwînmiy rabûye. Lewra vê çendê rê li ber hunermendên kurd vekiriye û wan kariye Yekîtiya Hunermendên Kurd ji xwe re damezrînin. Eve ji layekî ve, ji layê din ve jî, rewşa aborî ya Kurdistana başûr xerab e û ji hemû rexan ve hatiye dûrpêçkirin jî, hunermendên kurd roleke girîng lîstine û mîlet ber bi pêş de birine. Niha bi dehan hunermendên jêhatî li welêt hene û pêşangeh û çalakiyên xwe pêşkêş dikin. Yek ji wan hunermendê serketî û navdar Ednan Şîno ye. Ew di sala 1963'an de li bajarê Amêdiyê ji dayik bûye. Di sala 1986'an de Peymangeha Hunerên Ciwan li Bexdayê bi dawî aniye. Wî di jiyana xwe ya hunerî de çendîn pêşangehên taybetî û giştî pêşkêş kirine. Tabloyên wî rewşa aloz û karesatên mîletê kurd hambêz dikin. Wî bi firça xwe, tabloyên jêhatî li ser rûdanên Kurdistana wêrankirî xemilandine. Ez bawer dikim ku eger delîvên derveyî welêt "Parîs, Madrîd û London" ji bo van hunermendan peyda bibin û ew ji nêzîk de agahdariya li ser rewşa hunerî ya cîhanê peyda bikin, hingê ew ê qonaxên diwartir derbas bikin û doza mîletê xwe ber bi pêş de bibin. Di havîna bûrî de min seredanek bo Kurdistanê kir û çend hunermendên serketî dîtî, ku yek ji wan Ednan Şîno bû. Min bi pêwîst zanî vê hevpeyvînê digel bikim.

Xelîl Duhokî: Tu çawa çûye di nav hunerê şewekariyê "Teşkilî" de?

Ednan Şîno: Her ji zaroktiyê viyana hunerî di dilê min de hebû. Dîmanên jiyana civatî û rindî ya siroştê Kurdistana şîrîn ez rakêşabûm, ta ku min li dawiyê Peymangeha Hunerên Ciwan li Silêmaniyê û paşê jî li Bexdayê bi dawî anî. Lewra ta ku ev ro ez hest, viyan, ciwanî û boçûnên jiyana xwe bi riya hunerê şewekariyê derdibirim.

- Rola hunermendên kurd di dema faşîzmê de çi bû û piştî serhildanê gihîştîye çi qonaxê?

- Gelê kurd ji hemû mafê xwe bêbeş bû. Hingê hunermend bi rewşa wê demê ve girêdayî bû. Faşîzmê çi rê nedida hunermendên kurd ku bi azadî bîr û baweriyên xwe bike tablo. Lê dîsan hinekan dikarîbûn xwe ragirin, bajarvanî û rewşenbîriya mîletê xwe biparêzin û qonaxên sext derbas bikin. Hinekên din jî xwe ragirtin û hunerê xwe neanîn qadê û xwe bédeng kirin. Ev helwêsta "Bertolt Brecht" jî di dema faşîzma Alman de wergirtiye û wî ev jî bi xebateke girîng zanî ye. Lê mixabin piştî serhildanê, hunermendên kurd nekariye bi rola xwe ya pîroz rabe, nemaze beramber van karesatên mezin.

- Hinek hunermend di wê baweriyê de ne ku huner ji bo huner e, lê hinekên din huner ji bo xelkê diafirînin. Bawerîya te bi kîjan xwendîgehê heye?

- Huner wek çalakiyeke civakî, di nav mîletî de rola xwe dibîne û kartêkirina wî di gel jiyandê berçav dibe. Helbet divê huner ji bo mirovî û civatê be û evîne bide hemî layên jiyandê. Di vê

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

rewşa aloz û pirr jan, xem, trajedî û man û nemanê de, divê huner ji bo wan xalên pîroz bête afirandin.

- Peywendiyên te di gel derveyî welatî çi ne?

- Hunermendê di nav derd û xemên milletê xwe de, ew dizane rewş çawa ye û ew ji nêzîk karî dike. Lê yê ji dûr ve guh lê dibe, nikare wê rolê bibîne. Mixabin peywendiyê wisa ne peyda bûye, ku em bikaribin mifay ji hevdu wergirin. Ez hêvîdar im hunermendên kurd li derveyî welatî di astê berpirsiyariyê de bin û berevaniyê ji mafên milletê xwe bikin.

- Dijminan Kurdistanê başûr dûrpêç kirine û rewşa aborî ya milletî xerab e. Gelo ya hunermendî çawa ye?

- Girantirîn, aloztirîn, bixemtirîn rewş îro li Kurdistanê ye. Helbet jiyana mirovên kurd di nexweştirîn qonaxê de ye. Hevrikiyê ji bo mana xwe dikin. Huner wek çalakiyê fikrî, pêdivî bi serbixweyî û kerista karî (kaxez, reng û firçe) heye, ji bilî rewşa aborî ya xerab. Lê di gel hindê jî, hunermendê kurd girêdayî doza pîroz ya milletê xwe ne.

- Çalakiyên te çi bûn û projên te çi ne?

- Min heta niha di çendîn festîvalan, pêşangehên taybetî û giştî de, li seranserê Kurdistanê û Bexdayê beşdarî kiriye. Ez hêvîdar im ku delîve hebe û li derveyî welatî pêşangehekê vekim û rewşa milletê xwe bo cîhanê xuya bikim.

- Peyva te ya dawiyê ji bo hunermendan çi ye?

- Yek îrade... Yek fedekarî... Yek doz... Divê hunermend bi giraniya xwe ya dîrokî rabin. Bizava hunerî ya kurdî ber bi pêş de bibin û bigehînin pileyên bilindtir. Em li vêre pêdivî alîkarî û piştevaniya gişan in...

* Ev hevpeyvîne di kovara Nûdem, hejmar 11, sala 1994 ê de, belav bûye.

Helbestvana hêja Hîvî Berwarî

Hîvî Berwarî di sala 1963-an de, li devera Berwarîbala, li Kurdistana başûr, ji dayik bûye. Li Duhokê xwendiyê û peymangeha mamostatiyê bi dawî aniye. Her ji sala 1975-an dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Helbestên xwe di rojname û kovarên kurdî de belav kirine û di festîvalên edebî de xwendine.

Ew ji keçên rêza yekê ye, ku li devera Badînan bi germî hatiye nav qada xebata edebî. Li ser şanoyan, mil bi mil di gel hevalên xwe, helbestên şoreşgerî pêşkêş dikirin û bi dilekî germ û netirs, xebata xwe ber bi pêş de dibir. Ji aliyekî ve li dijî faşîstan dicengî û ji aliyekî din ve jî, li dijî adet, rewîşt û tîtalên kevin dixebitî. Helbestên wê ji aliyê naverok û formê ve bi hêz in û gelek wênên şîrî û muzîkî tê de hene. Zimanê wê sivik e û hevokên wê ciwan darêjtîne. Xwendevanê zîrek bi hêsanî dikare helbestên wê bisengîne. Mixabin heta niha delîve nebûye ku ew dîwaneke xwe çap bike, lê berhev kiriye û nêzik e ronahiyê bibîne. Min li Kurdistana başûr ew dît û ev hevpeyvîn di gel kir. Bi dilxweşî ez dê helbesteke wê jî, ji tîpên erebî wergerînim yê latînî û ji xwendevanan re bikim diyarî.

Xelîl Duhokî: Kengî û bo çi te dest bi nivîsînê kiriye?

Hîvî Berwarî: Min di sala 1975'an de dest bi nivîsînê kiriye. Rewşa aloz a milletê min, karesat û bi dehan tengaviyên wî, siroştî rind ya wî, ez palvedame nivîsînê.

- Jin nîva civakê ye. Nivîskara kurd li devera Badînan, çi pêşkêşî gelê xwe kiriye?

- Ez jî di wê baweriyê de me ku, di gelek civatên pêşketî de, jin nîva civakê ye. Jina kurd jî di gelek qonaxên jiyânê de, rola xwe ya pîroz lîztiye. Ji aliyê edebî û roşenbîrî ve û her wesa ji aliyê siyasî ve jî. Bo nimone çendîn jinên navdarên kurd, mîna Hebsexanî Neqîb, Qedem Xêr û Mîhrebana Berwarî, roleka giring di pêşveçûna milletî de lîztine. Lê mixabin, ji ber gelek sedemên diyar û nediyar, nivîskara kurd, çi li Kurdistanê û çi li devera Badînan, nikarîbûye roleke mezin bilîzin.

- Serhildan û paşê reva mezin, çi di mêjîyê nivîskara kurd de dirust kiriye?

- Her çend berî serhildanê zulm û sitemeka mezin li ser milletê kurd dihate kirin, lê serhildan, mezintirîn mizgînî bû, ji bo vî xelkê hejar û bindest. Lê reva mezin, dilteztirîn karesata me bû, çinku li çi aliyê dinê, ev karê hosan dirrinde, beramber çi milleta nehatibû kirin. Vegera me bo ser axa pîroz, mezintirîn xelat û diyarî bû. Vê çendê jî bi hezaran tişt di serê xelkê de dirust kirin.

- Wek mirov dibîne, jina kurd nikarîbûye mîna zilaman xwe rizgar bike. Giriftariyên wê di mişen e. Tu wek nivîskar, çawan pêşketina wê dibînî.

- Di nav gelek milletên paşketî de, giriftarî hene. Sedemên wê çendê jî pîr in! Lê bi bawerîya min, jin bi xwe dikare hinekan çareser bike. Divê jin zîrek û çalak be. Ew jî wek zilaman, xwedan dest û pê, mêjî û bîr û bawerî ye.

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

- Amadebûna jina kurd, di semîner û civînên edebî de, pirr kêr e! Sedemên vê çi ne?

- Rast e û ez dikarim bêjim, her tune ye. Ew jî divegerîte ve bo nivîskar û roşenbîrên me bi xwe. Ew rê li jin, dayik û xwişkên xwe digirin û dixwazin jin bi tenê bi karê mal û xwedîkirina zarokan ve mijûl be! Carina dibêjin, ev karekî ne rast e, lê mixabin, tenha dev e û ew jî dibêjin, lê napêjin. Ev rastiyeke tal e, lê divê mirov bêje...-

GAZINEK BO ROJÊ

Erê rojê her ji mêje
Ewe ez li vê cîhanê bûme mêvan
Min guh li navê te bûye
Giş dibêjin..
Pirr ciwan û jêhatiye.
Helatina wê
Li ser kêrê û zinara
Hemî tav û ronahiye.
Girnişîna wê li xelkê
Tev de govend û tilîlî û şahîye.
Panê rojê...
Hemî dema her guhên min diveçînîne
Bo hatina mizgîniya te.
Cot çavên min nobedar in
Bo dîtina ronahiya te.
Lê rojê hindî ez li dû diçewirim
Tu xwe li min xeware dikî
Xwe dideye pişt
Beten û çiyayên bilind
Da negehîte min, têhin û germiya te.
Belê rojê baş bizane
Dê ji te ra evîndar bim
Ger xelk te maçî ketin
Ez dê her wekî dînê xwe
Hêştî pirtir
Perêsim ronahiya te.
Ronahiya te.

* Ev hevpeyvîne di kovara Nûdem, hejmar 12, sala 1994 ê de, belav bûye.

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

Dilên şkestî di çîrokên Firat Cewerî de

Zivistan li deverên Kurdistanê pîrr sext û dijwar e. Jiyan li wan deran diraweste û mirov li dûr û berên avahî û cihên pêdivî dikane karên xwe bi rêve bibe. Belê; ew jî cihên mukum û asê ne ji bo bingehên pêşmergan. Erê; li deverên wesana me jiyan dibûrand.

Di zivistana 1982-an de, bingehên me, di befrê re mabûn. Befir, mij û domanê, cîhana me dagirtibû. Di wê rewşê de, baştirîn heval û hogir, pirtûk, kovar û rojname bûn, ew jî bi hêsanî dest nediketin. Hîngê çend ji wan -bi kurmanciya jorî, tîpên latînî- ji hindek rêxistinên Kurdistanê bakûr ve, ku bingehên wan nêzîkî yên me bûn, gehîştine destên min. Her çend xwendin û nivîsîna me bi tîpên erebî bû, lê min bi alîkariya du pirtûkên hêja Ezîz Akreyî, ku di salên şêstê de çapkiribûn, xwe fêrî tîpên latînî kiribû. Lewre ez wek nivîskarekî bi kurmanciya jorî dinivîse, bi wana pîrr kêfxweş û dilşad bûm. Rûpelên wan jî, bi babetên siyasî, edebî û roşenbîrî, di xemlandî bû. Min bi germî dest bi xwendina wan kir. Di Kovara Berbangê de, kurteçîrokek bi navê “Kurmê darê ji darê ye” kete ber çavên min. Bi rastî ew cara yekê bû ku ez çîrokekê bi tîpên latînî bibînim- heta hîngê jî, min Hawar, Ronahî û Roja Nû nedîtibûn- ew ji bo min çîrokek balkêş bû. Lewre min ew û hinde çîrok û serhatiyên din- piştî hîngê min peydakirin-wergerandin tîpên erebî û çapkirin. Belê; têkelyên min û xudanê çîrokê Firat Cewerî, hîngê dest pêkirin. Heta niha wî du pirtûkên kurteçîrokan bi navên “Girtî “ û “Kevoka Spî” çap kirîne. Lewre ew wek nivîskarekê yê hatiye qada edebiyata kurdî û kaniye cihê xwe jî bike.

Di vê vekolînê de, ez dê xwe dahêlime nav cîhana pirtûka wî Kevoka Spî. Ez hêvîdar im bikanim berhemên wî bisengînim û layên geş û tarîyên wan pêşçav bikim.

Pirtûk ji 8 kurteçîrokan pêkhatiye û dîroka wan jî ne xuyaye. Ez naxwazim behsî hunerê çîrokê bikim, lê hêvîdar im di şirovekirin û behiskirinê de, ew çend ji xwendevanî re xuya bibe.

Hêvîdarim çîrokên Firat Cewerî, li ser rewşa paşdamayîna civata kurdî ye. Nebûna edaleta civatî, nemaze di navbera jin û mêran de, ku dibine sedemên mezin ji bo peydabûna giriftarî û pirobliman. Paşketina xelkê me û negotina rastiyê, durûyî, ruhmezinî û quretî, girêdan bi adet û tîtalên kirêt ve, bi efsane û tiştên aşûpî ve, netêgehiştina wan di civata Ewrûpî de û her wesa hinde meselên sade yên rojane di jiyana xelkê de. Belê; çîrokên wî van babetan himbêz dikin. Bi xwendina van çîrokan, mirov agehdarî pişkeka giriftariyên civata kurdî û ya Ewrûpî dibe. Wî bi vê pirtûkê, kaniye xwendevanî rabikêşe cîhana nivîskariya xwe û pirtûkxana kurdî jî xemlandiye. Di civata kurdî de, jin ne mîna zelumê xwedan maf e, eve jî dibe sedemên giriftariyên mezin, ku yek ji wana mesela revandinê ye. Ew jî di civata feoladî de, bi pere, jin û pîrr caran jî bi kuştin û xwînriştinê çareser dibe. Belê; di çîroka Kevoka Spî de, çendîn derdeserî ji bo çendîn malbata çê dibin. Ji zaroktiyê keçikê didine pismamê wê, lê wê ew nevé û dilê xwe daye xortekî din. Çare, tenha revandin e û ew jî wê dikin... Li vêre karesat dest pê dike:

“Ji bo ku dîsan rûyê malbata xwe spî bike, şeref û namûsa wan bi dest bikeve, kuştina keçikê pêwîst bû.(Rûp 13)

Her çend birayê wê nedixwest wê gunehê bike, lê mamê wî û civata paşketî, hemî rê li ber girtibûn. Hîngê kurik jî diête girtin û pazde salan dikeve zîndanê. Lê dema ew derdikeve, çi tiştek jê ra nemaye. Dezgirtiya wî xwe kuştiye, wî jî aqilê xwe wunda kiriye û li dawiyê xwe jî dikuje... Firat Cewerî, zîrekane kaniye biçê nav derûnê qaremanê xwe û wesa bide xuyakirin, ku kurik pîrr peşîman e û berdewam di hizra wê de ye. Ev çende ji aliyê naverokê ve, çîrokê bi ser têxe û pileya wê bilindtir dike. Her sewa lanetê li karên hosan dike û daxwaza nehêlan û binbirrkirina wan jî dike. Babetê vê çîrokê ne nû ye, anku berî niha jî li ser hatiye nivîsîn. Lê çinku eve giriftariyeke mezin e di rêya pêşketina civata me de, lewre li ser nivîsîn û peyivîn, karekî pîrr pêwîst û hêja ye. Di bingehê avakirina çîrokê de, hindêk kêmasiyên teknîkî hene. Çewa rêk dikeve ku: “Tam hûn ê wê rojê bizewiciyana û min ê wê rojê, serê govenda birakê xwe, tayê bi tenê bikişanda. Tam wê rojê destgirtiya te bû mêvanê min...” (Rûp 7)

Keçikê xwe dabû revandin û li wî bajarî nemabû, evca çewa da govenda wî ket!

Her wesa ji layê zimanî û dariştina hevoka ve, zêdeyî di çîrokê de hene. Keçik dixwaze bêje birakê xwe ku, ew herdu wî efû dikan. Firatî dikarî bi hevokekê wê çendê xuya bike, lê ew bi çendîn hevoka xwe digehîne mebestê:

“... Min jê rica kiribû, ku kekê min efû bike. Wê jî soz dabû min ku ew ê te efû bike. Min gotibû, çi dibe, birakê min tayê bi tenê ye, wî efû bike.” (Rûp 8)

Her wesa di cihekê din de dibêje:

“Min ji te re gotibû, kekê min, got. Min ji te re gotibû, ku destên te bi min bibin, ez ê wînda bibim. Niha divê tu destên xwe bi min nekî. Ger tu destên xwe bi min bikî ez ê dîsan wînda bibim.” (Rûp 14)

Li şûna çar rêza, mirov bi duya, mebesta xwe digehîne.

Li welatên paşketî, bihayê jinê kêr e. Lewre ew nikane biryara li ser jiyana xwe bide. Hemî heyî û ferman di destê zelumê de ne. Eve jî li Kurdistanê wilo ye, lê mixabin, dema rewş digehe welatên Ewrûpa jî, zelumê kurd her li ser yeka xwe ne û çî bihayî nadene jinê. Lê li Ewrûpa, wekheviya mirovan heye û qanûn hemyan diparêze. Ev çende dibe sedem ku jina kurd jî daxwaza hindêk mafên xwe yê xwezayî bike. Ji ber hindê jî, ev e bi dilê zelumê kurd nîne û hîngê giriftarî rû didin. Zelum naxwaze hindêk deselata xwe bide jinê, yan jî bi çavekî bilindtir lê binêre. Eve ji aliyekî û ji aliyê din, pişkeka zelama hene ku divên di civîna de û li cem jin, xwişk û keçên xelkê, xwe bi mirovên pêşketî û mafparêzên jinê nîşan bidin, lê her ew kes li malên xwe, diktator in û nahêlin jin û keçên wan ronahiyê bibînin. Belê; li vîre Firat Cewerî, vê mesela girîng dike naveroka çîroka xwe û bi formeke serketî dadinê ber destên xwendevanan. Mebesta wî jî ew e ku, mirovên durû û kevneperist bide xuya kirin û ji aliyê din ve jî, biha û qîmetê bide jina kurd a reben û bindest. Belê; di çîroka “Heştê Adarê” de, ew rewş û têgehiştina mamoste Çetîn xuya dike, ku çewa di civîna de berevaniyê li mafên jinê dike:

“Erê hevalno! Wek hûn dizanin, jinên kurdan bindest in. Ew hem cinsî, hem netewî û hem jî sinifî bindest in.” (Rûp 55)

Lê dema mamoste Çetîn -piştî vexwarina bîrê- di saet yazdeh û nîvê şevê de diçe malê, hîngê cewherê wî xuya dibe. Firat zîrekane perdê ji ser rûyê Çetîn radike û kakila bîr û bawerên wî yê genî aşkera dike. Wî kilîta derî jî heye, lê dîsan:

“Ma qey heta ez bîst caran li derî nidim tu derî venakî?” (Rûp 57)

Her çend jineka jêhatî û baş e jî û bersiveka giran neda zelumê xwe, lê Çetîn wê kirêt dike û jê re: “Hişş, dîsa devê te ve bû.” (Rûp 57) dibêje.

Dîsan jinik xwe dilteng nake û dixwaze li gor dilê wî bipeyive, lê ew bêhin teng dibe û bi vî rengî bersiva wê dide:

“Min xêr e? Êdî tu ne xwarinekê çê dikî, ne kincekî dişoyî, ne malê pakij dikî! Tu ancax bi Gulê re rûnî û paşgotiniyan bikî. Binihêr, carek din jî tu bêyî xebera min neçî cihekî.” (Rûp 58)

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Belê; pirr caran mirovên wilo aşkera nabin û xwe di bin perdê ve vedişêrin, taku jinik bi xwe behis bike yan jî hevaleyê bi ser rewşê de were. Pirriya jinên kurdan, zû behsa derdên xwe nakin, eger kêr negehe ser hestî.

Me got ku giriftariyên jina kurd, li Ewrûpa gelek û xemên wê hindî çiyar e. Bi xweragirtin û bêhinfirahiya hindêka jî, dîsan ew piroblim nayêne çareser kirin. Eve wê çendê nagehîne ku hemî jinên kurd, bêguneh in û bi tenê her zêlam, zilm û zorê beramber wê dike. Nexêr, pirr jinên xirab û bênamûs jî hene ku, mîrên xwe rezîl dikin û çî bihayê nadene mal û zarokên xwe jî. Lê ew kêr in û pirriya astenga zêlam dadinên, çînkû civat, kultur û ayîn jî, rê didete wî ku bi kêfa dilê xwe be û hemî biryara jî ew bide.

Firat Cewerî, di destnîşankirina vê piroblima mezin de zîrek, şareza û bîrtîje. Ev mesele bi ciwanî pêşçav kiriye û bênamûsiya zelamekî kurd xuya dike. Di çîroka Dilê Şkestî de, behsî rewşa malbateka kurd dike ku, zelamek xwedan jinek baş û komek zaroka ye. Jinik li ber ferman û xizmetên wî jî rawestayê û çî kêmasî beramber mal û zarokên xwe nekirîne. Her wesa ji aliyê exlaq û rewuştên kurdewariyê ve jî jêhatiyê- di çîrokê de wesana xuya ye- çî egerên hindê nînin ku dilê zelamî bişkê û wê bêrûmet bike. Zêlam heta nîva şevê digel keça swêdî ye û çî pîtey nadete jina xwe. Pirr caran dixwaze wê çendê li ber jînekê berzeke. Jin rastiyê dizane, lê dîsan jî, ji wî tika dike ku dest ji vê şûlê berde. Ew her li ser yeka xwe ye û guh nede peyiv û tikayên jina reben. Lewre jinik gelek dixeyide û jê re dibêje:

“Ger tu ê vê bi min bikî, min bişîne welêt çêtir e. Ez hew karim îdare bikim, bes e ji derdê te.”(Rûp 21)

Lê ew wê jî nake û her li ser yeka xwe berdewam dibê. Heqaretê li jinikê dike û hemî dergeha jî li ber digire. Li dawiyê jinik ji neçarî biryara xwe dide. Rast e, wê li Kurdistanê nikarîbû bi hêsanî biryarekê bide, çînkû civatê rê lê digirt. Lê li vîre Ewrûpa ye, qanûn û civat jî mafî didenê ku, ne zilmê, lê berevaniyê li xwe bike. Her wesa ji aliyê aborî ve jî, pêwîstî bi zelamî nîne, çînkû kar dike yan sosyal alîkariya jiyanê didetê. Dîsan zêlam nikane li jinê bide û eger lê xist, polîs amadene rê lê bigirin û heta nas û dostên wê jî alîkariyê dikin û çî gazinda jê nakin. Lewre ew bi aşkerayî jê re dibê:

“Ji mala min here! Jinikê got. Bi wê heramiya xwe nekeve nav nivînê min, nivînê min neherimîne.”(Rûp 25)

Her çend zêlam bi qanûnên Ewrûpa jî dizane, lê wî çî car hizir nedikir ku dê peyvên wesana tal ji devê jinikê derkevin, lewre mîraniyê lê da û jinik da ber pê û şemaqa. Hîngê jî polîsa ew havête zîndanê... Rewş bi vê çendê gehîşte berdan û jêkcidabûnê...

Lê mesele bi dilê zelamî bi dawî nehat, çînkû piştî çendê keça Ewrûpî jî, jê bêzar bû û hêla. Dema bi tenê ma û rezîl bû, ji nû daxwaza vegehrînê kir. Digel hemî zilm û neheqiya zelamî jî, dîsan dilovaniya jina kurd rê dayê û hate nav zarokên xwe.

Firat Cewerî, di çendîn çîrokên xwe de, li ser rewşa kambaxa jina kurd radiweste û bi hostayî azar û piroblimên wê pêşçav dike.

Forma çîrokê serketiyê û zincîra rûdanan jî bi hev re girêdayîye û xwendevanî radikêşe kûratiya çîrokê. Zimanê wî sivik e û destpêk baş xemlaniye, lê eger çîrok li vîre: “Ne ji wan bêtir be jî, bi qasî wan zarokên wan jî kêfxweş bûn.”(Rûp 30) bi dawî anîba, çîrok ciwantir dibû, anku ew heft rêzên dawiyê di zêde ne...

Her mirovek di tebîet, taybetî û tîkelyên xwe de azad e, lê divê kesên zana, pêşewa û nivîskarên mileta, ku ala hilgirin di qonaxên pêşketinê de, xwe li ser gelî mezin nekin û wan jî, ji xwe biçûktir nebînin. Lê mixabin, rûh mezin û qure jî hene ku xwe ji xelkê bilindtir dibînin û xwe ji rewuştên xirab dûr naêxin, hîngê ew bihayê xwe li cem hevalan kêr dikin. Ereb dibên:

“Mezinê milletî, xulamê wî ye.”

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Di çîroka Şeva Sersalê de, Firat Cewerî, perdê ji ser rûyê entelektuelekî kurd radike. Her çend heval û nas biha û qîmetê jî didine Metîn Canseverî, lê ew bi rewuştên xwe yê çewt, wê çendê ji xwe re nahêle û xelkê neçar dike ku bi çavekî kêr lê binêrin. Bibênin, ew berovajî tevaya hevalan, direng digehe cihê pêwîst, bi wê mebestê ku merivekî girîng e. Lê vemana wî dilê hevalan diêşîne. Dema ew li cem Alanê ku çend salan ji wî mezintire rûdine, bi quretî dipirse: “Ma xorto tu zûde hatiya Swêd?” (Rûp 32)

Dîsan wesa dide xuyakirin, ku merivekî modêrin e û di kultura Ewrûpa digehe, lê ya xwe biçûk dibîne. Rast e, miletê me paşketiye û qonaxên şaristaniyetê nebirrîne, lê egera vê çendê, ne her kurd in, belku zilm û sîtema dijmina, ew rewşa hosan di cîh de hiştiye. Her çend kar û diyardeyên çewt û pîs di nav miletê me de hene, lê dîsan yê baş jî pîr in, cihê dilxweşiya me ne û şanazyê pê dikin. Ev miletên Ewrûpî jî, di van qonaxan de derbazbûne û bi qurbanî, xweragirtin, dilsojî û xebata, zana û bisporên xwe, gehiştîne vê rewşa bilind di şaristaniyetê de. Metîn Cansever di munaqêşa xwe de, dide xuyakirin ku kurd di gelek tiştan nagehin:

“... Kurd romana min fêhim nakin. Ji bo têgehîştina romanêke wilo, kulturek bilind lazime. Lê tu a rastî bixwazî ez vê, ne ji bo kurdan dinivîsim, min bêtir berê xwe daye Ewrûpiyan. Ji xwe berî kurdiya wê, ew ê ji aliyê du hevalên min yê nivîskar bi fransî û îngilîzî derkeve.” (Rûp 33)

Erê, nivîskarê hosan rê li pêşketina miletê xwe digire û çî rolek baş jî naleyize. Ne bes ev, belku ew li dij hunermendên kurde jî:

“Ka pismamê Alan, ka ji me çî derketiye?” (Rûp 36)

Tevaya musîka kurdî wî têr nake, lê bilûra şivan û derwêşekî hejar î kurd, helbestvanê nemir Goranî dihejîne û dibe sedemê efradina bilindtirîn helbestê, her sewa nivîskar û stiranbêjê nemir Heme Salih Dîlanî jî sewdaser dike û wê dike xweştirîn stiran:

“Ne herfî mektebêkiit xwênd, ne ustadê pelî girtî...
Sîrif berz deka em hunerey fêrkirdî be şimşal it...
Hemû weznêkî goranî, le tûlanî heta kurtî
Be ser pencey huner kirdit, be dîlî koşîşî zal it...”

Ewendem bîst le mosîka, xiroşî rohî bêgane...
Mîzaci kurdewarîm têkçûwe, derwêş Ebdulla...
Dexîlit bim desa bew lawuk, ay ay û heyrane...

Şepolî zewqî millî, pîr derûnî mat û çû lim ke
Le Bêthovin gelê ziyatir, be rohim aşnayî wella...
De ey derwêş, skalayek le gel rohî kilolim ke...
(Ebdulla Goran. Dîwana Beheşt û yadgar, firmêsk û huner . Çapa intîşarat Goran, Sine, Kurdistan.)

Mana wê bi kurmanciya jorî ev e:

“Ne te herfekê medresê xwendiyê û ne jî mamostayekî alîkariya te kiriye. Tu bi têgehîştina xwe van awazan ji bilûrê berdidî. Tu hemî rengên awaza dîzanî û diafirînî. Dê were bi wan lawuk û heyrana, hinavên min bi zewqa millî pîr ke. Hîndî min guh li mosîka biyaniya bûye, êdî zewqa kurdewariya min xera bûye. Tu gelek ji Bêthovin pêtir nêzîkî ruha min î. Dê li hewara ruha min ya damay û westiyay were...”

Çira em mîna Metînî, miletê xwe biçûk bibînîn!? Ma gelo eger di nav tevaya miletên cîhanê de, yê mîna Picso, Franz Kafka û Bethovenî heban, da çira rewşa vê cîhanê wilo aloz û şepirze be?

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Em dixwazîn me yê ji wan zana û bilindtir jî hebin, lê divê em xebatê bikîn, qurbaniya bidîn. Metîn Cansever direwa dike û ew wesana hizir dike ku, eger wî navên çend nivîskarên mezin yê dinê zanîn, yan behsî musîka kilasîka Ewrûpî kir, hîngê dê xelk wî bi şareza û zana zanin. Lê dema ew bi sergiraniyê ji cem hevalan derdikeve, bi rêve vê stirana kilasîka meyxaanên Turkiyê dilûrîne û cewherê xwe yê rasteqîne jî xuya dike:

Hatasız kul olmaz
Hatamla duy beni
Dermansız derd olmaz
Derdimle duy beni

Kurdiya wê:

Mirov bê şaşî nabe
Bi şaşiyên min, min bibihîze
Derd bê derman nabe
Bi derdê min, min bibihîze

Di çîroka Xewna Orhanov de, Firat Cewerî bebetekî girîng heldibijêre û serinca xwendevanî radikêşe rewşa pisîkolojî û aloza mirovê kurd li derveyî welatî. Çinku pîrrianiya xelkê me ji ber sîtema dijminan revîne û nikanin vegezin. Lewre bi tenê xewna bi welat, kes û karên xwe ve dibîbin.

“... Oxx... Dê çiqas xweş bibe. Azadê birayê min çav li min keve, ewê ji dûr ve baz de pêşiya min û mizgîniyê bide diya min.”(Rûp 61)

“Oox...Şukur, tu hatî lawê min. Maşale, maşale lawê min bûye weke şerekê.”(Rûp 64)

Xerîbiyê dilê Orhan xwariye û bi şev û roj di xeyala welatê xwe de ye, lê dijmin rê nadinê û ew jî naxwaze xwe teslîmî rijêmê bike. Anku ew ji bo bi cîanîna hindê armancên pîroz derbeder bûye û heta ew misûger nebin, vegera wî tune ye. Welat di dilê de ye û ew şewutiyê dîtina wî ye. Her çend dijmin rê li çûna wî digirin, lê ew qet nikarin rê li xewnên wî bigirin. Ew berdewam li welatî ye û di nav kes, kar û havalên xwe de ye. Belê; ew welatparêz e û xebatê dike taku rojekê zû, welatê wî jî, ji destên dagîrkeran rizgar bibe:

“ Binhêre, me ji te re dinivîsand û digot, welatê me xweş bûye, bûye cenet, te bawer nidikir.

Esker mesker nemane, polîs nemane, tu kes hevudu nakujin, her kes ji hev hez dikin. Ma ne te jî wisa dixwest? Binhêr, binhêr bê çiqas xweş bû ye.”(Rûp 65)

Eve çîrokeka wî ya jêhatiye û ji layê naverokê ve serketiye, lê kêmasiya wê ew e ku zîncîra rûdanan bi hev re girêdayî nîne û çîrok bi rengekê normal bi dawî naê. Lewre hinde aloziyê têxe forma wê. Her ji destpêkê û heta nêzîkî qonaxên dawiyê dibe, rûdan xwendevanî bi germî radikêşin, lê ji nişkave, bêy ku sedemek hebe, dibê:

“Ev xewn e, bi xwe xwe got. Ev dîsa weke her car xewn e.”(Rûp 66)

Li vîre xwendevan jî di gehe armancê û xuya dibe ku Orhan di xewnê de ye û mirov tiştên normal û ne normal jî di xewnan de dibîne. Lê dîsan ew dest bi rûdanan dike:”Otobosa wan gihîste Diyarbekir...”(Rûp 66)

Erê, li vîre çîrok tev li hev dibe û dilê xwendevanî, ji xwendinê sar dike...

Di çîroka Doktor Sertaç de, Firat Cewerî, dixwaze di rêya qaremanê xwe de, xwendevanî aqêhdarî rewşa gelek bîspor, ronakbîr, nivîskar û dewlemendên kurda bike, ku çewa keftîna bin sîbera hizir û bîrên dagîrkeran û di gehe hindê ku Sertaçê diktor û ji malbata qareman û şehîdê

doza kurdî Şêx Seîdê nemir, wênêkê Ataturkî li ser masa jora rûniştina xwe dane. Ji wê pêtir jî, dema li ser doza kurd û mafên kurdan, digel Perwînê minaqeşê dike:

“ ... Ger ji kurdan re musade bê dayîn ew ê sibe Erebb jî, Çerkes jî, Asûrî jî, Ermen jî, Gurcî jî doza vî heqî bikin û ger bi vî awayî here ew ê Tirkî hilweşe û ev Cumhuriyeta ku li ser heqîyê ji aliyê Kemal Ataturk ve hatiye li dar xistin, ew ê nemîne û bi vî yekê ew ê bi tenê kêfa emperyalîstan bê.”(Rûp 50)

Belê mirovên hosan di nav kurda de hene. Wene be ku bi zilm û sitema dijminan û rê girtina şaristaniyê li ber miletê me, ev çende bûye, lê ji aliyê din ve jî, xelkê me bi xwe zû ji bin vî perda reş û tarî dernakeve.?? ...Zanayê turk îsmâil Beşikçi dibêje:” Mirov bi çî zimanî bipeyive, ew ê bikeve jêr tesîr û katêkirina wî miletî.”

Dijminî zimanê me qedexe kiriye, rê li pêşketina me girtiye. Lê cihê daxêye ku, li Ewropa û di vî azadiyê de, kesên ku şoreşger bûn û ji ber terora dijminî revîn, zarokên xwe dinêrine fêrbûna zimanê turkî û di malên xwe de jî, bi turkî dipeyivin!!! Eve jî dibe sedemên windabûna zimanê kurdî. Gotineke Çîkoslovakiya heye dibê:“ Heta ku netewe, xwediyê zimanê xwe be, heye.”

Xortekê kurd, piştî deh salên Ewropa, ji nû vedgere welatê xwe. Dilê wî pirr xweş dibe, nemaze bi razana ser bana. Tiştê balkêş di çîroka “Stêrkek ji ezmanê me xuricî” de, ew e ku niha li Kurdistanê şoreşker gerim heye, lê di nav wê de, keçên kurd jî hene û xebateka berdewam dikin. Dema şehîd dibin, kes û karên wan çepika lê dixin û tilîliya vedidin.

Di çîroka Kêzika Bênav de, kurdek ji Swêd diçe Qamişloyê. Çinku çend sal e li derve, êdî xwe ji bîr kiriye ku ew jî yek ji wê xelkê bû. Dibe ew bi xwe ji gundekê deştê yê bê av û di nav tozê werbûyî jî hatibe, lê kêza bûnamûs wî dilteng dike û xewa şêrîn lê heram dike. Başê leşkerê kêç û spiha hêriş ne aniye ser, nexwe ew di jiyana xwe de jî ne vedgera Kurdistanê!

Her çend nas û heval wî mêvanî mal dikin, lê efendî ji xwe nagire here malên wan yên bê ava gerim û pîs!

“Ji serşûştun û razanê pêve tu tişt nedihate bîra min.”(Rûp 71)

Yê guh lê bibe, dê wesan hizir ke ku, kurd serên xwe naşûn û cihê razanê jî li cem wan tune. Ev çende dibe cihê diltengiya wan û ew jî êdî çî pîtey pê nakin.

Firat Cewerî di hindêk çîrokên xwe de, teknîka kevin-şêwê vegêranê-bikar aniye û eve jî dibe sedemên peydabûna hinde lawaziyên di formê çîroka hunerî de. Her çend zimanê wî yê sivik û xweş e, lê carna dariştina hevokên wî sist in. Xeletiyên çapê jî hind di zûrin ku mirov ji bin dernakeve.

Li dawiyê ez dikarim bêjim ku, Firat Cewerî, çîroknivîsekî serketiye û xwedan taqet û şiyânên huneriye. Paşeroja geş li benda wî ye, çinku bê şik wî kaniye cihê xwe di qada edebiyata kurdî de bike. Çîrokên wî ji bo xizmeta mirovatiya bindest û pêşketina mirovê kurd, ji bo cîhaneka nû ya bê sitem û çewsandin û rojên xweş, yên hatîne efrandin.

Meksîm Gorkî dibêje:” Erkê hunerî ew e ku mirovî bi hêz bike, giriftariyên jiyana wî sivik bike, bawerî, omêd û evîniyê di dilî de, mukum bike.”-

* Ev lêkolîne di kovara Nûdem, hejmar 13, sala 1995 an de, belav bûye.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Helbestvan û xweragir Sebriye Hekarî

Sebriye Hekarî di sala 1948-an de, li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Şeş salan xwendiyê û di sêzde saliyê xwe de de mêr kiriye û niha neh zarokên wê hene. Di sala 1969-an de, dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Rejêma faşîst a iraqê, di sala 1977-an de, zîlamê wê li sêdarê dide. Ew bi wê rewşê zarokên xwe xwedî dike û li ser vehandina helbestan jî berdewam dibe.

Di sala 1989-an de, dîwanek helbestan bi navê “Parzînkê Hîviya” çap kiriye û du dîwan jî ji bo çapê amade kirine. Endama Yeketiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana başûr. Niha jî berpirsiyara Yeketiya Afretên Kurdistanê ye li Duhokê.

Piştî zulma dehan salan, gelê kurd li Kurdistana başûr, karî bi serhildanê rabe û dezgehên faşîyan têk bide. Ew salên giran û pirr sitema hovan li ber çavan in. Her wesa şehîdbûna mêrê Sebriye Hekarî û rewşa aloz a xelkê bêguneh naêne jibîr kirin, lewra ew dibê:

- Serhildan delîveka dîrokî ye û divê her kes li gor şîyanên xwe xebatê bike û nehêle hêzên hovan cardin welatê me dagîr bikin. Ev azadî û serbilindiyê niha, hêzê dide û dilê mirovî pirr hêvî dike. Divê em vî welatê wêrankirî ava bikin û vê hukumeta sava biparêzin û nehêlin destên genî yên dijminan pîs bikin.

Di rewşek weha kambax de, welatê me pêdivî tevaya xelkê ye, nemaze edîb û rewşenbîrên kurd. Helbestvana jêhatî Sebriye Hekarî weha didomîne:

- Barê edîbên kurd giran e û wezîfa wan jî mezin e. Divê ew piştevaniya milletî bikin, çinku doza welatî ji hemî tiştekî pîroztir e. Lê mixabin û ji ber her sedemekê be jî, nivîskarên me nekarîne rola xwe bilîzin.

Helbet dema bizaveka rexneyî ya bi hêz hebe, hîngê edebiyat pêş dikeve û qonaxên sext dibire û digehe pileya yên nemir. Helbestvana me li ser rexnê weha dibêje:

- Bi rastî rexne nakeve berçav û bêtir li ser xeletiya dinivîsin, yan jî pesnê zêde didin û berjewendiyên xwe diparêzin, ne ku berhemê edebî ji aliyê form û naverokê ve disengînin.

Ew wek pîrekeka kurd, rola xwe dilîze û bawerî heye ku jin nîva civatê ye û wê jî pirr qurbanî dane. Li ser vê meselê jî, van peyvyan rêz dike:

- Rola jinê gelek e, nemaze niha azadî heye, komele û bingegehên afretan li her derê welatî hene. Jina kurd bi dirêjiya salan, di nav şoreşê de, xebat kiriye û çendînen wan jî şehîd bûne. Ew dayik, xwîşk û jina qareman bûye û zîndanên faşîyên Îraqê jî, şahidên vê rastiyê ne.

Belê; afreta kurd berdewam di senger û çeperên şoreşê de rûniştîye û bi çek ê qelemê xwe jî xebat kiriye. Mêr, kur û bira lê şehîd bûye, di zîndanên de xwe ragirtiye û armancên gelê xwe parastîne.

Sebriye Hekarî, helbestvan, dayika neh zarokan û jina şehîdiye. Xweragir û serbilinda milletê xwe ye. Em ê helbesteke wê jî ji xwendevanan ra diyarî bikin...

HILON GELO...

Hilon gelo mitî bes e
Bêhinvedan ne bo me ye
Ma nizanin

هه و النامه ی کتیب

Heyva evîna omêda xeware ye!
Tirojkên roja azadî û serbestiyê
Bijale ye
Mafê xwîna min berze ye!
Xemxorên tev mafên resen
Di hizra da şepirze ye
Giriftar e, tengezar e, kesîre ye!
Ma nizanin
Stêra Xeca Siyabendî
Li esmanê stêristana, posîde ye!
Kezî û biskên Zîna Memê
Li Cizîrê, hêşta di destê cendirma da
Dikene xilfa sêdarê
Bo gerdena Mîrê me ye...
Ma nizanin
Axa gora tev şehîdan
Gazî we ye.
Dibêjîtin, hilon hilon
Guh nedene kuledara
Kuledara paşêxistîn
Olperêsa, diravrêsa
Ji zanîne dwîrêxistîn
Lewma gelo
Naveroka paşeroja me eve ye...

* Ev hevpeyvîne di kovara Nûdem, hejmar 15, sala 1995 ê de, belv bûye.

Jina kurd û barê giran

Nezîre Ehmed (Deyka Dalya) yê di sala 1955-an de, li havîngeha Sersîngê ji dayik bûye. Heta bi navinciyê xwendiyê. Her ji sala 1978-an û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di festîvalên edebî de jî xwendîne, lê hêşta çî dîwan çap nekirine. Niha jî li Kurdîstana başûr e.

Dijminî berdewam rê li ziman û çanda kurdî girtiye û nehêlaye pêş bikeve. Lewra nivîskarên delîve nedidîtin ku rola xwe ya girîng bilîzin. Gelê kurd li benda rojeka nû bû ku, perdên tariyê ramale û bigehe azadiyê. Belê; xewn bûne rastî, millet bi serhildanê rabû û hêzên faşîzmê rateqandin. Lê Nezîre Ehmed bi axîn dibêje:

– Berî serhildanê, delîva belavkirinê ne pirr bû. Nivîskarên li bin perdên sembola ve xem û derdên gelê xwe dikirine helbest û berhemên din. Dijminî rê girtibûn, nemaze li ber jina kurd. Piştî serhildanê jî, nivîskarên me di sala yekê de, roleke mezin lîstin û têhna xwe şikandin, lê mixabin ew hêvî û armancên wî bi cî nehatin û giriftariyên siyasî, civakî û aborî li Kurdîstanê, dergêhên pêşketinê dîsan girtin!

Piştî salên bindestî û sitema dijminî, Kurdîstana başûr rizgar bû. Ronahiyê xwe havête hemî aliyên şewitî û wêrankirî. Li tevaya welatî şahî û govend hatine girêdan. Lê ev xweşî binax bû, çinku şerê birakujyê birîn kûr kirin. Nezîre bi dilekê şikestî dibêje:

– Em hemî dizanin ku şerê birakujyê, ne di berjewendiya gelê me de ye. Çinku eger ev delîve ji destê me çû, êdî vegera wê zehmet e. Lewra divê gişt nivîskar helwêsta rast û dirust wergirin û berhemên xwe nekine di xizmeta çî partîyan de. Her wesa ya fere ku destnîşana kêmasiya bikin û li dijî binivîsin.

Jin nîva civatê ye û ew civata rê nede jinê û nehêle rola xwe bilîze, ew pêşnakeve û nagehe bajarvaniyê. Belê; di nav civata kurdî ya paşketî de, giriftariyên jina kurd gelek in. Helbestvan Nezîre Ehmed li ser vê meselê jî dipeyive:

– Dibêjin ku jin nîva civatê ye, lê mixabin hêşta qeyd û zincîrên di dest û lingên jina kurd de, nehatine şikandin. Ji ber milletê kurd yê di bin barê eşêrtî yê ve, rewuşt û adetên kevin rê li pêşketina wê digirin. Ez dibêjim ku her çend jina kurd pêwîstî bi alîkariya zelamî jî heye, lê ew pêşnakeve, heta ku ew bi xwe berevaniyê ji xwe neke û astenga neşkêne.

Nezîre Ehmed, di nav rêzên Yeketiya Afretên Kurdîstanê de xebatê dike. Helbestvaneka serketiyê û bi doza gelê xwe ve girêdayî ye. Bi rastî jî barê jina kurd giran e. Ew dayik e, karker û şoreşger e.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

DILÊ BÊZAR

Ew hozana bi xûna dilê xo
Min bo te vehandî
Ew tevnê
Bi hizr û bîra min raçandî
Hizar çîrok ji eşqa te

Kirine pirtûk
Min çap kirin
Belav kirin
Viyana te di dilê min da
Hêdî hêdî zer dibît û diçirmsît
Bi gotinê te yêr wekî tîra tijî jehir
Min dikujîtin
Evîna te di dilê min da mişext dibît
Hozanê min di destên te da êxsîr dibin
Ew tevnê min raçandî
Tevinpîrka tevnê xo li ser raçandî
Ew çîrokê min nivêsin
Xêrkê mala xo di nav dana
Di ser hindê ra
Dilê minê birîndar e.
Dinalîtin. Digêrîtin...

* Ev hevpeyvîne di kovara Nûdem, hejmar 16, sala 1995 an de, belv bûye.

AZAR Û KOVANÊN HEJARAN DI ÇÎROKÊN ŞÊRZAD HESEN Î DE

Ew di sala 1952-an de, li bajarê Hevlêrê ji dayik bûye. Her li wî bajarê xwendiyê û di sala 1975-an de, pişka inglîziyê li zanîngeha Bexda, bi dawî aniye. Piştî sala 1970 ê dest daye nivîsîna kurteçîrokan. Mişe gotar û vekolînên edebî jî nivîsîne û di rojname û kovarên kurdî de, belav kirîne. Heta niha ev pirtûkên jêrî çapkirîne:

1. Tenyayî. Komele çîrok, 1983.
2. Be tûreyî awirêk le rabirdû biderewe. Şanogerî, ji inglîzî wergerandiye, 1986.
3. Gulî reş. Komele çîrok, 1988.
4. Firmêskenanî kukuxtî. Komele çîrok, ji inglîzî wergerandiye, 1988.

Şêrzad Hesên, nivîkarekê serketî ye û cihekê taybet di qada edebyata kurdî (Kurmanciya jêrî-soranî) de heye. Çîrokên wî ji aliyê form û naverokê ve bi hêz in. Zimanê wî sivik û xweş e. Ji bo têgehiştina berhemên wî, xwendevan zehmetê nabîne, çinku ew ji bo cemawerê hejar dinivîse û dixwaze di rê ya edebî de, xizmetê bike û gelê xwe jî hişyar bike. Hêvîyên çîrokên wî, li ser giriftariyên jiyana rojane ne û qaremanên wî jî, ji texa feqîr û tepeseran e.

Nivîskar di vê kurteçîroka xwe de, li ser rewşa jineka kurd diraweste. Mêrê wê dimire û ew bi kurê xwe yê biçûk ve, dikeve ber hîg û dîngên jiyana giran. Ew xort û ciwan e, lê kes û kar rê li mêrkirina wê digirin. Ew çendîn salan li ber sitem û zulma kes û karan dimîne, lê paşan di gel kurê xwe direve û ber bi bajarê diçe. Xwe ji ber wan vedişêre û bi wî rengî dijî. Hemî jiyana xwe bi karên xelkê, ji balavê, nanpehtinê û paqijkirinê ve dibûrîne û lawê xwe bi serbilindî û serferazî mezin dike. Jinê jî, jê re difîne û nahêle tiliya kesê bête navçavan. Ew mirov e û dilê wê jî diçe jiyane, lê ji bo ku, lawê xwe bigehîne armanca, ew van qurbaniya dide. Li vîre rola pîroza jina kurd xuya dibe, ku çewa xwe disoje da ku ronahiyê bide kurê xwe. Nivîskar zîrekane diçe nav derûna bîjineka kurd, rewş û qurbaniyên wê destnîşan dike.

Ev çîroke ji pirtûka wî ya bi navê (Tenyayî) hatiye wergertin. Ez wê ji tîpên erebî werdigerînin yê latînî û hêvîdarim dilê xwendevan xweş bike.

* * *

BÊWEJIN

Bem ser le beyaniye zuwey hawîn. Beyanî pirr le xewn û lezzet û tiwanewey kurtî şew. Le jêr lêfe tenkekey hate der. Lêfeyekî nawaxin luke kem hestayewe. Leşk û lêwî kiras û kewakey berdayewe. Doxînekey xizabû. Destî geyandê û helkêşayewe. Leşî wişk û tînuş biyabanêke. Be dirêjayî penca salî têperro be serçû. Tenha yek sal baranî dîwe. Şew û rojî salanêkî zor dên û deron. Ew her ew biyabane tênuweye. Gelê le biyabanîş be fîztir e. Hîç biyabanêkî mezin û gewre tînwêtî xoy naşarêtewe. Biyaban deteqê. deqlîşê. Rêbware manduwekan win deka û deyankujê. Ger tûreş bû, reşebay şetî rojhelat û rojawa denêrê. Gund, şar û wilate dûr û nizîkekan

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

pirr deka le xol û toz. Belam em bêwejine, biyabanêkî wişk û hêmine. Sî sal pirr baran têperrîwe. Em ûnwêti xoy şardotewe. Tînu bo baranî sedeha zistan deysarêtewe. Çinku gund û piyawe maqûlekanî neyanhêşt. Şerm û abrû, ew delemey le sikya bû. Mamekanî deleme. Xalwanî deleme. Jinanî mam, jinanî xal, xuşkanî xal û mam, xaloza û purza kobûnewe: Nabê şû bikatewe. Şûreyîye! Kê deygot wa zû demrê. Xoşî wîst. şuwî pê kird. Salêk nesûrrayewe mird. Bêwejinêk û tenyayî û sawayek. Bes rojgar dê û derwa. Eweta awirêkî lay çepê dayewe. Seyrêkî çixeykey kird. Kê lew bawere da bû, ew bêçwey le gund û şar, le ser sîng û pişt bexêwî kird. Êsta yekem mangî zawayetî bê.? Afretêkî rû sûrîşî le lawe xewtibê.?!"

Ruwew rojhelat rûy wergêra. Tem û tarîkî şew gird û çiya dûrekanî dapoşîbû. Hêştâ şefeq e. Malekeşyan le ser girdêka gîrsatewe. Detwanê deyeha serban û naw hewşî nizîk bibînê. Sedeha ne dûr û ne nizîk. Hezareha serbanî dûrtir. Kelegeyetîyekey ziyatir way kird deşte nizîkekan nizîktir bibînê. Yekem beyaniye hez be we bika çaw be serban û naw hewşekana bigêrê. Loçî kiras û kewakey saf kirdewe. Destêkî geyandewe lastîkî nîfokey. Ziyatir helkêşayewe. Demew niwêjî beyane. Debwaye wek rojanî dîke. Hezaran rojanîtir, be ser pêplîkekana bête xwarê. Be awî bermîleke destniwêj helbigrê. Belam xewne pirr şermekey emşew le niwêjî çuwand. Beyaniyan xwarewe. Naw heşeke. Jorekan sard û xamoş û pirr tirsin. Beyaniyan bermalkey beranber dû wêneke radexa. Wêney bawk û kurr. Herdû wêneke hê temenî gencêtîn. Rûxsar û akarî yekdî heldegirin. Wêney bawkeke zerd helgerawe, sîmay mirdinî pêwe diyere. Le çend layekewe teqîwe. Camekeşî nagorin. Neba weku êşqanî xawene mirduwekey bibê be ard. Zurbey beyaniyan her be ser bermalekewe, seyrî wêne zerdeke deka û degrî û dekrrozîtewe: " Zû cêt hêştim.!"

Hendê beyaniyan daydegrê. Têr seyrî deka. Maçî deka. Boy degrî û çawekanî desrêtewe. Ke têr girya be bizmarekewe helîdewasêtewe.

Îmro beyanî, le jêr kiras û kewa xemdarekey. Le nêwan tarîkî û temî em beyaniye zuwe da, le dûrewe le tabloyekî reş deçê. Bêwejin zoryan reş poşin. Emîş herwa. Sî sale reşî poşîwe. Heta le zemawendî kure taqanekey da. Kesê lay lê nekirdewe. Daway lê bika, em cile reşane bigorrê. Dirawsêyek, xizmêk, pîremêrdêk, pîrejînek, kurrêk, kiçêk û heta kurrekey xoy. Ew kurey le pênanawî da goştî ew leşe nasik û ciwaney bo tiwandewe. Gund û şarî birrî. Ew mal û ew mal. Karekerî, cilşorî, nanopewederî. Pênc salan bû ke be kolî dada û le zolmî xalwan û maman, gundî cê hêşt. Le şarî pirr le mend û şet xoy win kird. Be rûy ew piyawane derawesta ke xwênî gamêşêk le demarekanyana desorrê. Em kun û ew kun xoy deşardewe. Şwên pêyan helgirtibû. Rijanî xwênî le ber çaw bû. Belam ew roje pirr tirsane royîştin. Êsta em kurrey naw çixeyke, dêwî hemû tirsêk rawdenê.

Be hemû layek da milî werçerxand. Dîsanewe serbanêkî zorî bînî. Koşk, xanûy hakezayî, xanûy qurr, çendanêkîtir ne koşk û ne qurr. Rêzêkî zor le cilî helxirawî şew. Aryelî zorî telefizyon. Çiwar paye û qerewêle. Perde û kulley zor. Rengaw reng sor, spî û zerd. Hêştâ zue le şîrîn xewdan. Le her çwar lawe kullekan dadirawnetewe. Xewî be cûteş weagahatinî wa zuwî nawê. Cestey minale wirdîlekan be serbanewe nûsawin. Çend serbanêkî çol, çendanêkî dîkey qelebalix. Serbanî şûredar, serbanî bê şûre, şûrey nizim, şûrey bilind. Lem gereke da jimarey çixekan le kulle ziyatirin. Le hawîna hemû şîtê nîmçe rûte. Hez deka terr bibêtewe. Le wişkayî naw naxî xoy qels û bêzar e. Mirov, balinde, dirext. Tenha ew xemî pîre dirextêkî heye û aw naygatê. Dirextêk bo dilopêk awî bizir regî be naw naxî zewîyekî wişk û sûtaw da robiçê. Dirextî pîr û bê aw çiro nakat. Hemû şîtê degorrê. Le batî darî radyo konekanî zemanî zû, aryelî telefizyon be ser zurbey serbanakanewe diyarin. Xwardin, nustin, cil û berg, dem û çaw, qijdahînan, serban, şeqam, afret, piyaw, naw, hemû gorrawî û degorên. Reng werdegirin û reng berdeden. Tewaw... Em be serçû. Tenha xemî xoy heldegirê. Wek minalî dawî kolare winbuwekey rabkêşêtewe. Le ser xo nîgay dûr helfirîwî gerrandewe. Le çiya dûrekanewe bo girde dûr û nizîkekan, serbane dûrekan, serbane

dûr û nizîkekan. Nizîk. Nizîktir. diwayî le serbanekey xoyana gîrsayewe. Ew serbaney le serî û le jêrî da, salanêke her be tenya dexewê. Şitêk le serbaneke sirincî ranekêşa. Ger em çixe nebê, serbanêkî rût û çole. Ke bo dûbare seyrêkî çixekey kirdewe, le naxewe daçlekî. Dîmeneke asayî nebû. Muçirkî sardî piya dehat. sertapay giyanî kewte mîrûle kirdin. Be birînêkî nadiyar û şarawe kulayewe. Kilawey çokî şil bû. Kemêk delerzê. Hestêkî têkel le tirs û şerim daygirt. Cogeley ser birrbirrey piştî areqey kird. Çawekanî daxist. dûbare helîhênayewe. Be kizî serincî dîmenekey da. Çixeke le yek lawe kirabuwewe. Be perdeyek dadirabuwewe. Le jêr perdekewe dû pêy lûs û biçkolanewe dû pêy gewre û borî bînî. Le jêrewe le tixûbî pedekewe tirazabûn. Dû belekî tûkin û dû belek û pûzî lûs le yektirî alabûn. Wek dû marî estûrî aşiqe û maşiqe be yekewe nûsabûn. Xaw û mandû rakişabûn. Pizuwî derpêy afeteke ta çokanî helkişabû. Arezûy kird weagayan bênê. Arezûşî nekird. Neşyawe. Mangî yekemî bûkênî, weagahênan gunah e. Wîstî wek xewnî xoşî kwêrêk be yadî bêtewe. Bîrî çotewe. dû beleke lûseke le beleke tûkinekan xirr û pirr tirin. Le we deçê xwên û hêzyan le beleke tûkinekanewe wergirtibê. Le dilî xoyewe gutî:

" Yekem sal, êmeş her wa bûyn. Her ew sale û hîçîtir.!"

Dîmeneke ziyatir matî kird. Dasanewe le dîmenekewe nîgay rûwew rojawa helbirrî. Çawêkî be serban û kulle û çix û aryel û hewş û kolanekana xişandewe. Bîrî le salanî kon û zû kirdewe. Penca salî temen, çî kird? Çî bika? Hemû jiyani wek momêk bo kurreke dağîrsand. Xem û tirsêk dinyay jêr em şefeqey lê tarîk kird. Tirs û xemî em afretey mangêke kurrekey lê zewit kiduwe. Îtir em çawerwanî çî deka? Lem diwayîye da pîremêrdêkî zor hatin û dawayan kird. Axo şiyawe diway em temene dirêje cile reş û xemdarîyekey dabikenê.? Naşê. Bîrî kewtewe, şewêkyan kurrekey çî pê kird. Zanîbûy mame Ebey Tutinçî daway kiduwe. Ew şewe hizar car tilayewe. Her abrûy bird. Dirawsêyekan gwêyan le hera û qarr û qîreke bû. Kurrekey her deynirnd: " Şerim naka. Be pîrî xoy terr dekatewe.?" Xelkî dewr û berî serbaneke mat û sersam bûn. Ewaney be pêwe bûn, danîştnewe. Ewaneşî ke danîştibûn le hejmetana helsanewe serpe. Gwê lêyan bû ke deyangut:

" Tû xwa gunah. Zulme. Gelê zulme way pê kird."

Ew şewe be kul bo bextî xoy girya. Pirseyekî bîr hatewe. Mêrdî Zêrînîş mird. Bêwejin zor bûyne. Îmro be kamî dilî xoy degrî. Îtir bo negrî. Her ew tinoke firmêskane xemekey deşonewe. Kit û pirr gwêy le teqey derkagebû. Weaga hatewe. " Debê kêbê?" Le ser xo hengawî na, geyişte astî gwîswaneke. Serî xwar kirdewe. Tenha camanekey bînî:

- Fermû krrim,kêy?

- Dapîre, Ciwamêr weagaye?

Wişey " dapîre" le naxewe helîkend. Ke dem û çawî kabiray bînî, nasîyewe. Hawrêy qurrkarî Ciwamêr bû. Êsta zor şiyawe weagay bênê. Lew dîw çixekewe be dengêkî pirr le xem û giryan û bêzarîyewe bangî kird:

- Ciwamêr, kurrim Ciwamêr.

Ciwamêr legel dengeke daçlekî. Weagahat. Hestayewe. Xoy lêk rakêşayewe, Çawekanî helgiloft. Her be cilî îşewe nûstibû. Cilî jêr barî geç û xol û qurr. Xo gorrînî nedewîst. Le jêr çix û perdekewe hate derê. Daykî seyrî dekird . Henasey Hewanewey deda. Belekekan le yekdî bûnewe, yektiryan azad kird. Naxoştirîn azadî. Girêy nihênîyek le naxî bêwejinekeş kirayewe. Ciwamêr berew qaldirmekan miî na, dû dû pîpliyekan debrî. Be hewşeke da degerra. Bo kilaşekanî degerra. Dozîyewe, le pêy helkêşa. Le xwarewe dengî hate ber gwê:

- Ey çayeke dayke.?

Dayke welamî nebû. Be şermewe serî daxist. Yekem beyanîye çay bo lê nenawe. Em xewn û xeyale çî bû? Key wabuwe? Tem û tarîkî rewîyewe. Teqey dergake hat. Kurrekey kirdîyewe. Dayxistewe. Kiz û mat her be pêwe westa bû. Bûk helneta. Bêdengî û tenyayî xemêkû qursî bo hêna. Janî gerdelûlêkî betîn naxî pirr toz û xolî xem kird. Serkewt, taqurgî girt. Êsta le jêr karesatî

هه و النامه ی کتیب

rojanî êsta û rabirdûy da deynaland. Bêdeng deynalan. Taze bûk her helneta le xew. Ta tozê em bêdengîye bimalê. Zerdey xor derkewt. Hêdî hêdî tarîkî şeqam û serban û hewşe û kolanekanî raw dena.!

PEYVÊN GIRAN

Abru	: Hetik, fihêt
Afret	: Jin
Areq	: Xuh
Aryel	: Antên
Bermalek	: Şemilka nivêjê, Çarçef
Bêwjin	: Bîjin, jinebî, jina mêr lê mirî
Beyanî	: Siharê, spêdê, subê
Biçkulane	: Biçûk
Çîxe	: Perde, perjan
Dapoşîbû	: Têwerkirîbû
Deleme	: Negehiştî, xag, xav
Derwa	: Diçe, dere
Dirawsê	: Hevsî, cîran, cînar
Dirext	: Dar
Diwayî	: Dawî, dîmahîk
Firmêsk	: Rondik, hêstir
Fîztir	: Naziktir, şengtir
Gerdelûl	: Bahoz
Gîrsa	: Bi cihekê girêdayî, cêgîrbûn, bendbûn bi cihekê ve
Helneta	: Ranebû
Hengaw	: Pêngav
Keleget	: Mezin, bejin bilind û kelex mezin
Kewa	: Serkiras, cubbe
Kirabû	: Vekirîbû
Kolare	: Firoka kaxezî, teyara ji kaxezê çêdikin
Kulek	: Kule, patê li dûr nivînê nivistina şevê diwerînin li serbana
Kwêrêk	: kore
Luke	: Pembî
Lûsek	: Hilî, bê mî
Mang	: Meh, heyv
Mat	: Bêdeng

Naşê : Nabe
Nagatê : Negehê, nagehîtê
Nawaxin : Naverok, pêrist, tê de
Nûsabû : Pêvemabû, bi hevre, pêkve

Piyaw : Mêr, zelum, nêr

Qaldirme : Peyîsk, pêpelîsk
Qurs : Giran, bi seng

Sawa : Sava, pîrr biçûk
Sersam : Damaw, sewdaser, hêbetî
Sî : Sîh, sih, 30

Şardotewe : Veşartî
Şeqam : Cade, rê
Şêt : Dîn, bêmejî
Şûreyî : Fihêt, kirêt, eyb

Taqane : Êkane, bi tenê
Temen : Emir, jî
Tirazabûn : Ji hev cidabûn, dûrî hev

Weagaye : Hişyare

Xiza : Tehisî , bi dizî
Xol : Ax, xak, gil, erd

Zemawend : Dawet, govend, şahî

Çend stêrên geş di esmanê helbesta nû ya kurdî de

Di civata me ya paşketî de, asteng û kospên di rê ya jina kurd de gлек in. Di rewşek weha xirab de, helbet , ew nikare rola xwe jî bilîze. Nemaze di karên hunerî de. Lê digel hindê jî, wê xwe havêtiye qada xebatê û kaniye astengan bişkêne û ber bi pêş de here.

Belê; di van salên dawiyê de, çend xwişkên jêhatî bi germî dest bi nivîsîna helbestan (Bi zaravê kurmanciya jêrî-soranî) kirîne û hindekan dîwan jî çap kirîne. Di vê gotarê de, em dê jiyan û berhemên çara, ji tîpên erebî wergerînîn yên latînî û hêviya me ew e bi dilên we bin.

Ji xwe ji helbestên wan xuyaye ku, ji aliyê form û naverokê ve di serketîne. Bi zimanekê kurdî yê xweş û sivik hatîne nivisandin û bi wênên ciwan û hevokên dagirtî xemlandîne. Her wesa bi babetên siyasi, civatî û xemên mirovî ve vehandîne. Di helbestên xwe de, berevaniyê ji doza pîroza gelê xwe dikin û li dij adet û rewîştên kevin dirawestin. Daxaza guherîn û pêşketinê dikin û hewul didin ku, qeyd û zincîrên di dest û pê nî jina kurd da bişkênin û wê bigehînin pileyên bilindtir di bajarvaniyê de. Mirov dikare bêje ku, ev helbestvane cihê şanazî û serbilindiyê ne û paşeroja geş li benda wane. Em dê li gor jiyê wan rêzkîn, çinku bi baweriya min, ew , di esmanê helbesta nû ya kurdî de, çar stêrên geş in...

Jîla Husênî

Ew dibêje: “ Ez di sala 1964-an de, li bajarê Seqiz, Kurdistana pişka Îranê de ji dayik bûme. Di binemaleka olperist û edebdost de jiyam. Min di pazde 15 saliyê de mêr kiriye! Lê piştî çar salan, em ji hev cuda bûn. Her ji zaroktiyê min dest bi helbest xwendinê kir. Babê min , çîrok û serhatî ji min re dixwendin, nemaze yên Hafiz î. Hîngê wan helbestan karekê mezin li ser mejî û derûna min dikirin. Bi hizra min, helbest zimanê hest, şadî û xweştiviyê ye.

Ez bawer dikim ku, tevaya jinên kurd helbestvanin û her bi şairî ji dayik dibin. Çinku her ji zaroktiyê, digel xem, derd, kosp û rondikan dijîn û mezin dibin. Her ji zaroktiyê , wan dinêrin ber çêkirina ferş, mafûr û tevin kirinê. Ew bi wê rewşê bibine hunermend. Jina kurd jiber giriftariyên jiyanê û kosp û astengên civatê, nikare peywendiyê gerim bi edebî ve bike. Helbesta jinê ji ya zelanî cudaye, çinku helbesta wê, hewarek a xeniqandiyê. Ez jî, wek jin dixazim rêyekê ji bo derbirîna vê hewarê bibînim. Ew rê jî, bi baweriya min, helbest e...” (1)

Ji vê jiyanî pirr derd û xemên mîna çiya xuyaye ku, rewşa wê kembax e. Ev e rewşa jina kurd jî destnîşan dike. Helbet di jiyanek wulo wêran û serûbin de, rê ya rizgarbûn, berhingarî û xweragirtinê, di rê ya edebî de ye. Ew helbest û kurteçîrokn jî dinivîse. Em bi dilxweşî dê çend helbestên wê, ji tîpên erebî wergerînîn yên latînî û danîne ber destên xwendevanan.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

AMOJGARÎ (2)

Lew kate da şoxe kiçêkî nazdarit,
Kird be bûkî naw jûreket
Dexîlit bim
Agat lê bê, bûnî pencey min ne bîsê
Le incan û le ser taq û pencereket
Eger witî:
“ Bûnî gulêkî helwerîw dête lûtîm”
Bilê:
“ Giyane dilniyabe, cige le tu,
Gulêk niye lem cîhane.”
Nekey nawî min bihênî
Bextewerî le jûreket bi torênî.

* * *

Dilniyabe lew kate da, dilî tasem
Wek awêney ewîneket
Wurd... Wurd... wurd şikawe
Cige le tu, le naw dilma hîç şitêkîtir nemawe

* * *

Eger hat û jinêkit dî,
Bejnî be xem dapoşîwe
Çawekanî kiz kiz, kizkiz helgerrîwe
Lêwekanî wuşkewe bû
Elên beharî nedîwe...
Eger hat û be şêwe da, le pirr minit hate yad
Daneçlekê,
Nelêy rojê em hejare
Le elbûmî yadgarîşma buwe

* * *

BELGE (3)

Dilim buxçeyekî kirawe ye
Emey heye le riwalet da, her ewe ye.

* * *

Ger emzanî temenî xoşewîstî lat
Hênde kurt e û
Mîhrebanî ciwanemerge,
Ger emnzanî, wişekanim ekey be efleqî zincîr û
Şîrakanişim be belge,
Qed namnasî û be pirçî xom helemwasî,

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

Dilim ekird be micrî pola û asin.

* * *

Belam daxim direng zanîm
Demamik û dirûxendey bê nawerok
Mîratî eşiq û henasey em sedeye.

* * *

Mehabad Qeredaxî (4)

(Di sala 1966-an de, li bajarê Kifrî, nêzik bajarê Kerkûkê, Kurdistanê pişka Îraqê, ji dayik bûye. Ew mîna tevaya zarokên kurd, digel karesat, derdeserî û rûdanan mezin bûye. Nemaze di devera Germiyan de ku, hemî rojê, bi çekên leşkerê faşîstan, dihate wêran û talankirin. Her ji destpêka xwendîgehê, eşqa helbestê kete dilî. Yekem helbesta xwe di sala 1979-an de, nivîsî û li sala 1980 ê, di rojnama Hawkarî de, belvkir. Lê her di wî demî de, ew kete zîndanên faşîyan û hîngê jiyê wê çarde sal bû. Di sal 1987-an de, peymangeh bi dawî aniye. Ew kurteçîrok û gotarên edebî jî dinivîse û carca wergeraninê ji zimanê erebî jî dîke. Di sala 1992-an de, digel hevalê jiyana xwe, hatiye welatê Swêd.

Mehabad Qeredaxî, helbesvaneka jîr, hişyar, xwedan taqet û şîyanên bilind e. Zîrekane, babetên nivîsên xwe ji cergê civata kurdî ya paşde mayî derfîne. Mişe babetên edebî, siyasî û civatî li ser rewşa jina kurd nivîsîne û di rojname û kovarên kurdî de, belav kirîne. Di van salên dawiyê de, bi germî hatiye qada nivîsînê û heta niha ev pirtûkên jêrî jî, gehandîne çapê.

1. Nexşey diwarojî kirêkar. Helbest , Hevlêr 1992.
2. Panorama . Helbest, Swêd 1993.
3. Koç. Kurteçîrok, Swêd 1994.
4. Şax kêlgey genmeşamiye. Helbest, Swêd 1994.
5. Danpiyananêkî piyawane. Wergerandina 13 kurteçîrokên DR. Newal El Seidawî, ji zimanê erebî bo yê kurdî. Swêd 1994.
6. Rinanî jehrawî. Wergerandina şanoyeke Bulgarî ya Vîsîlîn Hançêv, ji zimanê erebî bo yê kurdî. Swêd 1994.
7. Şiir henasey gerdûn e. Wegerandina çend helbestên cîhanyên nû. Swêd 1994.
8. Mîdalya. Helbest, Swêd 1995.
9. Le pênavî jiyanevey afret da. Vekolîn, Swêd 1995.

Berhemên amade ji bo çapê:

1. Fentazy. Kurteçîrok.
2. Dîwaneke helbestan.
3. Vekolînek li ser jina kurd(Afretî kurd le perawêzî mêjû da).

Em dê çend helbestên wê ji tîpên erebî wergerînîn yên latînî û hêviya me ew e ku, li cihê dilxweşiya xwendevanan bin.

3 NIZA (5)

Mergim pêş mergit nekewê
Dezanim ger pêş to bimirim

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

Nek her eşk
Herdû gilêney çawîşit heldewerê

* * *

Mergim pêş mergit nekewê
Pêş min bimirî
Rohî spîm le çawmewe dête derê

* * *

Qet be yekîşewe nemirîn!
Le diway ême...
Kê cawîdane heyranî
Xoşewîstî pîroz bilê?

* * *

GULDAN (6)

Ke destewaney asinyan
Kirde destim
Pencekanim bûn be deçle nêrgiz û
Pênusekem bû be
Guldan
Ke şîrekanyan serbirrîm
Wişekanim her yekeyan bûn be wulatêkî gewre û
Tênusekem
Bû be gewretirîn cîhan

* * *

NIHÊNIYEKAN (7)

- Damunîşyan hênabaye
Gulsurxî her dile pîr le nihênîyeke
Bo pasewanî sêdare
Raw nedekira
Damunîşyan le ber çawî kewil kirdaye
Ew her le gel nihênîyekan
Koçî dekird
Berê dexra...

هه‌و‌ال‌نامه‌ی کتیب

* * *

Kejal Ehmed(8)

Di sala 1967-an de, li bajarê Kerkûkê, pişka Îraqê, ji dayik bûye. Peymangeha Saxlemiyê li bajarê Sulêmaniyê bi dawî aniye. Her ji sala 1983 ê û vir de dest daye nivîsîna helbestan. Lê di sala 1986-an de, berhem û nivîsên xwe di rojname û kovarên kurdî de belav kirîne. Mişê vekolîn û gotarên edebî, civatî û siyasî belav kirîne. Heta niha nekariye berhemên xwe çap bike, lê sê dîwanên helbestan û vekolînek bi navê (Nêrayetî dinyay kurd û edebî kurdî) ji bo çapê amadekirîne. Her wesa helbestên wê yê hafîne wergerandin bo zimanên farisî, erebî û tirkî jî.

Kejal Ehmed helbestvaneka bi nav û deng e û wê bi nivîsên xwe yê serketî, kariye cihê xwe di nexşeya edebiyata kurdî de bike. Her wesa di semînerên taybet de, helbest digel musîkê xwendîne û ev e hunerekê nû ye li Kurdistanê. Wê bi dehan vekolîn û gotarên biha giran li ser rewşa jina kurd nivîsîne û di rojname û kovarên kurdî de belav kirîne. Ew yek ji helbestvan û rojnamevanên jêhatî û bi hêz e. Em dê helbesteka wê ji tîpên erebî wergerînin yê latînî û me hêviye dilê xwendevanan xweş bike.

* *

WITEKAN WITIN

Şoreş û gel
Le sereta da, wek kurr û kiçêk wehan
Le spêdey rojanî dezgîranî da
Kurre diroy gewre gewre rêz dekat û
Kiçêş xewnî rengaleyî bew qisanewe debînê
Le diway da şoreş û gel; heman kurr û kiç in ,belam
Debin be jin û mêrdî yek
Îdî lêrewê dîrokî
Xiyanet û hera û telaq destpê dekat
(Hizbêk way wit)

Reşeba wîfî: kilêşey em dinyayem be dil niye
Hewil edem be wêran kirdin bîgorrim
Pêw wîfî: Minîş weku to be dilim niye
Belam demewê be evîn bîguncênim
(Şemal way wit)

Diway şew; şew dêt
Rojîş şew e
Belam fanosî xorêkî ciwankîlaney tiya desûtêt
(Em e qîsey şaire, nek şîrnûs)

Rêga nebû

هه‌و‌ال‌نامه‌ی کتیب

Wişekanim be qaçaxe rê da hêna
Teqeyan lê kirdim
Espekem berkewt û sebete gulekem rija
Hawaryan lê kirdim: To kêyt ?
Na... Welamim nedanewe
Çunke demzanî çek be dest
Qet le qelem be dest naga
(Witin way wit)

Çare nebû
Jenerral xoşewîstî xoy
Bo pepûleyek xwêndewe
Tenanet witî nazanim, min çon detwanim bikujim?!
Lew rojewe; Pepûle natwanê bifrrê
Natwanê bixwat; bixewêt
Leber ewey dezanê qederî eşq
Yan Jenerral degorrê be pepûleyekî biçkole
Yan pepûle; dekat be Jenerralêkî êcgar gewre
A bem coreş
Kotayî be yekêkyan dêt
(Em e qisey Şehrezade)

Le nêwan rêga nebûn û
Çare nebûn da, pirdêkî dêrîn heye
Ke em serî dinyakeman
Bew serîyewe debestêt
Eşqî aza; hemîşe deperrêtewe
Ke çî aşiqî tirsinok; berdewam be cê demînêt
(Nazanim kê bû emey wit)

Dilsoz Heme (9)

Di sala 1968-an de, li bajarê Sulêmaniyê ji dayik bûye. Her ji sala 1985 ê û vir de, dest bi nivîsîna helbest û kurteçîrokan kiriye. Mişe gotarên bi nirx û giring, li ser rewşa jina kurd nivîsîne û berhemên xwe, di rojname û kovarên kurdî de belav kirîne. Heta niha dîwaneke helbestan bi navê (Le kotayî da bîrim kewtewe, temaşay xom bikem), ji bo çapê amade kirîye û di nêzîk de wê ronahiyê bîne.

Dilsoz Heme, helbestvaneke bîrtîj e û di van salên dawiyê de - nemaze piştî serhildana Kurdistanê başûr û reva mezin - ya hatiye qada nivîsîna helbest û çîrokan. Helbestên wê ji aliyê form û neverokê ve di bilind û serketîne. Em dê helbesteke wê ji tîpên erebî wegerînin yên latînî û hêviya me ew e li cihê razîbûna xwendevanan be.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

EW JINEY REŞEBAY XOŞWÎSTUWE

1.

Her dar û perduwî jinêk û
Şewî کنار deryayekî yekcar dilteng
Yan eweta dastanêkî xwînewî dênête gorrê
Yan benderî eşqêkî nwê!

2

Tureyî le xwênma decmê û
Swêndî fenabûnit dexom le qumêka
Le werzêka
Pêş ewey le hîcretêka serim bixoy
Keçî le destim derwênim lem riqeya- û
Pencem le qijta win debê
Le jêr nînokim gul degrê
Carêkîtir deçmewe naw (nazanim) û
Be bê asman bal degirim.
Be bê zewî sewz debim
Be bê umêd- xoşim dewêy.

3

To em kujî
Be zuqmî em bêdengiye winim dekeyt
Baştire her şitêk bilêy
De to bilê, helim wase bem koste da
Lem kilêsa bê Îsa ye, debê yekêk le xaç bidrê
Em şew bê mirdin çon derwat?!

4

Kêşekeman temen niye
Serî befr û payizî dîl û giyan niye
To her katê elif û bêy eşiq fêr bûyt û
Destit geyişte balay berzî tenhayîm û
Lem bêdengiyek geyişti
Etxeme naw qutabxaney em dilewe

5

Her debarêt û debarêt
Guy nadate hanke hankî datistane rutelekan
Le ber em xurizma narrom
Ay ke gonam xitukey dê bem baw gije

هه‌و‌النامه‌ی کتیب

Her be şiney ew henasaney to deçin
Ke paş asewrî gieyan
Dembate beheştî xewêk

6

Metirse to -
Bawer nakem du car bijît
Zemenîş şehwetî harî zebruzengî solavêke
Ewey deyrêjîte zewî... Carêtir koy nakatewe
Metirse to -
Bawer nakem - jinêkî wek min bibînî carêkîtir
Be şelalî em hemû jehrey deyrêjî, destniwêjî eşiq bişwat û
Lem dozexî cêhêştine
Hêştâ sucdey xoşewîstî bo keibey bêdengît berê
Metirse to - bawer meke dû car bijît.

7

Giring niye ewey rûy da
Ewey le me û diwaş rûy deda
Gwê nademe ew nezîfey le rohim dê û -
Temenim le gel xoy debat
Xo detwanim be rûsurî êsta bilêm
Em xakey henawî sewzim
Balay berzî mewsimî eşqêkî biyê
Her le wêş da çirkekanî naw taq û pencerey bîrim
Daye dest şetî reşeba!

ÇAVKANÎ

1. Kovara Mamostayê kurd. Hejmar 13, rûp 35-36, zivistana 1991-1992 Swêd. Gotara hêja Ehmed Şerîfî.
2. Her ew çavkanî, rûp 36.
3. Kovara Sirwe. Hejmar 85, rûp 36, sal 1994.
4. Mehabad Qeredaxî, berhem û jiyana xwe ji me re hinartiye.
5. Mehabad Qeredaxî. Panorama, dîwana helbestan, rûp 178. Swêd 1993.
6. Her ew çavkanî. Rûp183.
7. Her ew çavkanî. Rûp 184.
8. Kejal Ehmedê, berhem û jiyana xwe ji me re hinartiye.
9. Jiyan û helbesta wê, Mehabad Qeredaxî ji me re hinartiye.

* Ev nivîse di kovara Nûdem, hejmara 17, sala 1996 ê de, belv bûye.

PEYVÊN GIRAN

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

Amojgarî: Şîret, nesîhet
 Asewrî: Şwînpê, asewar, eser
 Awêne : Xudîk, eynik
 Bender: Kendav, xelîc
 Damun: Kurrê helbestvan û şoreşgerê navdarê Îranî Gulsorxiye.
 Daneçlekî: Seyr nebe, entîke nebe, ecêb ne be
 Dapoşîwe: Têwerkiriye
 Debestêt: Girê dide
 Deçle: Tak, çiq
 Demamik: Serûçav girêdan, pêçe, yek devûlêvên xwe girê dide
 Dilniya: Diltena, mutmeîn
 Efleqî zincîr: Xeleka zincîrê
 Gilêne: Bîbika çavî, xirrika nava çavî
 Guna: Sîret, Kulim
 Helwerîw: Weryay
 Kilîşe: Form, Nimozec,
 Kost: Afat, karesat, Misîbet
 Mewsim: Demsal
 Nicrî pola: Sindoqa pêlay
 Pence: Tilî, tibil
 Pepole: Belatînk, perwane
 Qij: Pûr, pirç
 Riwalet: Dîmen, roxsar, şikil, yê li ber çav,
 Rutelekan Hejar, bêxwedî, reş û rût
 Sebet Selik
 Şêt Dîn, bêaqil

 Tasem: Arezu, îştîyaq
 Tênuşekem: Deftera min
 Toreyî: Xeyidîn, dilmayîn, acizî
 Wişe: Peyv, qise
 Win: Winda, hinda, berzebûyî
 Xituke: Qidqidank
 Xor: Roj
 Xurizma: Bi hêz, hêl, Bi şiddet
 Yadgar: Bîrhatîn

Hevpeyvîna kovara Helwestê... Bi Xelîl Duhokî re

Kovara Helwestê: Ji kerema xwe, tu dikarî bi kurtahî behsa xwe û ya naveroka berhemên xwe yê hatîne çapkirin, ji xwendevanên me re bikî?

Xelîl Duhokî: Di sala 1951-an de li bajarê Duhokê ji dayik bûm. Her ji sala 1970-yê min dest bi nivîsîna helbestan kirîye. Kurteçîrok û vekolînên edebî jî nivîsîne û di pîrriya rojname û kovarên kurdî de belav kirîne. Helbestên min hatîne wergerandin bo zimanên erebî û swêdî û belavbûne. Di gelek fêstîvalên edebî de min helbest, çîrok û semîner pêşkêş kirîne. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd bûm li başûrê Kurdistanê. Niha jî endamê Komela Nivîskarên Kurd im li Swêdê. Endamê Yeketiya Nivîskarên Swêdê me. Di sala 1982-an de, Ji ber terora faşiyên Îraqê reviyam û gehîştîme şoreşa kurdî. Sala 1987-an hatime welatê Swêd. Heta niha min ev berhemên jêrî çap kirîne:

1. Te çi viya û min neanî. Dîwana helbestan, Kurdistana başûr 1982.
 2. Leheng. Li ser nivîsîn û wergerandina çîrokên kurdên bakur, ji tîpên latînî bo yê erebî. Kurdistana başûr, 1983.
 3. Osman Sebrî, helbestvan û şoreşger. Kurdistana başûr, 1983.
 4. Gaziye ji cergê Asya. Dîwana helbestan, Swêd 1989.
 5. Min digot û te vedgêra. Dîwana helbestan, Swêd 1990.
 6. Ragirtin. Dîwana helbestan, bi swêdî û kurdî, Swêd 1990.
 7. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê I, antolojî, Swêd 1992.
 8. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê II, antolojî, Swêd 1994.
 9. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê III, antolojî, Swêd 1995.
 10. Antolojiya çîroka nû ya kurmancên başûr. Swêd 1995.
 11. Welat û mirov di helbestên Refîq Sabirî de. Swêd 1996.
- Her wesa çendîn pirojên çapkirina pirtûkan li ber destên min hene û ez hêvîdar im di demekê nêzîk de, ronahiyê bibînin.

- Ji bo kovar û rojnamên ku li Kurdistana başûr derdikevin, hinek agahdarî bide xwendevanên me. Navên wan çi ne? Rewşa wan weşana çewane, astengên pêşberî wan çi ne?

+ Li kurdistana başûr, bi dehan kovar û rojnamên kurdî derketîne û gelek ji wan heta niha jî diberdewam in. Hejmara wan gelek in û pîrnî bi zaravê kurmanciya jêrî(soranî) bûne, lê mirov ji bo nimone dikare navên hindêka binivîse:

- Rojnama Bangî Kurdistan, sala 1922.
- Rojnama Jiyana, sala 1926.
- Rojnama Jîn, sala 1939.
- Kovara Zarê Kurmancî, 1925.
- Kovara Gelavêj, 1939.
- Kovara Dengî Gîtî Taze, 1943.

هه‌و‌النام‌ه‌ی کت‌ی‌ب

Kovara Hetaw, 1954.

Kovara Hîwa, 1957.

Kovara Runahî, 1960. Bi kurmanciya jorî.

Kovra Beyan, 1970. Berdewam e.

Kovara Roşenbîrî Nwê. Piştî salên 1970 ê. Berdewam e.

Rojnama Hawkarî, 1970. Berdewam e.

Rojnama Birayetî, 1970.

Kovara Hîvî, 1971. Bi kurmanciya jorî.

Kovara Karwan, piştî salên 1980 ê û berdewam e.

Kovara Metîn, 1991. Bi kurmanciya jorî ye û berdewam e.

Kovara Wêran, 1994 li Hevlêrê û berdewam e.

Hindek ji van kovar û rojnama li jêr kontrola Îraqê ne û li Bexda derdikevin, lê hindekên din li kurdistanê diweşin û heta niha jî diberdewam in. Wek Metîn li Duhokê û Karwan li Hevlêrê.

Giriftariyên çapkirina kovar û rojnaman gelek in, çinku kaxez giran in û bi hêsanî destnakevin.

Her wesa yê li bin kontrola partiyên kurdî, ne azadin û sansor kirîne.

- Li Ewropa kovar û rojnamên ku kurdên ji Kurdistana başûr yê ku bi tîpên Erebi diweşînin hene? Navên wan çi ne?

- + 1. Kovara Peyv li London derdiket, nemaye.
2. Kovara Xermane li swêdê, nemaye.
3. Kovara Çarçira li swêdê, nemaye.
4. Rojnama Serdemî Nwê, nemaye.
5. Kovara Mamostayê Kurd li swêdê, berdewam e.
6. Kovara Rabûn li swêdê, berdewam e.
7. Kovara Gizing li swêdê, berdewam e.
8. Rojnama Hetaw.

Çendîn kovar û rojnamên din jî hene, nahêne bîra min û hindek jî, pêwîst nake bas bikim. Çinku evên navbirî cihên xwe girtîne û mişe belav dibin.

- Gelek kes dibêjin: Behdînan navendeka rewşenbîrî ye. Dîtina we çi ye?

+ Bi dirêjîya dîroka vê deverê, xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî nebû. Her çend nivîskarên kurmanc, mîna tiliyên desta bûn û pirranî jî, ne li deverê bûn, anku li bajarên Bexda, Mûsil û yê din dijiyan, lê di salên 1960 ê de, li Bexda kovareka kurmancî bi navê Ronahî derdiket. Lê mirov dikare bêje ku di sala 1970 ê de, dibistanên kurdî vebûn, lê ew jî bi zaravê kurmancîya jêrî (sorani) bûn û niho jî her bi wî zaravê ne. Di van 26 salên bûrî de, xebat û bizaveka gerim û berdewam hate kirin û bi dehan nivîskarên jêhatî û serketî ji dayik bûn - çar pirtûkên min yê me di serî de, destnîşan kirin, baştirîn nimone ne - û çendîn kovar, rojname û bi sedan pirtûkên hemereng jî, belavbûn û pirtûkxana kurdî dewlemend kirin. Belê; niha mirov dikare bêje ku, Behdînan navendeka rewşenbîrî ya kurdî ye.

- Xwendevanên me dixwazin aghadarî rewşa edebiyata kurdî li wê deverê bikin? Helbest çewa ye. Ji kerema xwe hinekî basî vê çendê bike.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

+ Helbesta kurdî li Behdînan, cihekê taybet û giring heye, nemaze yê kilasîk. Mirov dikare çendîn navên mezin mîna : Bekir Begê Erizî, Şêx Nûredîn Birîfkanî, Ehmedê Nalbend, Enwer Mayî, Şêx Memduh Birîfkanî û çendînen din rêz bike. Her wesa di van salên dawiyê de, bi dehan helbestvanên navdar ji dayik bûn û diwanên wan jî çap bûne. Lewre ez dikarim bêjim ku, helbesta modêrin ya kurmanî bi pêş de çûye û roleka girin lîztiye û heta niha min sê pirtûkên antolojiya helbestên wan jî çap kirîne. Xwendevan dikarin sod û mifay jê bibînin. Mixabin ku, kurmanc bi sê elfabe ya dinivîsin, ya Rûsî, erebî û latînî. Ew jî dibin asteng û kospên mezin ji bo ku di berhemên hevdu bigihin. Em hêvîdar in , di demekê nêzîk de, bikarî bi yek elfabe binivîsîn.

- Hûn dizanin ku gelek çîrokbêjên me hebûne. Geleg çîrokên me yê follorî bi saya wan hatine parastin. Lê ji ber ku nahatine nivîsandin, gelek ji wan berzebûne. Çi kar ji bo vê çendê hatiye kirin û rewşa çîroka mêdêrin çewa ye?

+ Berî salên 1970 ê, hindek xebata berhevkirina çîrokên folklorî ji aliyê hêjayan Sadiq Behaedîn Amêdî, Mehemedemîn Osmanî û yê din ve, hate kirin û li radyo ya dengê kurdî li Bexdayê belav dibûn. Lê piştî salên 1970 ê, xebateka gerim hate kirin û çendîn pirtûkên folklorî berhevbûn û hatine çapkirin jî. Lê çîroka modêrin peydabûye û berhemên nivîskarên xort mişe bûne û çendîn pirtûkên wan jî ronahî dîtine. Pirtûkeka min li ser çîrokên

Behdînan heye û di çîrokan wan de, xuya ye ku, heta çî pileyê ji aliyê form û naverokê ve, di bilind û di serketîne.

- Rewşa romana kurdî li Behdînan çewa ye?

+ Romanên kurdî bi giştî di kêmin û heta niha mîna tiliyên desta ne. Lê mirov dikare bêje ku heye û bi pêş diçe. Li Behdînan, roman nehatîne nivîsîn. Bi tenê hindek hewildanên biçûk hene.

- Ji bo nivîskarên ku bi eslê xwe kurd in, lê berhemên xwe bi zimanê neteweyên serdest(tirkî, erebî û farisî) dinivîsin, tu çî difikrî? Berhemên wan yê edebî di nav edebiyata kurdî de têne pejirandin an na? Berhemên Selîm Berekat, Yeşar kemal û Ehmed Arif ku bi zimanên biyanî dinivîsin, aîdî edebiyata kurdî ne yan na?

+ Bi baweriya min, tu bi çî zimanî binivîsî, berhemên te xizmeta edebiyata wî milletî dikan. Dema yek bîblografiya tirkî berhev bikin, helbet dê navê Yeşar Kemal di nav de be û ya erebî berhev bibe, dê navê Selîm Berekat tê de be. Dibe neveroka berhemên wan xizmeta gelê kurd bikin, lê ew nakevin nav edebiyata kurdî.

- Romana kurdî ya kilasîk û modêrin heye yan ne?

+ Mirov dikare romanên nemir Erebe Şemo, bikete bingehê romana kilasîka kurdî. Her wesa romanên Babê Nazê û Mehmed Uzun î jî bike xana yê modêrin.

- Tu berhemên nivîskarên kurd yê nû, çewan dibînî?

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

+ Di van salên dawiyê de, berhemên serketî li kurdistana başûr (kurmanciya jorî) peydabûne, nemaze yên helbest û kurteçîrokan. Her wesa li dervey welatî, roman û kurteçîrok pêşkêtiye. Lê mixabin heta niha berhemên şano û lêkolînan dikê in.

- Tu berhemên kîjan nivîskarê cîhanî û yên kurdan hez dikî?

+ Min gelek berhemên nivîskarên dinê yên kilasîk û modêrin, di rê ya zimanê kurdî û erebî de, xwendîne û cihê xwe di hizir û bîrên min de hiştine. Mîna Cak Lenden, Hemînhway, Markîz, Tolistoy, Çîxof, Gorkî, Ebdulrehman Munîf, Necîb Mehfoz û gelekên din. Her wesa çendî nivîskarên kurd peydabûne û di nav dilê min de dijîn.

- Tu niha li ser çi dixebitî? Pîlanên te yên paşerojê çi ne?

+ Ez li ser helbesta kurdî hinde lêkolîna dinivîsim. Her wesa ew lêkolînên min di kovar û rojnaman de, belavkirîn, dicivînim û wê wek pirtûk bête çapkirin. Bi rastî piroje hene, lê mixabin şiyane çapê nînin.

- Pirsê me ya dawî ev e: Ji bo kovara Helwestê dîtî û pêşniyarên te çi ne? Tu kovarek li ser hemî munaqêşe û rexneyên edebî bê weşandin pêwîst dibînî an na?

+ Peyva yekê ew e ku, Helwest te bi şaşî nivîsiye û rastiya wê Helwest e. Zimanê kovarê di gelek nivîsan de, sist û lawaz e û kêmasiyên rênivîs û giramerê mişene. Ji aliyê derxistina wê ve, kêmasiyên teknîkî hene. Ji bo munaqêşekirina berhemên edebî, kovar gelek pêwîst e. Çinku ta ku bizavek rexneyî gerim nebe, edebiyat jî pêş nekeve. Ez hêvîdarim tu li ser kar û xebata xwe berdewam bî û serketinê ji te re dixwazim.

*****'

Hevpeyvîna kovara Jîndanê... Bi Xelîl Duhokî re

PISYAR: Edebiyata kurdî di şerê rizgariya neteweyî de, cîhek giring distîne. Te pênuşa xwe, weke şûrekê tûj kiriye û pê şer dikî. Gelo tu dikarî qala vê xebatê bikî?

BERSIV: Her ji sala 1961 ê, şoreşaê li Kurdistana başûr destpêkir. Hemî rojê li ber çavên min, dijminan gund wêran dikirin, daristan dişewitandin û xelkê me dikuştin. Êdî ez wek zarokekê kurd, di nav wê wêrankirin û sutinê de, mezin bûm. Helbet di rewşek weha kembax de, erkê min ew e ku, li dij dijminan binivîsim, pîlanên wan yên genî têk bidim û ji bo rizgarkirina gel û welatê xwe bixebitim. Lewre min bi tiveng û pênuşê xwe, berevanî ji doza adila gelê xwe dikir û niha jî dikim. Hoşîmine dibêje: “Nivîskar di şerê rizgariyê de, bi peyvê şerî dike.”

PISYAR: Te çawan û sedem çî bû ku te dest bi nivîsînê kir? Nivîsên te yên pêşîn çî bûn û pirtûka te ya yekemîn kîjan bû?

BERSIV: Sedemên berê me gotin û xem, derd, kovan û azarên gelê kurd, ez paldam ku, helbestan bivehînim. Min di sala 1970 ê de, dest daye nivîsînê û yekem pirtûka xwe bi navê (Te çî viya û min neanî) di sala 1982-an de, çap kir. Heta niha min ji 10 pirtûkan pêtir gehandîne çapê.

PISYAR: Tu li ser rewşa edebiyat û zimanê kurdî, li ser pêşdaçûna wan di van rojên îroyîn de, çî dihizirî?

BERSIV: Bi dirêjîya 70 ê salan, hukümetên tirkîyê, zimanê kurdî qedexa kirîne û tevaya dergehên bajarvaniyê li ber gelê me daxistine. Her çend zanayên mîna Celadet Bedirxan û helbestvanên wek Cegerxwîn û yên din jî, xebateka gerim kirine, lê piştî sala 1980 ê û dema bi esdan siyasetvan û ronakbîrên kurd ji ber sitema rijêma tirkîyê revîyan û xwe gehandine welatên Ewrop. Hîngê delîve peyda bû û çendîn kovar û rojnama ronahî dîtin. Bi vê çendê, edebiyat û roşenbîriya kurdî pêş de çû û nivîskarên serketî peyda bûn û berhemên jêhatî jî ji dayik bûn. Niha ez geşbîn im û rewş baş e. Çinku mehê çendîn pirtûk çap dibin û pirtûkxana kurdî dixemlînin û

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

valatiyê pîrr dîkin. Lê me pêwîstî bi xebateka gerim û berdewam heye, da ku qereboya dehan salên bûrî bikîn û xwe bigehînin karwanê bajarvaniya cîhanê.

Berhemên min:

1. Te çi viya û min neanî. Dîwana helbestan, kurdistana başûr, 1982.
2. Leheng. Li ser nivîsîn û wergerandina çîrokên kurdên bakur, Kurdistana başûr, 1983.
3. Osman Sebrî, helbesvan û şoreşger. Kurdistana başûr, 1983.
4. Gaziyek ji cergê Asya. Dîwana helbestan, Swêd 1989.
5. Min digot û te vedgêra. Dîwana helbestan, Swêd 1990.
6. Ragirtin. Dîwana helbestan, bi swêdî û kurdî, Swêd 1990.
7. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê I, antolojî, Swêd 1992.
8. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê II, antolojî, Swêd 1994.
9. Helbesta hevçerx ya kurdî. Bergê III, antolojî, Swêd 1995.
10. Antolojiya çîroka nû ya kurmancên başûr, Swêd 1995.
11. Mirov û welat di helbestên Refîq Sabirî de. Lêkolîn Swêd 1996.

Çîroknivîs NIZAR MEHEMED SEÎD

Di sala 1952 an de, li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Li Duhokê xwendiyê û li Mîsil peymangeha mamosta bi dawî aniye. Li sala 1973 an û vir de, dest bi nivîsînê kiriye. Ew li berahiyê rojnamevan bûye û paşî çîrok nivîsîne. Li sala 1978 an de, çîrokên xwe belav kirîne. Sala 1985 an, komeleka kurteçîroka bi navê " Aş" çap kiriye. Di piraniya rojname û kovarên kurdî da, vekolîn û gotar belav kirîne. Mişe berhemên edebî, ji zimanê Ingilîzî wergerandîne yê kurdî. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Îraqê. Çend berhemên wî amadene ji bo çapê û ew di hevpeyvîna xwe de destnîşan dike.

Nizar, çîroknivîsek xwedan taqet û şiyânên bilind e, çî ji aliyê formê ve û çî ji aliyê naverokê ve jî. Di van salên dawiyê de, kariye bête nav qada kurteçîroka kurdî û cihê xwe di dilê xwendevanan e bike. Heta niha çendîn vekolîn li ser çîrokên wî hatîne belv kirin. me ev hevpeyvîne digel kiriyê û dê çîrokeke wî jî, ji tîpên erebî wergerînin yên latînî û danîne ber destên xwendevan û rexnegiran. em hêvîdar in bi dilê hemyan be.

*Kengî û bo çî te dest bi nivîsînê kiriye?

** Binemala ez ji nav rabûyim, her ji zaroktî heza xwendinê di dilê min da çand. Bapîr mela û bab mamosta û hemî qolaç û qujbinên malê pirtûk, rojname û belavok bûn. Li destpêka sala 1970an, ji bo cara yekê min pêkol kir û hest û nestên xwe bi şeweyekî ji şewên nivîsînê derbirîn. Çawa min xwe bi nivîsînê deranî, hejmareka belavoka derfet

da min û wek şagirdê li cîhana rojnamevanîyê hatime wergitin. Holê min zendikên micidîyê heldan û pê xwe havête derazînkê nivîsînê û heta niha jî berdeyamim. Helbet bîr û rayên min bawerî pê di anîn û hay ji xwebûna neteweyî, du egerên karîger bûn ku, ez paldame nivîsînê. Bêgoman xwendin û nivîsîn stîna jiyana giyanîya milletan û kesayetîya mervan e, ne tenê millet bi nanî di jîn, werarê dikin û bextewer çaxên xwe dibene ser, ji lewma ez gehîştîme wê baweryê ku, xwendin û nivîsîn ji min ra nola

nan, av û bay lê hatin. Di vê rewşê da ez hest bi hebûna xwe dikim. Dîsan weku mirov, ji berku di nivîsînê da em ji ankuwa bîrî û hunerîya mirovî li gor karîna xwe di geryên. Kar, kiryar, rewîşt, tîtal, ronîştin, hest û nestên mirovî babetên serekîn e ji bo nivîsînê, lewma nivîsîn xebateka pir pîroz û bêqam hejî û giring e di jiyana milletan da, nexasime milletekî wekî miletê me yê kurd.

* Barê edebê kurdî, evro çewan e? Helbest, çîrok û rexne.

** Barê edebê kurdî di her qonaxekê da, bêgoman havilî bi barê jiyana miletî ve heye, çî ji aliyê siyasî, çî ji aliyê aborî û civakî ve. Eger çî barê edebî carina xwe ji kevlojankê vî barê jiyane yê me gotî dertêxît û li pêşiyê diçît, lê bi tevavî nikarît xwe ji qeyd û zincîrên wî qurtal biket. Bi girêdan ligel qonaxên rabûrî heta radekê rengên edebî-helbest, çîrok û rexne-bi şûn da nemayne, lê ez yek ji wan im yên ne razî ji ber egerên jêrî:- Zorbey nivîserên me, hespê wan di derbirînê

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

da, li nîva rê di setimin, ji ber wênên şêlî, tem û mijê ku, karên wan zû bi zûnahêne wergirtin û têgehiştin. Ev e jî, ya ji min ve, ev çende ne kar û wezîfa edebîye. Ev e ji layekî ve, ji layekî dî ve sîmbol zal bûye ser karên edebî, ji bo xwe dûrxistinê ji berpisyarî û azardanê.- Nebûna rexnê.- Nebûna zimanekê edebî ku, edîb li ser rêk bi kevin. Ta di çarçûva zaravekî da ji zaravên kurdî, lew dê bînî, her yek bi zaravokê gund ya bajarê xwe di nivîsît.- Nebûna rênivîseka êkgirtî di nivîsînê da.- Gîxa nivîser û xwendevanên me, ji egera nebûna xandina kurdî, zalbûna ne xandevaniyê û kizîya bazarê pirtûkê, gîxeka bertenge.- Kêmiya harîkarî, palpiştî û nebûna çapxana li kurdistanê.- Pêkolîna dijminên milletê kurd, ji bo tera û bera kirina rewşenbîrên kurd û pirt û barvekirina zimanê kurdî.- Sext û diwariya barê aborîyê jiyane, helbet karî li ser efrandinê diket.

* Hizra te li ser edîbên derveyê welatî çî ye? Wezîfa wan çî ye û çî bikin başe?

** Edebê kurdî yeke û bizava kurdî li kîve bît, her ji bo yek nêt, merem û yek armance, nahête parvekirin û ji hev cuda kirin. Ji here erk û obalên giring yê edîbê kurd weku pêşengeka zana, areza, rêzan û têgehiştîyên milletî bibîte xwedîkeka rasteqîne ya milletî, tev reftar, dab û nerît, rabûn û ronitinan ji biyaniyan ra zil û berçav biket. Paşweku edîb û rewşenbîr, ya fere edebê kevin û yê nû yê milletê kurd bidene nasîn. Bo vê çendê, ez dibînim gereke bizav û livlivîneka gerim û gur ya wergêranê serhildet û bo vê meydanê, zimanzan û şareza bihêne kêşan, çî ji kurdan û çî ji biyaniyan, nemaze rojhelatnasan. Li ser edîbên kurd li derveyê welatî û ji bo wan ketiye ku, her tiştê li ser kurdan bi bihîsin, yan bi pêşçavên wan bikevît, di pirtûkxane û entîkxana da kom biken. Ez dibînim karekî pîroz e û bê renc û çetne, nexasime teknolojya niha vî karî pir hêsan diket.

* Tu bi çî mijol î û pirojên te çî ne?

** Çîrokên di navbera salên 1985-1991an da, min nivîsîn, ez niha wan ji bo çapê berhev dikem. Dîsan min li bere derfetekê ji çap kirina pirtûkên jêrî ra bibînim, yê ku eve demek e bi dawî hatîn:

1. Komeleka kurteçîrokan ji zimanê Ingilîzî hatiye wergêran bo ʔyê kurdî.
2. Ji îdyom û pendên belav li nav kurda.
3. Kurd û baweryên millyên kevin. Hijmareka vekolîname.
4. Şanogerî ji zarokan ra. Hijmareka şanogeryane, taybet bo zarokan hatîne nivîsîn.

* Di vî kawdana xirab da, dewra edîbê kurd çî ye?

** Eha di kawdanên holê da, gerek e edîbê kurd dewrê xwe bibînit, nemaze edîbên li derveyê welatî, divê ew xwe bi diblomasîyên kurd bizanin û nwêneryeka rasteqîneya milletê xwe, li cem millt û mîrîyên ew di nêv da biken. Ya ji hemya giringtir ew e evro edîb dijî xeletî, sistî û riftarên ne hejî milletê me bi peyvît, bi dengê bilind bikete qêrî, bêtirs û bêlayengîrya cihekê li ser hisaba cihekê dî, hemî hêz û vejen ji bo nêzik kirina milletî bin, beref asoyeka nû, ber bi armanca pîroz. Bihizra min em pêtir ji milletên cîhanê pêdivî dîmokrasiyêne di nav xwe da. Em pêtir pêdivî rexneka avakerîn. Lewma rojnamegerya kurdî ku, meydana hêja û birayên edîb û roşenbîre, divê dewrê xwe yê dirust bibînit û li ast û loka berpisyarî û tirsinakîya bûyer û rûdana bît. Dîsan gerek e edîb pêtir bi xebitin ji bo yekgirtina xwe û yegirtina hêzên pêşrew yê milletî.

* Edebê biyanî çî kartêkirin li ser yê kurdî kiriye?

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

** Milletên zêndî, xweyî dîrokeka dêrîn û bajêrvanî, mifay ji serbûrên hev, di hemî buwarên jiyanê da werdigirin, ev e jî tiştê siruştîye. Edeb buwareke ji van buwara, vê rayê belî diket, nemaze çaxê mirov jêderan sebara edebê berawirdkirî dixwînit. Edebê milletê me, yeke ji edebê van milletan. Pencên kartêkirina edebê biyanî heta radekê lê diyare, ji alyê rîç, rêbaz û mesebên edebî û hunerê nivîsîna çend rengên edebî ve, nexasime kurteçîrok û romanê. Hejî gotinêye ku, kartêkirin ya girêdaye bi bizava wergêranê ve, ev bivave jî heke me hebît, ya lawaz û kiz e. Ji ber hindê em pir pêdivî mezaxtina hêz, şîyan û vejenayne bo vî layî, da ku me li pê wext hay ji ser û berê efrandinên milletan hebît, evca bo zimanzanên kurd ketiye, nemaze evên li derve xandîn, pîte bi vê çendê biken. Li vir ez dibînim ji feran e, hizrên çêkirina komelekê bo wergêrên kurd rêkbêxîn da bi vî karê fer rabibît.

DUDIK

NIZAR MEHEMED SEÎD

Tidareka wî ya wesay e, çî cihê lê rawestiya, xelk lê xirbûn. Delengê şelê wî di cizmekê da di veşartîne. Hiçkê sakoy, yê veçemandîne ser zendika xo. Çantkekê kevlî wekî bazbenda di ber xo danaye, tijî pê ve zirzirk û mirmirin. Li ser textê çayxanê pêyekê di ser pêyekê ra havêtî. Çavê wî yê sor û kûr, di diyarin ku birsiyên xewên e. Hinde tolazê bi rex ve yariyekê dikan. Êkê ji wan got:

" Mîrzo... O Mîrzo... Nenive yaro... Sehkê teraziya rojê jî rast bû, hêj te ne pif kiriyê, ev e dê hosa nextî lêkdey?!"

" Nexto.. Hay nexto!! Bawer bike bi herdu mila ez ê ji berêkê xelkê di înime der, heta niho min hêj heqê stovankê ne vecemandiye! Da hîn bizanin".

Êk hat û bi rex Mîrzo ve rûnişt, Mîrzo di bin mijîlanka ve çav bi nik ve badan û bi lez zivrandine ve! Paşî rast rabû û ji wan dûra xewarbû. Kulavê xo bi tîyekê êxist û xo berda nav bazarî.

"Tu çî cara hosa nakeviye lepê min.. Xoşdelîve ye.. Mergê te sê cara Mîrzo!"

Evê li çayxanê li def rûniştî, ji dîr ve dît, îna ev axiftine di dilê xo da digot. Gehiştê pişt Mîrzo.. Berpêkek dayê û palek pêrana... Mîna spîndarekê qirrande erdî, lingê wî qilozbûn û xo dinav qerabqlixê ra berzekir. Mîrzo rabû ser xo.. Dinya li pêşçava şelî bû.. Toz ji xo daquta... Xelk lê xirrbûn û bi pisyara çûn. Mîrzo mista xo çemand.. Xuziya xo bi kotekî daîra. Didanê xoçirrakandin. Çav di serî ra zîqbûn. Rondik di çava da zivirîn..

Zivirîn û bûne rêz bi riya da. Hiçkê xo hilandê vemalîn. Kela wî hate xar. Dest di ber paxla xo da bir, patek jê anî der. Vekir... Pirim pirmek jê çû:

" Ya Xudê bi izneha te. Ya Rebbî çî lê ne hati bît! Ne şikestî bît. Dilê perasiyekêye, du yaye!!".

Pate hemî vekir. Herhadir bişkurîneka geşji lêva barî. Pate zivrande ve kire di paxla xo da.. Li dîr xo zivirî ka ca çî tiştê wî neketiye wara? Berî xo ji nav bazarî bi helînît, bi dengê bilind eve di dilê xo da rêt:

" Wekî hestiyê marî tu çû ye di binê pê min ra, tu nabêjye min te çî divêt? Kurê min .. Te di niyasim.. Mîn di niyasî?! Tolazê wekî te, wan mirade ez bîstekê suhbetê, li gel bikem.. Awaza jê ra bêjim, lê diyare tu yê ji bin tiraşekê hatî! Ha.. Hahaha. Te nevê eve jî min li dîna bibînît!! Pa heke hemî dîn wekî min bin, hema ez jî êk ji wan. Dîn. Dîn!".

هه و النامه ی کتیب

Li ser lêveka cahdekê ji cahdêt bajêrî, birreka tolaza li dûr bûne tan û bi lêvê ve nwîsyan.. " Dê pîfkê. Pîfkê Mîrzo bişarîne. Tu kovanêt dilî verevîne". Heyameka xoşma hizrêt xo kirin, lê çi rê ne birinê.

" Ne çaxê hindêye.. Belê pa çi bikem ez neşêm bê dilîya van tolaza bikem". Destê xo careka dî berda di paxila xo da.. Pate helkêşa. Dudik ji nav îna der.. Pîk birine ber.. Hilande lêvê xo ne hiland û awaz mîna tavyeka buharê hatin xarê. Evêt li wan dûra mest bûn ketine dîlanê. Tev da çendeka bi dengê bilind kirine gazî: "şabaş. şabaş. şabaş" Çawa sewka bi tenwîrî vedden wesa biçwîk yê derhema tiv diden û bi enya Mîrzo ve dinin. Ew yê di ber dudikê ra, bi destekî jê ve diket û dikete di berîka xo da. Ji dudikê pêvetir hay ji bayê dinyayê nîne, xuh weya vê da diête xarê, bo av û lolav. Kes ezmanê kesê nizanît, dê bêjî bazarê seffara ye. Wan hind dît qerebalix jêk ve bû, êk li hindav serê Mîrzo çikilî û dengê dudikê xendiqand. Ji kel hat û bi kerb wî xo li dudikê da. Ji wî kêş û ji Mîrzo kêş, ne herê bi mirina Mîrzo ye, kesekê dî bi xo nedîtiye, gerek e kîna xo birêjît!. Bi Mîrzo ve kesêre bû, dudik ji lepa dernakevît. Îna ya pê may, destê xo da paş û hindî jê hatî dawêşand.. Çimzir!!

Çirîsk ji çavêt Mîrzo peşîn. Di gavê da kes li wara nema, dê bêjî pirtêt befrêne helyan. Li hindavî rûbarê bajêrî, evê êkane û sîng li wexerê, li serê girekê, Mîrzo careka dî heval xirrkirin û wan derê dilêt xo ji hev ra vekirin. Roja, mîna çavêt Mîrzo sor e, mîna bizotekê ye, ya tete pêşçava.

Axiftina axiftinê radikêşît, Mîrzo jî pê di zik da dikelît. Girnijîneka sar xo hilavête ser lêzê wî yê qeşavî û got:

" Xudê karê bêbext û zordara rast neînît.. Ma dihêlin! ka dudikê çi kiriye babo?! Min hîvî heye, kes ji evro pa ve, ne bêjîte min dudikê lêde. Ez hîngê dê lêdem, tola xo vekem, hîvîdar im li min negirin".

Tila xo eva di ber axiftinê ra li hindav kolavê xo dihejand, înbîsteka xoşlêv li lêvê ne da. Nebêje yê di dilê xo da stiranekê dibêjît, hay ji xo nema dengê xo pîç pîçe ber da:

" Rê dûro Mîrzo.. Barê kulano Mîrzo.. Pajo dê pajê keser kûro Mîrzo. Roja te îro avabû dê pajo". Hevalêt wî tev da dengê xemgîn berdan: " Taw. Taw. Taw Mîrzo".

* Kovara Wan, hejmar 2, sala 1992.

Axîn û nalînên texa bindest di çîrokên Hesen Îbrahîmî de

Rewşa aloz û xeraba milletê kurd li Kurdistana başûr, dilê her kurdekê bi rûmet diêşîne. Çinku ji bo parastina Kurdistanê, bi sedan hezar xelkê me hatine kuştin û bi bi hezaran bajar û gund hatine sutin. Roj bi roj kawdanên welatî ber bi wêrankirinê diçû û çî ronahî jî, ne dima û dilê xelkê jî, ji ber rûdan û boblatên diltezîn, diêşa û bi sedan hezar, derbeder û mişextî welatên biyanî bûn. Mirovê kurd li Kurdistana başûr, bêhêvî û bêomêd bibû. Tevaya dergehên azadî û serxwebûnê li ber hatibûne girtin û perdeka reş xwe avêtibû ser welatî. Hukumeta faşî ya Îraqê, bi hemî cûrên çekên vebirandinê, yên sutin û qirkirinê, ji napalm û kîmyawî li dij gelê kurd bi karanîn. Karesatên Helebce û Hêrişên Enfala, naêne ji bîr kirin. Belê; rewş gehîştibû dawiyê û hemî hêzên Kurdistana başûr xwe avêtibûn nav Îran û Ewropayê û dever ji pêşmergan vala bibûn. belê; di wê rewş de, çî sînahî jî nemabû. Lê ji nişka ve, şans û delîveka dîrokî ji bo kurdên başûr peyda bû. Sedamî, welatê Kuwêtê dagîrkir. Lewre pîrnîya hêzên cîhanê, xwe kirine yek dest û Sedam ji Kuwêtê derxitin. Hîngê hemî dilsoz, welatparêz û heta digehe çav û xwefiroşan jî, beşdarî serhildanekê dîrokî bûn û tevaya dezgehên Faşiyên Îraqê, herifandin û Kurdistan paqijkirin. Partiyên kurdî jî, ji Îranê vegeryan û welat xistine bin kontrola xwe. Lê dema hêzên hevpeyman, ji ber berjewendiyên xwe li deverê, nexwastin Sedamî rakin û xelkê Îraqê ji sitem û zulma wî rizgar bikin. Hîngê Sedamî dîsan makîna xwe ya cengê civandin û hêriş kire ser gelê kurd. Dîsan partiyên kurdî û vê carê hemî gelê kurd jî digel, revîn û xwe gehandine sinorên Îran û Tirkîyeyê. Di vê reva mezin de, bi hezaran zaro û bêçare bi rê ve ji ber serma û birçê mirin. Ax Xudêwo! Di bin her darekê, kevirêkê, li ber her kavilekê şewitî, kaniyeka dagrtî mirovekê kurd veşartîye... Mirov nizanit, çewa ew karesat û boblat hatine ji bîr kirin! Dimin me hemî gelê kurd dike yek û dide ber çekê qirkirinê, lê em nikarin bibin yek û armancên xwe yên sitratîcî biparêzîn! Erê; piştî wê reva mezin, bi alîkariya hêzên hevpeyman, kurd vegeryan cih û warên xwe û ji aliyê hêza çekoç ve heta niha jî, diêne parastin. Lewre her ji sala 1991 ê, Kurdistan ji bo xelkê kurd bibû beheşteker ser rûyê erdê. Her wesana ji aliyekê din ve, hêzên hevpeyman, rêxistinên mirovî li tevaya cîhanê û kurdên li dervey welatî, destê alîkariyê dirêkîrin û di avakirina Kurdistana şewitî û wêrankirî de beşdarî kirin. Lê hezar heyf û mixabin. Ax Xudêwo! Dîsan şerê birakujîyê destpêkir û welat di xwînê werkirin.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Di rewşek weha dilşewat de, rola nivîskar, ronakbîr û bisporên kurd xuya dibe. Her çend pîrriya nivîskarên Kurdistanê başûr, ji ber kawdanên aborî û hejariyê, di bin sîbera partiyên xwedan deselat de dijîn, lê gelek ji wan, nerazîbûna xwe diyar kiriye û li dij şerê xwekujiyê nivîsîne û helwêstên camêrane wergirtine. Lê dîsan mixabin ku, şer her berdewam e û bi çî rê, alîkarî û pêşniyarên biyaniyan jî, naête rawetandin! Belê; gelek nivîskaran berhemên xwe bi van karesatan hunandine. Helbet şer hemî tiçtekê xirab digel xwe tine. di van şeran de, bi sedan kes hatine kuştin û bi hezaran jin û zaro ketine kolanan, birçî û bêxwedî mane. Kar jî nîne û pêwîstiyên jiyane jî, bêmana giran in û her kes nikare ji bo zarokên xwe misoger bike. Ji bo peydakirina nanî, hindekan dizî kirîne û rewîştên kirêt bi kar anîne. Belê di vê rewşê de, dema bira, mêr yan kur li afretên kurd hatine kuştin, êdî ew ketine bin barê giran û ji bo peydakirina nanî - hindek tê nebin - ew din neçar bûne û laşê xwe yê pîroz firotine. Raport xuya dikin ku, di van çar salên bûrî de, bi sedan afretên kurd yêhatine kuştin. li ser vê giriftarî û kawdanên aloz û xerab, çendin berhemên nivîskarên kurd ji dayik bûne. Yek ji wana, nivîskarê xort û jîr Hesên Îbrahîm e.

Wî di van salên dawiyê de, çend kurteçîrok ku, ji aliyê form û naverokê ve di serketî, efrandîne. Ez naxwazim li ser çîrokê bipeyvim, çinku ew bi xwe hemî giriftarî û karesatê bi rengê edebî, didanite ber destên xwendevanî. Ev e hûn û kurteçîrok:

WÊNEYEK...

Du leşên rîs, wek du marên evîndar xwe têk dihisîn. Leşekê ji bo têrkirina derûnî û guhnêlî û yê din ji bo têrkirina çend gewriyên bîrsî. Li dadgeha yasa evro, herdu hatin dadgehkirin. Êk bo kêla gullên şûndemaya evro, bêy ku wan gewriya têrket û yê din, li kolane bajêrî, simbêlên xwe dibadan û li nêçîreka din digeriya!

Hesên di kurteçîrokeka din de, zîrekane diçe nav derûnê mirovekê kurd û rewşa wî ya pisikolojî û wêrankirî destnîşan dike. Belê; dîsan em neçarî vegeerî ser kawdanên Kurdistanê başûr. Ji ber wan giriftarî û şerê xwekujiyê, bi hezaran kurd, ji hemî çînen civata kurdî, revîne û bi şkandina çendin asteng û kospa xwe gehandîne welatên biyanî. Êdî li xerîbiyê piroblimên mirovê kurd dest pê dikin. Nezanîna zimanî, bêkarî, xerîbî, cudahiyên kulturî, tenêbûn û heta digehê xwe kuştinê jî.

Hesên vê rewşa namobûna mirovê kurd li derveyê welatî, bi ya yekê din ku, di zîndanên faşîyan de ye û li benda li darxistinê ye, berçav dike û xwendevanî radîkêşe kûratiya ruha wêrankirîya qaremanên çîrokê. Dîsan pê nevwê ez çîrokê şîrove kim, çinku ew bi dengê hezar bilingoya hawar dike.

ÇAVÊN MIN... ÇAVÊN WÎ

Çavên min di zil in û rik yê li wê derza bin dergehî ku, ronahiya derve hatin û çûna mirova diyar dikit. Ha ha dê êk zenga dergehî lê dit, bêdengiya min kujit û silav kite min.

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

Çavên wî dizilqutin û yên li wê pencera çargoşe û xaçkirî, ewa bi serê dergehê ve. Çend carekê zêrevanê wê jorê, diêt û diçit. Ha ha dê ên dergehê lê vekin û silav kine giyanê wî.

Çavên min man zil û guhên min man bel û dergehê min nehat qutan. Ew telefona bi rex min ve, eve çend cara min bilindkir ka kar dikit yan ne. Bêdengiyê ez hêrkirim, ya ji min ve kes di vî bajêrî de nîne... Min dirade dengê, mêşek, pêşiyek, seyek yan jî çûkek.

Çavên wî na rawestin ji qutanê.
Guhên wî yên bûyne kaniya xwînê.
Şeq şeqa seqatên dergeha mejî lê simt.
Ne telefon û ne zenga dergehê.
Çend xelkê bajêrî yên anîne wêrê.
Wî mirade çirkeyekê di xew biçit. Sîsirk û mşka, şere li ser leşê wî...

Dergehê wî vebû. Helgirtin, rakêşan û birin cîhana bêdengiyê...
Dergehê min nehat vekirin, telefona min nehat lêdan. Dilê min nehat qutan. Di xerfîbiya xwe de, bûm hevalê cîhana wî...!

Belê; çîroknivîs bi germî diçe nav rewşa aloza xelkê me, li Kurdistana başûr û li dij tevaya karên çewt û ne mirovane diraweste û bi zimanê qaremanê çîroka xwe, rewşê berçav dike.
Erê; birîn kûr in û xemên xelkê me, giran in. Giran in û mîna çiya ne. Lê dilsoz û xemxorên gelê kurd, bi vê çendê razî nabin û bi gelek rêka hewil didin ku, van azar û kovanan sivik bikin.
Helbet dema di welatî de, şer hebe, êdî demokrasî jî nabe û gêleşok û tengavî jî wê mişe bin.
Karên çewt û zulm jî peyda dibe. dijmin jî bi hemî hêza xwe, pîlan û nexşên genî dadinê û pîrrê caran digehê armancên xwe yên çepel û kirêt. Belê; rewş xerab e û kêr gehişte ser hestî. Hesen di vê çîroka xwe de, kawdanên dezgehên Deselatê dide xuya kirin ku, çewan xelkê şet û dîn dike û nahêle cemawer bi azadî bipeyive. Dema yek pê li ser cergê xwe dane û wan dezgeha gunehbar bike, hîngê ew dikarin wî kesî gullebaran bikin. Lê nivîskar zîrekane, pêşbîniya xwepêşandan û serhildaneka din dike. Werin em bi hev re vê kurteçîrokê bixwînin.

HEVPEYVÎNEK DIGEL ŞÊTEKÊ

Li demkê ne yê xuya, li cihekê bê şunwar û li civateka bê serûsîma, ev hevpeyvîne hate saz kirin.

“ Gelî guhdar û bînera, çaxê we baş. Niha hûn û ev hevpeyvîne di gel vî şetî, ewê leqa didanit, cilkên xwe didirînit, hevsî û cîran jê direvin, bera di esmanî werdikit û bê oliya dikit. Fermon hûn û ev şete.”

+ Şeto xwe bide nasîn?

- Ez ne şet im! Hûn dişet in. Ez dizanim rojê çend ser diêne birrîn û çend ezman diêne kîrrîn.

+ Bê ezman dirêjî. Em dê çend pirsiyara ji te kîn û bi kurtî bo bînera bersiv bide. Pisyara êkê: Karê te çi ye?

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

- Karê min hişyarkirina mêşka, fêrkirina rastiye û diyarkirina gunehbar û dizane.(Hîl hîleka kirêt belavbû, di gel destqutaneka ne rêkxistî.)

+ Pirsiyara duyê: Dema tu berze dibî, tu kî ve diçî?

- Bi rastî ez yê di zînanên tarîperêsa da, yan jî xwe dikime pêxarin, ji bo birsî û hejara.

+ Pirsiyara sêyê: Tu wek kesekê şêt, di kîjan rêxistinê da kar dikî?

- Di ya pale û rênçberan da.

+ Pirsiyara çarê: Hîviya te ya dawiyê?

- Hîviya min ew e ku, ev hevpeyvîne bibite xewn û ez hişyar bibim.

Di gel peyva dîmahiyê, dengê du - sê gulla ji serê makrofonê derket û di gel ketina wî, çend bînerên li pêş wê hevpeyvîne, rabûne serxwe û bû xwepêşandan.

Bi rastî Hesên Îbrahîm, çîroknivîsekî hişyar û jîr e. Xwedan taqet û şiyane edebiyên bilind e. Zîmanê wî sivik û rewan e. Zîrekane naveroka çîrokên xwe dihelbijêre. Berhemên wî her zû diçine kûratiya dilê mirovî. Em serketinê jê re dixwazîn û hêviya me ew e, li ser efrandin û berhemên jêhatî berdewam be.

* Ev lêkolîne di kovara Berbang, hejmar 102, sala 1996 an de, belav bûye.

هه‌و‌الن‌ام‌ه‌ی کتیب

NAVEROK

1. Xemên evîndaran di stiranê folklorî yên kurdî de. . . . 7
2. Edeb, siyaset û dîrok, di romana Siya Evînê de 25
3. Helbestvanê hevçerx Ebdulrehman Mizûrî 43
4. Xem û azarên mirovî di tabloyên Fahmî Balayî de . . 47
5. Gerhanek di nav kurteçîrokên Hesênê Metê de 51
6. Mirov û hevrikkî di tabloyên Ednan Şînoy de 61
7. Helbestvana hêja Hîvî Berwarî 67
8. Dilên şkestî di kurteçîrokên Firat Cewerî de 73
9. Helbestvan û xweragir Sebriye Hekarî 87
10. Jina kurd û barê giran 91
11. Çend stêrên geş di esmanê helbesta nû ya kurdî de .95
12. Hevpeyvîn. Kovara Helwêst 113
13. Hevpeyvîn. Kovara Jîndan 121
14. Axîn û nalînên... di çîrokên Hesên Îbrahîmî de. . . 125
15. Naverok 133
